

HELWEST

Analîz # Kultur # Lîteratur

Kovara Kulturî û Lîteraturî

ANALÎZA BERHEMÊN EDEBÎ

Edbiyat

H
u
n
e
r
a
Z
i
m
a
n
e



Z
i
m
a
n
ê
Îndo
E
w
r
û
p
î

XWÎN, AGIR Ê NEWROZ - Yilmaz GUNAY

Hejmar / No: 7 * * * * Sal : Bihar - 1997

HELWES T

Analîz # Kultur # Lîteratur

Kovara Kulturî û Lîteraturî

Utgivare

Moderna Kultur Förlaget

Xwedî

Weşanên Çanda Nûjen

Ansvarig/Berpirsiyar

Birêvebirê kovarê

Lokman POLAT

Wênaya Bergê

A. Duran

Beşa wergêrê

N. Zaxûranî

Danasîn û Analîza pirtûkan: Senar Şahîn

Fransa - K. Xalo

Almanya - E. Botî

Tel : 221 - 754591

Lubnan - N. Agirî

Türkîye - A. Onal

Swîsre - A. Duran

Norveç - A. Baran

Hejmar : 7

Sal : Bihar - 1997

Çap : . . . Trykerî

Abonetî

Salek : 200 Kr.

Dervevê Swêdê : 60 \$.

Postgîro : 9 13 31 — 9

ISSN — 1400 - 9404

Navnîşan / Adress:

Tensta Alle 43 - 2tr.

16364 Spånga /Sweden

Tel / Fax:08-7618433

NAVEROK

* 2 - Ji Edîtor Çend Gotin

* 9 - Fuara Kurdî.....

* 11 - Nivîsa Yilmaz Guney

* 15 - Hunera Ziman.....

* 32 - Rêwîtiyek - L. Polat

* 40 - Nivîsa Plehanov.....

* 45 -Pêlên Bêrîkirinê.....

* 64 - Helbestên Kurdî

* 66 - Çîrok - Laleş Qaso ...

* 72 - Hevpeyvîn.....

* 76 - Nivîskarên Kurd.....

* 78 - Ziman û Roman.....

* 80 - Cembeliyem Lorî.....

* 85 - Çîrokên Xeter.....


* 90 - Danasîna Kovaran...

* 98 - Anonsa Pirtûkan.....

KOVARA HELWEST

**Dengê Zanîna Edebî Ye. Ji Bo Pêşveçûna
Lîteratura Kurdî Xizmet Dike.**

Ji Edîtorê Kovarê Pêşkêşî



Me di vê hejmarê de; giranî daye ser nirxandina berhemên edebî. Analîzên gelek berhemên hatiye kirin. Nivîsên li ser romana “Pêlên Bêrîkirinê”, “Cembelî Kurê Mîrê Hekaryan”, “Kurê Zinarê Serbilind”, “Olga” û yd. nivîsên balkêş in.

Nivîsa Yilmaz Guney di derbarê cejna Newrozê de ye. Ji bo ku ev hejmara di biharê de derdikeve, loma me nivîsa wî weşand. Bi weşandina vê nivîsê em hem cejna Newrozê pîroz dikin û hem jî Yilmaz Guney bi bîr tînin. Gabar Çiyan li ser fîlmên Yilmaz Guney bi Mahmûd Baksî re hevpeyvîn çêkir, em wê diweşînin.

*

* *

Di vê hejmarê de hevpeyvînek heye. Bi Aydin Ozturk re hatiye çêkirin.. Aydin Ozturk li Stenbolê dijî û di radyoyekî radîkal de dixebite. Ev hevpeyvîn gelek balkêş e. Em hêvî dikin ku xwendevan bi dilxweşî vê hevpeyvînê bixwînin. Di hejmara bê de çend hevpeyvînên din hene, em dê biweşînin.

Hinek Kurd ji hunerê fêhmakin. Bergên kovara Helwest hejmara 5'an bergek hunerî bû. Kaxizê bergê hem kaxizê biha bû hem jî bi xisûsî hatibû amadekirin. Lê, hinek xwendevanên me kaxizê bergê necibandin. Kurd ji tiştên biriqandî hez dikin. Loma jî me bergê hejmara çûyî biriqandî derxist. Me jî boyê bergê çar reng bi kar anî, ev jî gelek biha li ser me bû mal. Em hêvî dikin ku ew berg bi dilê xwendevanan be. Em her tim jî pêşniyazên xwendevanan re vekirîne. Kovara Helwest bi her awayî qîmet û rûmet dide pêşniyazên xwendevanan.

*
* *

Me di kovara Helwest de hinek guhartin çêkir. Rêzenivîsên bi sernavê *"Ji Nav Edebiyata Cîhanê"* û *"Ji Nav Edebiyata Swêdê"* rakir. Em dê wan nivîsan hemû bikin yek û di du pirtûkên cuda de biweşînin. Rêzenivîsa *"Cîhana Nivîskarên Kurd"* dom dike. Di vê hejmarê de helbestvanê Kurd, weşanvanê kovara Govendê Mazhar KARA heye. Em jiyan û berhemên wî pêşkêşê xwendevanan dikin.

*
* *

Kovara Helwest hejmara 6'an ji alî xwendevanan ve gelek hate ecibandin. Bi rastî jî hejmarek bedew û xweşik bû. Bergên wê bi çar rengan hatibû xemilandin, wêneyên berga pêşîn û ya berga paşîn gelek xweşik bû. Naveroka wê jî bi her awayî dewlemend bû.

*
* *

Kurdîstan Kultur Centrum a li Mûnîhê-Almanya- hefteya çanda Kurdî amade kir. Li ser gelek babetan panel hatin çêkirin. Birêvebirê kovara Helwestê Lokman Polat, nivîskarê lêkolînan Mehmed Bayrak û nivîskar Kemal Astore beşdarê panelê bûn. Lokman Polat liser *"Rewşa Edebiyata Kurdî"* dîtînen xwe pêşkêşê beşdarvanên gohdar kir e. Kurdên ji herçar perçeyên Kurdistanê hatibûn panelê. Piştî gelek çalakiyên kulturî, roja dawîn jî şefekê kulturî hate amadekirin. Nasir Rezazî jî beşdarê vê şevê bû û stran got e.

Di rojnameya NÛROJ'ê de li ser kovara Helwest hejmara 6'an nivîsek danasînê derket. Berpirsiyarê rûpela kulturî a Nûroj'ê Nesîmî aday vê nivîsa baş û balkêş nivîsîbû. Em jê re gelek sipas dikin. Di kovara Nûbihar û Berfîn Bahar'ê de li ser pirtûka "Bayên azadîyê" nivîsên danasînê derketin. Herdu jî kurtenivîsên balkêş bûn. Danasîna pirtûkên xwerû Kurdî karekî pîroz e. Di hinek weşanan de şûna ku pirtûkên Kurdan bidin danasînê, pirtûkên kemalîstan didin danasînê.

*
* *

BIBIN ABONE

Xwendevanên hêja

Amadekirin û weşandina kovarek wisan hêsan nîn e. Jê re ked divê, xebat divê. Weşan ji bo xwendevanan derdikevin. Heger xwendevan nebin tu qîmet û rûmeta weşanan nîn e. Jiyana weşanan bi xwendevanan ve girêdayiye. Heger xwendevan wê weşanê nekirin, nebin abone, ew weşan ji necariya aborî dê raweste dê nikaribe jiyana xwe ya weşaniyê bidomîne.

Kovara Helwest ji tu cihêkî alîkarî negirtiye, bi îmkanên xwe derdikeve. Heger aboneyên kovarê heqê abonetiye neşînin, dê nikaribe jiyana xwe ya weşanê bidomîne. Kovara Helwest bi alîkariya xwendevan û aboneyan derdikeve.

Kovara Helwest hetanî niha şeş -6- hejmar derketiye. Ev hejmara 7'an e. Kovar kovarek çandî, edebî ye. Kovara analîzî û lîteraturî ye. Her hejmara wê bi naveroka xwe ber bi dewlemendiyê ve diçe, dikemile, xwe nûh dike.

Kovara Helwest ji dezgeha Swêdîyan -kulturrâdetê- alîkarî negirtiye. Hetanî niha bi îmkanên xwe hatiye weşandin. Lê, heger xwendevanên kovarê mil nedin kovarê û nebin abone, em dê nikaribin kovarê biweşînin.

Heger hûn dixwazin kovara Helwest jiyana xwe ya weşanê bidomîne bibin abone. Ger hûn bibin abone em dê gelek dilşad bibin û dê kovar weşana xwe bidomîne. Em bangê hemû xwendevanên Kurd dikin, bibin abone!
Xwendin Zanîn e! Bixwînin!

Bi silavên germî yên biratiyê.

Hetanî hejmarekî din hûn bimînin di xweşiyê de.

Edîtor

RÊZEPİRTÛKA DANASÎN Û ANALÎZA BERHEMÊN EDEBÎ

Weşanxaneyê “ÇANDA NÛJEN” bi navê “ ZÎN - Rêzepirtûka Danasîn û Analîza Berhemên Edebî ” rêzepirtûkên salane yên edebî derdixe. Di vê rêzepirtûkê de dê ji hemû şaxên edebiyatê gelek nivîs, analîz û lêkolînên edebî hebin. Giranî jî dê li ser danasîn û analîza pirtûkên edebî be . Yanê armanca wê ya bingehîn danasîn û analîza pirtûkên Kurdî yên edebî ye. Di weşanên Kurdan de danasîna pirtûkan gelek kêr tîr kirin, nivîsên analîza pirtûkan nayên weşandin. Di hêla danasîn û analîza pirtûkan de valahiyek heye. ZÎN dê bibe pêngavek ji bo ku ev valahî jî holê rabe. Di ZÎNê de, di derheqê weşanên Kurdî de agahdariyên berfireh dê bibe weşandin. ZÎN dê salê hejmarek yan jî du hejmar derkeve.

ZÎN Kurdistan e. Westayê edebiyata Kurdî Ehmedê Xanî yê nemir di ZÎNê de Kurdistan dibîne. Rewşa Zînê rewşa gelên bindestî ye. ZÎN jî bo Kurdistanê “Sîmge” ye. Heta mirov dikarê bêje ku ZÎN bi xwe Kurdistan e. ZÎN jî wek Kurdistanê azad nîne. Çawan ku qedera ZÎNê jî alî Mîr ve têt beylukirin, qedera Kurdistanê jî ji alî Şah û Padîşah’ên Tirk û Eceman têt beylukirin. Ji bo vê jî evîna Mem û Zînê, evîna gelê Kurd a ji bo Kurdistanek azad û serbixwe ye. Em bi derxistina ZÎNê dê hersal Ahmedê Xanî û berhema wî ya hêja “Mem û Zîn”ê bi bîr bin.

Navê ZÎNê navekê gelek xweş e. ZÎN navê keç û jinên Kurdan e . Di edebiyata Kurdî de cihê jinên Kurd çine? Analîzên li ser pirtûkên Jinan dê di ZÎNê de bê weşandinê. Di rêzepirtûka edebî ZÎNê de, dê nivîsên danasînê û analîzê li ser pirtûkên Sînemayê, Tiyatro -Şano- , Çîrok -Pexşan - Novel- , Roman, Helbest û

hwd hebin. Di ZÎNê de, dê panorama û agahdariyên edebî hebin. ZÎN dê ji alî naveroka xwe gelek dewlemend derkeve. Armanca ZÎNê jî wek armanca kovara HELWESTê ew e ku ji çand û edebiyata Kurdî re xizmet bike. Kultur, ziman û lîteratura Kurdî pêşve bibe. Pirtûkên xwerû bi Kurdî bide danasînê. Li ser romanên Kurdî analîzan biweşîne.

Ji bo amadekirin û derxistina ZÎNê ji niha ve xebat têt kirin. Heger ev xebat bi serkeve û ZÎN dest bi weşanê bike, wê demê em dê weşana kovara HELWESTê di Tirkîyê û Kurdistanê de bidin meşandin. Di demên pêş te em dê kovara HELWESTê li Istenbolê yan jî li Amedê - Diyarbekir- bi navê "HELWESTA NÛ" derxin. Ji bo vê karî jî pêşniyar, têkilî, danûstendin û xebat têt kirin.

Rewşa kovara HELWESTê ji alî aborî ve ne baş e. Kovara HELWESTê û xwediye kovare weşanên ÇANDA NÛJEN ji kulturrâdetê alîkarî negirt in. Hinek Kurdên ku li wir di komîsyonan de dixebitin û ji wan re raportorî dikin, kesên referans, raporên negatîf dan û gotin "alîkarî nedin kovara HELWESTê, alîkarî nedin Weşanên ÇANDA NÛJEN." Tu dibêjî qey heger alîkarî bidana dê ji cêva -berikawan derketana. Kurd weha ne! Ji hev re naxwazin, ji hev re hesûd in.

Kovara HELWEST û weşanxaneya ÇANDA NÛJEN dê kar û xebata xwe ya kulturî berdewam bikin. Di nav weşanên ÇANDA NÛJEN de em dê ZÎNê û gelek pirtûk biweşînin. Hinek pirtûk ji niha de amade ne. ZÎN jî dê salê hejmarek yan jî du hejmar derkeve.

Kovara HELWEST li gor xwe ji bo pêşveçûna kultur û lîteratura Kurdî xizmet kir e. Di pêvajoya weşana HELWESTê de gelek mirovan alîkarî kirin, em ji wan re sipas dikin. Em dixwazin ku ew alîkariya xwe ji bo ZÎNê jî bidomînin. Ji bo dewlemendiya naveroka ZÎNê alîkariya rewşenbîrên Kurd pêwîst e. Xebatên çandî, edebî, rewşenbîrî li ser milê ronakbîran e. Wek ku Abdulhelîm Yûsif di kovara Zanîn de dibêje: "Mirov dilweş û şa dibe bi pîrbûn û zêdebûna pêûsên Kurdî û pîrbûna pirtûk û rojname û kovarên Kurdî jî, deriyên xêr û xweşî û jiyanê li ber gel û tore û çanda me vedikin."

Bi van gotinên rast yê li jor em ji niha ve ji ZÎNê re xêrhatin dibêjin û jê re di jiyana weşanî de serkeftinê dixwazin.

Kovara HELWEST

DAXÛYANÎ JI RAYA GIŞTÎ RE

Swêd dewletek dewlemend û demokratîk e. Penaber û biyaniyên ku li Swêd in xwedanê hemû mafên xwe yên demokratîk û mirovahiyê ne. Penaber bi zimanê xwe li ser çanda neteweya xwe dikarin bi her awayî kar û xebat bikin. Dewleta Swêdê ji bo kar û xebata çandî alîkariya peran ji komel, weşanxane û hemû cure dezgeh û saziyên biyaniyan re dike.

Bi navê Kulturrådet saziyek fermî ya dewleta Swêdê heye. Ev sazî ji kovar û weşanxaneyên biyaniyan re alîkarî dike. Nivîskarên biyanî ji bo mesrefa berhemên xwe ji ew saziyê alîkariya peran digirin. Gelek kovar û rojnameyên biyaniyan jî ji wê saziyê alîkarî digirin û bi saya Kulturrådetê jiyan xwe ya weşanî dimeşînin.

Di vê saziya çandî a Swêdî de ji her neteweyên biyanî "Komîsyon" "Referans grup" û "Raportor" hene. Ev komîsyon ji kesên ku di hêla çand û edebiyatê de pîspor in (!) pêk tê. Ew komîsyon li ser berhemên edebî biryar didin û saziya Swêdî jî li gor wan biryarên komîsyonê û li gor raporên wan alîkarî dide an jî nade wan kovar û weşanxaneyan.

Di saziya Kulturrådetê de komîsyonekî Kurd, kesên Kurd yên referans, kesên raportor hene. Ew kesên Kurd ji bo ku ew saziya Swêdî alîkarî nede hinek kovar û weşanxaneyên Kurdan çî ji destê wan tê dîkin. Pirtûkxaneya Kurdan qels e. Divê bi weşanên Kurdî ew pirtûkxane bêt xurtkirin. Lê dilê vê komîsyona Kurdî, dilê van kesên raportor yên referans tune ye ku ew saziya Swêdî alîkarî bide kovar û weşanxaneyên Kurdan. Ev kesên Kurd yên dilnepak ji karê çandî, edebî re dibin asteng. Tu dibêjî qey ew pereyên ku alîkariya kovar û weşanxaneyên Kurdî bête kirin ji cêva (berîka) wan derdikeve. Tu dibêjî qey dewleta Swêdê bi vê alîkariyê

feqîr dibe, lê ev komîsyon, ev Kurdên eqilmend(!) dewletê ji feqîriyê xilas dikin. Komîsyon bêteref nîn e. Li gor têkiliyên şexsî (kesayetî) û bi hîsî biryar didin. Komîsyon bi vê helwesta xwe ya negatîf naxwaze kes pirtûk derxe an kovar biweşîne. Kovar bêne weşandin zirara wan ji wan kesên hesûd re çi ye? Çima ewqas hesûdî dikin? (Ji wan hinek kes li dij weşanên Çanda Nûjen û kovara HELWESTê ne.) Ji bo ku weşanxaneyên Kurdî ji holê rakin hemû tewir asteng derdixin pêşberê wan kovar û weşanxanan. Ji bo ku kulturrâdet alîkariyê neda kovar û weşanxaneyan çi ji destê wan hate, kirin û gihîştin miradê xwe (!).

Weşanxaneya Çanda Nûjen hetanî niha şanzdeh (16) pirtûk û şeş (6) hejmar jî kovara HELWESTê weşandiye. Weşanên Çanda Nûjen û kovara Helwestê alîkarî negirtin. Gelek kovar û weşanxaneyên din jî îsal alîkarî negirtin. Kovara Roja Nû, Helwest, Armanç, Dugir, Avaşîn, û kovara Xaç a Sor a Kurd alîkarî negirtin. Îsal kovara Nûdem, Çira, Gizing, û Kurdistan Bultenê alîkarî girt in.

Weşanên Çanda Nûjen li gor îmkanên xwe yê madî berhemên çandî û edebî weşandiye û ji niha pêve jî dê biweşîne. Weşanên Çanda Nûjen gelek fedekarî kiriye û wan berhemên edebî weşandiye. Ev welarparêziye, ev fedekarî ye, têt kirin.

Çima alîkarî nedan kovara Helwestê û weşanxaneya Çanda Nûjen? Helwestê û Çanda Nûjen bi wan çi kirine? Nanê wan ji destê wan revandine? Ev hesûdî, ev hemberî, ev dijîtî ji bo çi ye?

Çima nahêlin kovara Helwest weşana xwe bidomîne. Domandina kovara Helwestê ji bo pêşveçûna ziman û çanda Kurdî pêşveçûnek e, rawestandina wê wendabûnek e. Vebalê vê wendabûnê jî di hustiyê hesûd û çavnebaran de ye.

Heger kovara HELWEST ji ber astengên aborî bê girtin sedemê wê dê ew kesên hesûd û çavnebar bin. Heger dev ji hesûdî û çavnebariyê bernedin dîrok wan efû nake, nabexşînê. Bila bihêlin kovara HELWEST jiyana xwe ya weşanî bimeşîne. Bila kar û xebata me ya kulturî û edebî berdewam bike.


KOVARA HELWEST



WEŞANÊN ÇANDA NÛJEN

PÊŞANGEHA PIRTÛKÊN KURDÎ

K. HELWEST



Weşanxaneyên Kurdan yên li Swêdê di 2.11. 1996'an de civînek çêkirin û biryara amadekirina "Pêşangeha Pirtûkên Kurdî" girtin. Li gor biryarê dê hersal li Stockholmê Fuara Pirtûkên Kurdî bê vekirin.

Weşanxaneyên ku beşdarê vê civînê bûn ev in:

1 - Weşanên Nûdem - Firat Cewerî, 2 - Weşanên Çanda Nûjen û Weşanên Jîna Nû - Lokman Polat, 3 - Weşanên Apec - Alî Çiftçî, 4 - Weşanên Roja Nû - Haluk Ozturk, 5 - Weşanên Pencînar - Zeynelabîdîn Zinar, 6 - Weşanên Welat - Hesenê Metê, 7 - Weşanên Rewşen - Robîn Rewşen.

Wek têt zanîn li Tirkiyê û li welatên ewropayê her sal fuarên pirtûkan vedibin. Di van fuarande bi hezaran pirtûk têne firotin. Fuar dibin pirek di nabeyna pirtûkan û xwendevanande. Amadekirina vekirina fuara Kurdî karekî hêja û girîng e. Ev cara yekemîne ku xebatekî weha ji alî Kurdan ve têt

amadekirin. Xebatek hêja ye, pêngaveke baş e. Çalakîyên weha yên kulturî têkiliyên di navbera weşanên Kurdan de jî germ dike. Xwendevanan bi weşanên curbecur dide agahdarkirin.

Ji bo ku mirov kultura xwe pêşve bibe û dewlemend bike divê van pirtûkên ku weşanxaneyên Kurdan derxistine bikire û bixwîne.

Di 7 û 8'ê meha 12'an a sala 1996'an de li Stockholmê cara yekem bu ku "Pêşangeha Pirtûkên Kurdî" hat li dar xistin. Pêşangeh -anku fuar- ji alî weşanxaneyên Kurdî ve hat pêkanîn. Weşanxaneya Apec, Çanda Nûjen, Rewşen, Jîna Nû, Nûdem, Mezopotamya, Roja Nû, Sara, Pêncînar, Sol Forlag û Deng beşdarê vê pêşangehê bûn. Radyoyên Kurdî, Radyoya Pence-re, Radyoya Aştî û Med Tv hatin hevpeyvîn bi beşdaran re, bi xwediyê weşanxaneyan re çêkirin.

Du roj li ser hev xwendevanên Kurd hatin pêşangehê geriyan, pirtûk kirin û bi xwediyên weşanxaneyan re sohbetê kirin. Li gor nifûsa Kurdan ya li Swêdê, Kurdên ku hatin serlêdana pêşangeha pirtûkan kêmtir bûn. Ji Kurdên siyasî jî gelek kes nehatin pêşangehê negerîyan. Kîtleiyên -girseyên- hêzên siyasî yên Kurdan jî pirr kêmtir hatin. Mirovên derdora ERNK û PYSK'ê pirr kêmtir hatin. Ewan jî pirr kêmtir - tek, tûk- pirtûk kirin. Li Swêdê kîtleya PYSK û ERNK'ê gelek hene, qelebalixin, lê nehatin.

Kurdên başûr jî hindik hatin. Ew jî pirtûkên bi tîpên Latînî-Kurdî naxwînin, li tîpên Muhamedî digerin. Her çiqas bi tîpên Muhamedî-Erebî- jî pirtûk hebûn, lê wan ji ber cimrîtiya xwe pirtûk nekirin. Kurdên başûr gelek cimrî ne. Pirtûk nakirin û naxwînin.


Pirtûk ji bo xwendinê têne nivîsîn. Ahmedê Xanî dibêje: "Heger xwendevan nebe ez çi bikim bi nivîsîna helbestan.", "Tu netewe, tu gel bê pirtûk nabe xwedî pirtûkxane, bê pirtûkxane jî nabe xwedî hêz. Her pirtûkek Kurdî qezancek mezin e ji bo çanda Kurdî, zimanê Kurdî, edebiyata Kurdî." Hem li welêt û hem jî li derveyê welat xwendevanên Kurd yên ku pirtûkên Kurdî dixwînin kêmtir in. Pirtûkên xwerû bi Kurdî nahên firotin. Kovarên Kurdî ji bo pêşveçûna çand, ziman û edebiyata Kurdî xizmetên hêja dikin, lê aboneyên van kovarên xwerû bi Kurdî gelek kêmtir in.

Ji ber kêmbûna xwendevanan jî ev gavavêtin, karekî pîroz bû, pêngavek bû. Divê pêşangehên pirtûkên Kurdî li welêt û derveyê welat hersal bê pêkanîn. Weşanxaneyên Kurdî yên li Swêdê biryar girtine ku hersal li Stockholmê fuara pirtûkên Kurdî vebikin.

Bi hêviya ku li Almanyayê, Li Parîsê, li Swîsê, li Holandê, li Îstanbulê û li Amedê fuarên pirtûkên Kurdî bêne vekirin. Kovara Helwest weşanxaneyên Kurdî pîroz dike ku pêngavek weha bi rûmet avêtin.

XWÎN, AGIR Û NEWROZ

Yilmaz GUNAY



Xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî roj bi roj zêdetir dibe. Bikaranîna alfabeya latînî di nava Kurdan de, li welat û derveyî welat, her ku diçe zêdetir dibe. Gelek berhem bê westan têne wergerandin û bi vê yekê gelê Kurd, li hemû tiştên xwe, gav bi gav xwedî derdikeve. Berhemên Yilmaz jî di nava vê rêzê de ye. Pirtûkên wî têne wergerandin, nivîsên wî têne belavkirin û film û şexsiyeta wî piralî tê nirxandin. Di vê nivîsê de hewldan ew bû ku, “Dîtina Yilmaz li ser doza Kurd û cejna Newrozê” bi kinahî bê berhevkirin û bi kurdî pêşkêşî xwendevanan bibe. Gava ev weke xizmeteke biçûk bête pejirandin, dê emê bi xwe kêfxweş bibin...

Kovara Helwest

Pirsa Kurd Pirseke Serxwebûn û Azadiyê ye

Cihê xemê ye ku heya nuha cih û nirxê çand û hunera şoreşgerî, jî awîra têkoşîna şoreşgerî ve nehatiye têgihiştin. Ev rastîyek e. Gava hinek hêzên politîk, hevalên bi karê hunerî û çandî dadikevin, tenê nahêlin û piştigiriya wan bikin jî, ev bawerî

rastiyê naguherîne. Ji ber ku, “hunera ku li ser navê komik an” û “hunara li ser navê şoreşê” du tiştên ji hev cewaz in. Şixulkêrên karê hunerî û çandî, ji bo çêkirina yekitiyê, şoreşgeriyek xurt û bi rêk û pêk, ji bo vekirina riya şoreşê, roleke berçav hildigrin ser milên xwe. Divê ev bête dîtîn û têgihiştin. Bi riya çekdarî tenê em nikarin zora dijmin bibin. Çek, hêz û danûstandina wanî navnetewî ji ya me xurttir e. Ji aliyê civakî, ramyarî û çandî ve wan gelek ji heyyên me kavi kirine. Gava karê çandî û hunerî bi siyaseta îdeolojîyê rast bête meşandin, dê emê karîbin di nava van xirabûna heman de dîsa riyekê bibînin.



Rêç, ji bo têkçûna emparyalîzm, dagîrkêrî û paşverûtiya bi hemû cûreyî ferman dike ku: em, di her aliyê jiyânê de, bi hemû rengî, li hemberî wan şer bikin. Heya naveroka çanda emparyalîzm, bûrjûwazî û feodalîzm baş neyê diyarkirin û her wesan li hemberî wan, bi nimuneyên konkret em çanda pêşverû, demokratîk û şoreşgerî nîşan nedin, dê çawa karîbin gel bi xwe bidin bawerkirin û wan bixşînin aliyê xwe. Tû çand, bi peyvên ne xweş û ne di cîh de hilnaweşe. Her çandek piştî xwe dide çîneke civakî û otorîteyek ramyarî û aborî, bi hilweşandina wan, di demek dirêj de ew rengên çandan dikarin ji holê rabin. Gava jiyana otorîteya ramyarî a çînekê bi dawî were, nayê wê wateyê ku adetên wê yên çandî û civakî jî têk çûne. Ji ber vê hindê ye ku, di avakirina dîtînên xwe de, divê em pir kûr dakevin û binaxê di nava cengê de deynin. Em weke kesên şoreşger, demokrat û welat-

parêz divê xwedî xezîneyek çandî bin. Divê em li çanda cîhanî a şoreşger, demokrat û pêşverû xwedî derkevin û ji jiyana xweyî çandî a nûh re bikine rêber. Pirsê me, ne bi tenê çanda netewî ye. Di dema me de, sloganê pirsê çandî heye. Ev ne cîh de ye. Gelê Kurd, weke karekî ku bête kirin, pirsê çanda netewî nikare bide pêşiya xwe. Gelê xwedî li çanda xwe û karakterê wêyî pêşverû û demokrat derkeve, li aliyê din divê li dijî wan karakterê feodalî û paşverû derkeve.

Pirsê Kurd, weke ku hûn dizanin, ne pirsê zordestiyeke kulturî ye û ne jî pirsê Kurd û Tirk, Kurd û Ereb, Kurd û Ecem e. Bi tevayî pirsê serxwebûn û azadiyê ye. Kurdistan, ji awira xweyî civakî, ramiyarî û cografîk û li aliyê din potansiyela şoreşger ku himêz dikê ve, di Rojhilata navîn de xwedî ciheke taybetî ye. Li ser vê bingehê, pirsê netewî a Kurdan, ne bi şeweyekî teng anku sînorkirî, divê ji awira rizgariya gelên li Tirkîyê, Iran, Iraq û Sûriyê jî lê bete nêrîn û nirxandin. Gava bi vî çavî mirov nêzî pirsê bibe, kar û barê çandî û hunerî, bi taybetî ji awira gelên li Rojhilata navîn ve ku çiqas bi nirx e, derdikeve holê. Ji ber vê yekê çand û kulturek nûh a kurdan û kultur û hunera şerê serxwebûn û azadiyê, ji aliyê din ve jî dê çanda biratî, dostaniya gelan divê hebe...

Newroz

Sembola Têkoşîna Serxwebûn û Azadiyê ye

Hevalên minî birêz, mêvanên hêja! Hûn hemû bi xêr hatin û bi hezaran silav li We! Weke hûn dizanin Newroz, ji bo Gelê Kurd, sembola: Berxwedana li hember zilm û zordarî, bêzarbûn û xwespartinê ye. Ew sembola têkoşîna serxwebûn û azadiyê ye. Ez dizanim ku, ew kesên li vir gihane hev, li ser vê bingehê yek dil in û bi vê wateyê dilên wan bi hev re lê dixê. Dê dilên zarokên me jî ji bo vî tiştî lêbixê. Ji bo berxwedana li hemberî zilm û koledariyê, ji bo serxwebûn û azadiyê, ji bo ku ji cudahiyan, yekîtiyên xurt ava bikin. Ji bo van armancan heya nûha gelek qurban hatine dan. Hîna jî dê bête dayîn. Em dizanin kî bê qurban serkevtin nabe. Divê ku em xwîn û agir bidine ber çavên xwe. Em dipirsin: Ma gelo kes dikare dilekî wesana heya serî bi bawer, bê westan û bi înad bide sekinandin? Ma kes dikare gelên wesana xwedî biryar û fedakar bide tewandin? Na!

Zordarî, êş û jan, hejartî, xwîn û hêstir ne qedera Gelê Kurd e. Em pêşerojek wesana napejirînin! Em, ne zarokên welatê ku ji her çal aliyê xwe hatiye dagîrkirin in. Em dixwazin bibin zarokê welatê kurdan; weleteke serbixwe, demokrat û yekhev, yê Kurdistan. Em dixwazin bi zimanê xwe, li ser xaka xwe stiranên evînê û azadiyê bistirin; cîhana xwe bi destê, li ser erda xwe ji nuh ve bistirin û şiklekî nûh bidinê de. Li welatê xwe, di bin ala xwe de, bi azadî û serbixwe bijîn.

Em jibîr nakin ku, berjewendiya karkerên Kurd, Erebb û Ecem bi avakirina dewletên bi hêz dikare bîn parastin. Dîsa em dizanin ku, heya zemîn ji bo yekîtiyên bi dil di nava aliyên de ava nebe, yê din xewn e.

Îro li gelek deverên Kurdistanê, li ser serê çiyên, li beriyên û zindanan faşîstan, li hemberî zîlm û hovîtiya dagîrkêran berxwedan û şerê bê westan ku tîr kirin û kesên ku di vê riyê de şehîd dibin jî, armancan wan ev e. Di vê riyê de hevalên ku şehîd bûne di dil û tekoşîna me de dijîn û dê bijîn. Heft xwezî bi dilên wan ku berxwedan û canê xwe dan lê serî ne tewandin, bûne agirê serxwebûnê. Heft xwezî bi dilê wan!..



Şerê serxwebûnê her yek e. Carna du rêz nivîs, an jî dîtinek; stranek ku dil û kezêba dike pola û radike ser nîgan, an jî dengê tîlên tembûrêkê, ji bombeyê atomî bi hêztir e. Ji ber vê yekê ku divê em: Di hemû waran de bibin şerkerek baş û serketî û şerkerên leheng û serketî perwerde bikin, bighêjin. Bi şeweyekî herî baş li tîlê tembûrê bixin, bikarbînin; stranên xwe pir xweş bistirînin, wêneyên herî baş bixşînin; çîrok, helbest û romanên pir nîrx biafirînin. Zanyarên serketî ji nav xwe derînin, dîplomat û teknîsyenên heja bighînin. Divê destên me karîbe bi şeweyekî serkevtî, pênuş, makîne û çekên curbe cur bikar bîne.

Gelek caran em karîbin çeka xwe weke tembûrê û tembûra me jî rola sîlah bîne cîh. Em baş dizanin ku, gava em stran û peyvên xweyî di cîh de bikarbînin, dikarin ew bibîne ber.

Çiya û berî û çemên me li benda me ne. Em naxwazin jiyana xwe hemî bi penaberî û derbederiyê derbas bikin û herdem stranên xerîbiyê bêjin.

Me weke gel, bi mîrxasî, egîdî û lehengiya xwe destanên mezin dane nivîsandin û em karin hêza me tîr dike ku kelemên li pêşîya xwe rakin.

Şoreşgerên demokrat yê Ecem, Tîrk û Erebb, ku di vî şerî de alîgir in û piştgiriya serxwebûna Kurdistanê dikin, şerê xwe li hemberî dijminê vekhev didomînin. Çînen ku tîr pelçiqandin û biratiya çîna, çekek meyî herî bi hêz e.

Bila dost û dijmin tev zanîbin ku: Emê biserkevin û serkevtin para me ye! Ji bedêla jiyana bi koletî, mirina weke şerkerê azadiyê xweştir û bi watetir e.

Bijî Kurdistanê serbixwe, yekhev û demokratîk!

Çavkanî: Nivîsên ramyarî III, Y. Guney, Weşanên -Gulan - Mayis -, rûpel - 137-139, 170-174 - Werger ji tîrkî: Gabar Çiyân

Edebîyat Hunera Ziman e Ew Huner Jî Di Zimanê Kurdî Da Heye

Aram GERNAS

Rewşa Ziman û Edebîyata Kurdî Ya Îro

Berî her tiştî divê meriv bide xuyakirin ku, zimanê Kurdî, zimanê dewlemend e û bi şeweyeke serketî di edebîyata nivîskî ya Kurdî da hatiye bi kar anîn. Ji destpêka sedsala yazdehan heta dawîya sedsala hivedhan gelek berhemên yekta bi vî zimanê hatine afirandin û ev sedsalên hanê ji bo edebîyata Kurdî serdemên zêrîn in. Berhemdarên nemir yê wê Elî Herîrî, Melayê Batê, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî di van sedsalan da derketine û wê ku Melayê Cizîrî dibêje : "Ger lu'lu'ye mensûrî ji nezmê tu dixwazî / Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet". Bi rastî jî, pêwîstî bi tu hacetek tune ku em bikevin îspatkirina dewlemendîya zimanê Kurdî. Bi rengeke neteweyî û bi daxwaza dewletbûnê Ehmedê Xanî jî ji xwe, ji gelê Kurd û ji zimanê Kurdî emîn e :

"Na, Kurd ne pirr xav û negihîştî ne
Lê belê bêmecal û bêkes û sêwî ne

Ne ku hemî pêkve nezan û nexwendî ne
Lê belê bextreş û bêcare û bêxwedî ne

Eger hebûya ji bo me jî xwedîyek
serbilind û qencîkar, peyvzan û jêhatîyek

Zanyarî û pirtûk, gîhîştin û aqilmendî
helbest û pirtûkên helbestan, xezel û hunermendî

ev tewir bibûya li bal wî kêrhatî
ev zêr û zîv bibûna li nik wî xêrhatî

min ê hingê alaya helbestan rakira
û li ser banê Gerdûnê bilind bikira

min ê banîya ve gîyanê Melayê Cizîrî
min ê bi wê alayê vejanda Elîyê Herîrî

min ê kêfeka wisa bida Feqîyê Teyran
ku heta heta bimaya heyran”

Edebîyat, hunera ziman e. Berî Ehmedê Xanî û piştî wî jî alaya vê hunerê li
ser banê gerdûn hatîye çikilandin.

Heta dawîya sedsala 19'yan (ji bo Kurmancî) di edebîyata nivîskî da şîer
hema bêje temamîya cîh digre û yekşax e. Di warê pexşan, çîrok, efsane,
serpêhatî, tîyatro û roman da bi hezaran berhem hene, lê mixabin ew bi
devkî gihane serdema me. Eger em zargotinê ji edebîyatê bihesibînin, ku ez
bêşik dihesibînim, ev tê wê maneyê ku edebîyata Kurdî ji edebîyata cîranên
xwe pir ne kêmtir e. Hetta di warê afirandin, hunera ziman û pêşketina wê
da şansê zimanê Kurdî ji yên cîranên xwe zêdetir e, lewra zimanê Kurdî zi-
manekî lîrîk e û li edebîyatê gelek tê.

Rewşa şîerên Kurdî yên nivîskî baştir e û xwedî paşkok û bingeheke kevintir
e. Di warê şîer da kêmasîyen mezin tunene, lewra ev beşê edebîyatê gelek

hatiye bi kar anîn û berhemên me jî gelek in. Pewîstî bi şîera hevçerx heye û di vî warî da jî, ji niha va gelek şairên me yên serkevtî û hêja hene. Wek, Kemal Burkay, Şêrko Bekes, Abdullah Goran, Rojen Barnas, Gundî û hwd. Kevneşopîya nivîsînên pexşan, çîrok, destan û serborî jî, li gor romanê gelek pêşketîtir û kevintir e. Ev alî zêtir derketiye pêş (tevî ewqas qedexa û zordarîyan jî). Lê ev nayê wê manê ku ev mijar serketî ye. Bi taybetî di warê naverok û mijaran da xitmandinek jî heye. Naveroka piranîya çîrok û pexşanên heyî, zêtir li ser sîyaset, zulm û zordarîya ser gelê Kurd e. Bêşik ev wêne bi rewşa welatê me va girêdayî ye û heta ev rewş weha berdewam bike, ev mijar ji rojevê nakeve. Lê ji bo pêşketina edebîyata hunerî û hevdemî pêwîstî bi bûyer û mijarên cûrbicûr ên civakî, kulturî, hestî û psîkolojîk heye, pêwîstî bi şêwe û naverokên nû heye, pêwîstî bi teknîk û wêneyên nû heye...

Nivîskarên Kurd ên ku edebîyata hunerî hildibjêrin, wek pexşan, roman, tiyatro û hwd, divê berî her tiştî hay ji ilmê edebîyatê û şaxên wê hebin. Ferqiyên navbera pexşan, roman û çîrokê têbigihîjin û rê nedin tevlihevîyek. Lewra em şahidê hin berhemên wisa dibin ku, navê roman li wan hatine kirin lê dema meriv dixwîne dêlva romanê da yan serpêhatî yan jî çîrokek dertê pêşberî me. Berevajîyê wê, wek pexşan tê bi nav kirin lê romanek dertê pêş. Ev rewşa han dide xuyakirin ku, di têgihîştina averûyên edebî da tevlihevîyek heye, ev karê han bi zanistîyek baş nayê kirin.

Li alî din divê nivîskar bal û hişê xwe bidin ser jîyana şexsîyetên ku di romanê da cîh digrin, serborîyên wan ên ku bûne qeder, têkilîya navbera karakterên wan û derdorên wan û rengên ku di wan têkilîyan da dertên pêş. Ango jîyana qehremanên romanê him ji alî karakter û hestî va him jî ji alî pêwendîyên wan bi derdorên xwe ra bi kûrahî bête pêşkêşkirin. Uslûb û ravekirinên hunerî, daxuyanîyên karakteristî ên bûyer û qehremanên wan, daxuyanîya nakokîyên jîyanê, nakokîyên di bûyeran da û bişkafîna karakterê şexsîyetan, pevgirêdana bûyeran, naverok û hwd. nuqteyên sereke ne di romanê da. Bi kurtî ji bo pêşketina romanê, îhtîyacî bi zanîn û tecrûbe heye. Qonaxa ku em tê da ne, qonaxa destpêkê ye. Nebûna sazî û dezgehên neteweyî, qedexa û zordarîya ser gelê me astengîyên sereke ne li pêşberî pêşketina edebîyata Kurdî. Eger meriv bala xwe bidê, gelek zela dibîne ku

piranîya pêşketinên heyî li dervayî welat çê dibe. Lê tevî ku ev qonax teze ye jî, gavên gelek hêja tînin avêtin, berhemdarî roj bi roj kalîtetir dibe û ji niha va hêvîyeke pir mezin peyda bûye.

Dîtinên min ên derbarî pêşketina roman û edebîyata Kurdî da, pîvanên pêşketinê ne û nîyetekî min ê aqilmendîyê tune.

Roja îroyîn, rewşa ziman û edebîyata Kurdî baştir e. Lê mixabin ku hêj jî, xebatên ser ziman û edebîyat û hema bêje hemû mijarên din li dervayî welat tê meşandin. Ango zimanê Kurdî jî wek nivîskarên xwe li nefiyê ye, ji axa xwe dûr e û ya herî girîng jî ji xwendevanên xwe yê eslî qetandî ye. Gelo ew xebat û berhemên hêja çend prosent digihîjin xwedîyê xwe? Ez ne bawer im ku, ji sedî pênc prosentî derbas bibe.

Baştirbûna rewşa edebîyata Kurdî ji çend alîyan va weha ye :

Ji alî ziman va, çiqas diçe di navbera Kurdan da him di warê axaftinê da him jî ji hêla nivîsandinê da şîrîkatîyek peyda dibe. Di nivîsarên rojname, kovar û pirtûkan da termînolojîya ku tê bi kar anîn, şêwe û stîla ku tê bi kar anîn, tevî ewqas dîyalekt û devokên heyî, zimanê ku tê bi kar anîn nîşan dide ku meşa edebî berbi serketinê diçe. Di warê ziman da pêşvaçûyîneke din jî, roj bi roj xurtbûna hîlbijartina nivîsandina zimanê Kurdî ye û zêdebûne kovar, rojname û pirtûkên Kurdî ne.

Di warê form, naverok, pêşkêşî û zimanê lîteraturî da serdemek nû dest pê kiriye û hêdî hêdî hevdemî tê qefaltin. Heyecan û uslûbên herikandî di nivîsaran da xuya dibin. Mijarên naveroka pirtûkan ji yekmijarîyê dertê û berbi pîrmijarîyê va diçe. Ango edebîyata Kurdî ji qalibê mijara kevneşopî û sereke ya hevs û zîndan, êşkence, zulm û tadeya dewleta Tirk dertê û dest davêje gelek pirsên civakî, çandî, hunerî û hwd. Ji bo vê pêşketinê nimûne (kêm bin jî) dertên. Wek, Mehmet Uzun (bi romanên "Sîya Evînê", "Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê") û Hesenê Metê (bi romana "Labîrenta cinan").

Roj bi roj hejmara nivîskarên Kurd zêde dibin û bêguman tevî mijarên nû pênivîsên nû jî dertên holê.

Pêşketinekî din jî, di warê rastnivîsînê da (gramatîk) dertê pêş. Hûn jî dizanin ku pîrsa rastnivîsînê bi salan sergêjayîyeke mezin bû û hêj jî ev sergêjayî bi xurtî berdewam dike. Û ez bawer im ev pîrgirêk wê pir bikşîne.

Dixwazim bi çend gotina hin kêmasîyan jî bînim ziman û vê pirsê temam bikim. Ji ber zordestî û qedexeyên dijmin, gelek pêwîstîyên me ji sifirê dest pê kirine (xebatên yek bi yek ên berê qet nayên ji bî kirin û pîrozbihayîyek mezin didim wan), loma jî kêmasîyên me pir in. Lê çi heye em ji kêmasîyan natirsin û zanin ku piranîya kêmasîyan ne bi me va girêdayî ne.

Divê ez di destê pêşî da bal bixşînim ser kêmasîyekê, ku ev bi me va girêdayî ye, ew jî qelsî û sistîya xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî ye. Divê em ji bîr nekin ku, Kurd bi saya parastin û axaftina zimanê xwe li pîya mane. Parastin, xurtkirin, xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî nivê azadîyê ye.

Bêguman tunebûna alfabeyek standard, bandoreke nepak li ser xwendin û nivîsandinê dike û ji alî moral va sistîyek peyda dike.

Alîyekî me yê pêşneketî jî, rexne û rexnegirî ye. Gelek caran rexne ji eyarê xwe dertê û dikeve kirasekî heqaretê û dilmayînê. Lê bi qasî ku ez dizanim di edebîyatê da rexne hertim xwedî roleke pozîtîv e. Him dîtî û ramanên xwendevanan him jî nivîskaran werdiçerxîne.

Xebatên ku tîn amade kirin, bi awayekî îdeal tîn pêşkêş kirin û tu alîkarîyek maddî nagihînin nivîskarên xwe, ango keda nivîskar bêbersîv dimîne û pîrî caran mesrefên ku li van xebatan tîn kirin ji berîka nivîskar bi xwe dertê. Ev rewş, dibe sedemê bedbînî û sistîyê. Gelek caran ev pirsgrêk bi tunebûna dewletê va tê girêdan. Ez bi xwe vê bersîvê, bersîveke kevneşopî û kurtebirî dibînim. Li gor raya min, eger berhemên Kurdî têrî xwe bazareka xurt a xwendevanan bibînin û xwedî sazî û dezgehên çapemenî bin, keda nivîskaran wê baştir bêne nerxandin, wê moral û helwestê bide nivîskarên Kurd.

Kêmanîyeke mezin û berbiçav a ku kêma cara dikeve rojeva me û tu caran bi awayekî ciddî li serê nayê rawestîn, edebîyata zarokan e. Xebatên heyî bi tilîyan tîn jimartin û ev rewş perwerdekirina zarokên Kurd dijwar dike, zaroktîya wan bi wan nade jîyandin. Piranîya pirtûkên zarokan ên heyî li Swêdê hatine çap kirin û wergêrên çîrokan in. Divê hunermendên Kurd ligel çîrokan bal bidin pirtûkên perwerdekirinê: Faktayên civakî, kulturî, tarîxî, teknîkî û zanyarîyê. Bal bidin ser muzîk, tîyatro, huner û hwd ên zarokan.

LI SER ANALÎZKIRINA BERHEMÊN EDEBÎ ÇEND PEYV

N. ZAXURANÎ

Ez dixwazim berîya ku dest bi analîzkirina berhemên hunerî / edebî bikim, piçekî li ser naverok û awayê (şiklê) berhemên edebî rawestim. Naveroka berhemên hunerî bi kurtî ji van diyardeyên ku dê li jêr bêne şirove kirin, tê meydanê: Ya yekê, afirandina karakterên bi reng civakî yên ku bi îmajan ji alîyê nivîskarî ve tên hunandin bi xwe ye. Lewra ev karakterên bi reng diroki û civakî dibin mijar jo bo berhemên hunerî di serpêhatina dem û dewranan de. Ji xwe ev karakterên di jiyana civakî de gelekî tevî hev in û ji peywendîyên bi gelek alî û aloz têne pêk anîn. Ji ber vê yekê ji ev karakter zehv bi nakokî ne. Nivîskar dema ku dixwaze bikeve nava cihana karektêrên bi reng civakî bi awayekî xwezayî li gore nerîn û idealên xwe bala xwe dide van karektêran û li ser hinek alîyê wan yên bingehî dirawaste û bi hemû hebûna xwe li ser wan hur û kûr dibe.

Bêguman karê bê pirs kirin: Ma ji bo ku hunermendek karibe karektêrekê biafirîne pêdivîya wî bi gelek karakteran heye? Di vi warî de çend metod hene: Ya yekê, metoda M. Gorki ye: Lewra bi qasî ku ji berhemên Gorki tê xwiya kirin heta ku wî di kar û barê xweyî hunerî de karektêrek bi hemu alîyên wê di jiyana civakî de dest nîşan bikira, di vê hêlê de wî gelek karakter abstrak dikirin. Bi alîkarîya vê yekê ji wî karektera xweyî ku di ternînolojîya huner de jê re tê gotin protîp, diafirand.

Lê heçî Çernîşevski bû ne di vê bîr û bawerîyê de bû. Bi ya wî, pêdivîya nivîskarî ji bo ku bikare protîpa xwe biafirîne bi gelek karakterên nîne. Ji ber

vê yekê jî wî digot: Divê niviskar "Rastîyê di mirovên bi reng jiyânê de binase û vê rastîyê bi nerînên xweyi hunerî yên hur û kûr bibîne." Biya min nerîne Çernişevski di wî warê de ji ya Gorki bi rêk û pêktir tê xwiya kirin. Lewra hijmareke ne hindik ji nivisekarên binav û deng mîna karekterekî diroki û civakî xwe bi xwe xistine protîp ji bo mijara berhema xweyî edebî. Mînak, Çehov di "Doktor Astrovi" de, Furmanov di "Çapeyevki" de, Lev Tolstoy di "Olenin û Levini" de û ji niviskarê me kurdan yê herî taze Mustafa Aydoğan di "Pêlên Bêrikiriyê" de berhemên xwe li dora jiyana xwe afirandine. Ezê tozekî li ser vê romana wî rawestim, lê ne nuha, di rêzen pêşya me de.

Ji bilî vê yekê ji fonksiyoneke berhemên edebî / hunerî din ji heye. Weke ku di rêzên jorîn de ji hate dest nîşan kirin, berhemên edebî ji bilî ku karakterên fiktîf (xeyalî) yên bi gelek alî, bi detayan biafirînin, herweha berhemên edebî bi pivanên heyacani an nerînî yên ku ji aliyê niviskarî ve li dorbera karakterên fiktîf tînin hunandin, tîne pê. Nivskar bi saya van pivanên xwe yên bi reng heyacani an van karakteran pesend dike, an jî wan mahkûm dike. Ji xwe divê ev mahkûmkirin bi nerîna diroki ya konkret bigunce. Ma ne ji ber vê yekê ye ku Mehmet Uzunî di romana xwe ya bi navê "Rojek Ji Rojê Evdalê Zeynikê" de karakterên mîna Egid Begê bi nixandina xweyî edebî mahkûm dike, lê ji aliyê din ve bi karakterên mîna Tahir Xanî û hostayê edebîyata devkî ya kurdi Evdalê Zeynikê şah dibe, li wan xwedî derdikeve? Ji ber çi ? Bela ku Egîd Begê nukertîyê di welatê me de nuner (temsîl) dike, ji aliyê wî ve tê mahkûm kirin, ji beravajîya vê yekê bela ku Tahir Xanî û Evdalê Zeynikê hebûna kultura me, berxwedan û pêşeroja me nuner dikin, pesne wan dide.

Vêca bi hesanî mirov kare bibêje ku karakterên civakî û dirokî jiyana mirovantiyê çi bi aliyên wê yên civakî, dirokî û çi bi aliyê xislatên (teybetmendiyên) wê yên serekî ku ji aliyê niviskarî ve tê afirandin, bi awayekî ferdî hev beş dike. Ji xwe ev karakterên bi reng civakî û dirokî li gel xislatên xwe yên serekî di nava şart û şurutên niştîmanek û heyameke dirokî de bi goşt û can dibin. Ji ber vê yekê ji karakterên bi reng mirovanti him konkret in, him jî bi reng dirokî ne. Ango divê mirov mîna hunermendan cihê van karakteran di serpêhatina jiyana civakî de - çi di warê kulturî, siyasi û çi diwarê olî û ramanî de - bibîne da ku bi alîkariya vê yekê mirov bikare bandora nerînên felsefî, politîkî yên serdema wan şirove bike.

Ji aliyê din ve ji divê newê ji bîr kirin ku niviskarên heyamên ji hev cuda - Heyama Kevnar, Navîn û ya Nû - karakterên ku ji berhemên wan re dibûn mijar diafirandin, bi tenê li ser hinek aliyên wan yên ku li gore wan giring bûn, dirawestîyan. Heta ku ji wan dihat ev aliyên wan yên giring bi yek alî pêşkêşî xwendevanan dikirin. Bi vî awayî jî aliyên din yên karakteran dibin siha vê pêşkêşkirina bi yek alî de dima. Mînak, Shakespeare di karakterên

bêaxlaq ya Hamletî de heta ku jê hat aliyê Hamletî yê ne bibiryar da pêş û pêşkêşî binerên xwe kir. Ji ber ku ji aliyekî ve Hamletî dixwest tola bavê xwe ji kuştarê (qisasê) wî yê ku li ser textê bavê wî runiştibû, hilîne, ji aliye din ve ji wî xwe di nava mij û moraneke ku her aliyê wî rapêçabû de bi tenê his dikir. Ev her du aliyê karektera Hamletî bi zanayi ji aliyê Shakespeare ve hatin diyar kirin. Ji bo vê yekê ji kesitiya (şexsiyeta) Hamletî bi serê xwe bû mefhumeke dirokî. Weke ku tê zanin Moliere lehengê sereki yê komedya "Tartuffe" ye. Wezifa wi ew bû ku merivê durust ji rê bibe. Ji ber vê yekê jî gava ku Puşkin li ser wina dinivisand, digot ku ew durû ye, lewra heta bi merivên ku qenci pê dikirin jî, wi dixwest ku bi fen û futa jina wan jî ji wan bistîne. Bela vê yekê ji navê wi bi mefhuma dirutiye re bû yek. Ma karakterên di Mem û Zînê de yê mîna Beko ku ji aliyê Ehmedê Xanî ve hatin afirandin, ne ji ber vê yekê bûn nîşana fesadiyê? Heta iro jî gava ku jî yek ji civata me kurdan bi fesadiyê dilebibe, ji aliyê gel ve ew mina fesad tê dest nîşan kirin.

Bi saya şirovekirina niviskarî ya bi reng ideolojîkî meriv ji alîkîyekî ve bingehe jiyana civakî ya niviskarî li gel karektera wî ya çinayeti nas dike, ji aliyê din ve ji awayê (şiklê) afirandina jiyana civakî ya bi reng hunerî hîn dibe. Bi peyveke din, bê ka niviskarî bi kuhan perspektîfê karakterên xwe yê fiktif afirandine, hîn dibe. Bi perspektîfeke rast ku divê karakter konkret û dirokî bin, an niviskarî li gora xeyalên ku bi rastîya jiyana civakî re naguncin, karakterên xwe afirandine. Li vir amanc ji afirandinê, abstrakkirina karakterên protîp bi xwe ye.

Bêguman ku meriv li diroka hunera edebî dimeyazîne, hinganê mirov dibîne ku her berhemeke hunerî xwediyê naverokekê ye. Bêyî naverok berhemên edebî qals û lawaz in. Merivê edebiyarzan bi saya analizkirina naveroka berhemên edebî xweserîya berhemên edebî dinava edebiyata netewî de dest nîşan dike. Lê, li gel vê yekê jî berhemên edebî bi saya awayê (şiklê) xwe bi goşt û can dibin. Bêyî awayê (şiklê) berhema edebî meriv nikare wiha bi hesanî naveroka wê ya edebî analiz û şirove bike.

Baş e, kuhan unsur ji awayê (şiklê) berhemeke hunerî re karin bibin bingehe jî bo ku naveroka berhema hunerî bixemile û bi vî awayî ji bê hunandin. Bi ya min yek ji wan unsurê herî giring ziman e. Bê berhema hunerî bi kuhan zimanî û bi çî uslubê hatîya afirandin jî bo rapêçana awayên (şiklê) hunerî li dorbera naverokê zehv giring û bi reng jiyani ye. Ji ber vê yekê ji filologê binav û deng A. Potebnya di pirtuka xwe ya bi navê "Fikirandin û Ziman" de wiha dibêje: "Aliyê zimanî yê xwedî huner ji xwe di tevgera zimanî ya ku xwediyê dinamîkek afriner e û di geşbûna wî de bi awayekî mahfuz her berdewam e." Hunera edebî ya herî ber bi pêş ku bi alîkarîya zimanî tê afirandin, bi saya peyvên xwedî gelek bi wate yê ku ji nav lêvê kurabavê / keçebavê xwedî huner derdikevin, tê wucudê. Ji xwe gelek watebûna goti-

nan berya hertiştî divê ku di istiarê (Metaforik) de bê ditin. Bêguman dema ku peyv an şor bi gelek wateyê mecazî tên bikar anîn, bê çawa vegotina hunerî dixemile, her wiha ev yeka naveroka hunera ku bi alîkarîya zimên tê pê, bêtir bi goşt û xwin dike. Bi hesanî mirov kare bibêje ku bi saya vê nerîna Petebnya mirov vî alîyê hunera edebî rind fehî dike. Bi rastî jî, di hunandina berhemên edebî de bikaranîna peyvên bi gelek wate serçavîya imajan yê ku berhemên hunerî bi alîkarîya wan tên pê, dewlemedtir dibe.

Ji bilî ku awayê (şiklê) berhemên hunerî bi alîkarîya zimanekî pak, zelal û lihevhatî tên pê, alîyekî din yê awayê (şiklê) berhemên hunerî / edebî heye: struktura bi aheng ya bi reng kompozîsyonî ye. Hunermend bi alîkarîya vî alîyê awayê (şiklê) berhemên edebî peywendîyên di navbera figuran de analiz dike, di serpêhatina hunandina berhemên edebî de bê bûyer bi çi awayî hevdu dişopînin, dest nîşan dike, guhertina perspektîfên vegotinê ji alîyê nivîskarî ve bê çawa tên hilbijartin, dîyar dike.

Alet û uslubên vê struktûra bi aheng ya bi reng kompozîsyonî berhemên hunermendî yê afrîner bêtir hevbeş û kûr dikin. Lewra yekîtiya estetîkî ya berhemên hunerî bi alîkarîya van alîyên awayê (şiklê) berhemên hunerî yê ku bi awayekî kurt li jor hatin şirove kirin, tê pêk anîn. Bêguman bi saya vê pêkanîne naveroka berhemên edebî bêtir dixemile.

Pîştî vê hur û kûrbûna di derbarê analizkirina berhemên edebî de, ez dixwazim ku hinekî li ser romana Mustafa Aydoğanî ya bi navê “Pêlên Bêrîkirinê” rawestim. Bi alîkariya vê rawestandîne jî wê bi gelek alî binirxînim da ku xwendevan di derbarê wê de bîne ronî kirin.

Gava ku min romana bi navê “Pêlên Bêrîkirinê” xwend, romana Çerîşevskî ya bi navê “Divê çi bê kirin?” hate bîra min. Çerîşevskî dixwest ku bi alîkarîya vê romana xwe xortên şoreşger yê serdema xwe bi bîr û bawerîyên şoreşgerî perwerde bike da ku xortên şoreşger jî bi alîkarîya vê yekê bikarin ber xwe bibînin û li pêşberî hovîtiya rejîma Çar têkoşîneke bêhempa li dar bixin. Bi qasî ku ji romana Çerîşevskî ya bi navê “Divê çi bê kirin?” tê fehî kirin, mirov karê bi hesanî bibêje ku Çerîşevskî gihîştî bû vê mirada xwe. Lewra Çerîşevskî bi alîkarîya ramanên xwe yê ku bi awayê imajan di nav rapêçana romana xwe de bi awayekî afrîner pêşkêşî xortên şoreşger kirin, van ramanên wî hiştin ku xortên şoreşger bi metodên tekuztir têkoşîna xwe li dijberî împeratoriya Çar li dar bixin.

Ji bo ku di vî warî de pirsgrêg rindtir bê zelal kirin, ez dixwazim ku li ser minayeke din mijul bibim. Mîna ku tê zanîn romana Saltîkov - Şcedrîn ya bi navê di “Hikayeta bajarekî” de, di vî warî de minayeke bê emsal e. Saltîkov - Şcedrîn dixwest bi alîkarîya ramanên xwe yê bi reng îmajî ku di serpêhatina romana xwe de afirandin e li pêşberî karmendên (memurên) rejîma Çar yê ku li hemberî gel despot bûn, derkeve. Bi vî awayî jî Saltîkov - Şcedrîn ji alîkî ve hewl dida ku karmendên rejîma Çar mahkûm bike, ji

alîyê din ve jî wî dixwest ku tevgera azadîyê ya di nav rafên gundiyan de, bi hêztir bibe.

Baş e, divê em bi çi awayî dest bavêjin romana bi navê “Pêlên Bêrikirinê” da ku em bikarin di vî warî de helwesta niviskarê wê ya di derbarê perwerdekirinê de şirove bikin. Bi ya min metoda herî baş ev e: Ji bo ku helwesta niviskarê “Pêlên Bêrikirinê” ya di derbarê perwerdekirinê de bi gelek alî bê fehm kirin, pêwist e ku meriv bi alîkarîya metnê romana wî pirsgirêkê zelal bike.

Gava ku meriv romanê birêk û pêk dixwîne, meriv di navbera guftûgoyên ku bi amanca perwerdekirinê hatine li dar xistin, liqayî hevokên wiha dibe. “Ez bi xwe jî musulmantîyê mîna tendenseke demokratîk nanîrxînim. Gava Şêxo dibêje, Em li her perçeyî li ser navê musulmantîyê tîr qatîl kirin, ez pê re me. Lê tev vê ji ne musulmantî û ne jî tu bawerîyên din, bi zorê ji ortê ranabin.” 1. Ma qey ku meriv xwedîyê helwesteke wiha bi vî rengî be, dikare mîna Çerîşeskî bighê mirada xwe ya bîngêhî ? Biya min NA ! Ji ber ku emê ji alîkî ve musulmantîyê mîna tendenseke ne demokratîk binîrxînin, ji alîyê din ve jî emê pesend (qabûl) bikin ku hêzên musulman - yê ji hev cuda lê xwedî eynî amanc - ji destpêka musulmantîyê heta roja me , me qirr dîkin, dîsa jî emê li ser navê “toleransê” rê bidin musulmantîyê. Lewra tê gotin; “Min berê ji gotibû, li civatê wek her lênerînê, haqê musulmanan jî heye ku xwe organize bikin û li gor bawerîyên xwe bixebitin. Divê ev îmkân ji bo wan jî bê nas kirin. Lê divê ew jî li hember ên ji derveyî xwe , bi tolerans bin.” 2 . Bi rastî jî gava ku mirov vê yekê dibihîze, meriv gelekî meraq dike, bê musulman li kujan dewrê, li ku derê, bûne xwedî tolerans li pêşberî hêzên ji derveyî xwe di serpêhatina dem û dewranan de. Gelo li serdema Xalid binî Welid an li serdema melayên «ranê» ku Kurdistan wêran û kambax kirin - musulmantî xwedî tolerans bû li pêşberî mirovantîyê !!!

Bêguman hewcedarîya me bi demokrasîyê heye. Ji bo bicihkirina normên demokrasî yê serekî di jiyana civakî de çi ji destê meriv bê divê meriv bike. Lê ji alîyê din ve jî divê bê zanîn ku tendensên ne demokratîk - bi çi rengî dibin bile bibin - divê rê li ber wan bê girtin da ku demokrasî bi gemara wan newê lewitandin. Çimkî ew bi xwezaya demokrasîyê re naguncin. Bê çawa merivê textor absên bi zerar ji laşê merivê nexweş derdixe da ku merivê nexweş sipî sax bike, her wiha divê rê li ber tendensên ne demokratîk bê girtin da ku laşê demokrasîyê ji bi êş û elem nebe. Ger meriv ne xwedîyê helwesteke wiha bê, dê naveroka demokrasî û toleransê bê pûç kirin. Ji xwe ne hewce ye ku mirov bi tiştê pûç bilebibe.

Lê birastî jî gava ku meriv romana bi navê “Pêlên Bêrikirinê” dixwîne, meriv dibîne bê niviskarê wê bi çi zîmanekî xweş li dorbera jiyana xwe ya sergomê li gel hemû dijwarîyên wê bi peyvên hîlbijartî û hevokên ku bi xwe-

zaya zimanê kurdî diguncin, rapêçaye. Bi alîkarîya vê rapêçandinê nexweşî û alozîyên jiyana sergomê bi gelek alî tên dest nîşan kirin. Jiyana sergomê hingî wilqasî diware asoya merivî tê teng kirin. Lewra "Te ew jî perîşan kir û te xwe jî.... Tu divê qey xwezayê xwe civandî ye ser hevdu û divê tahtê de bi cih bûye. Xwedê jê razî, hela li dora xwe binehêre, bê ka xweza çi qas rengîn, çi qas fireh û çi qas dewlemend e! Te hema çavên xwe bera vê tahtê dane."3 Ma gelo çima li serê merivî weha tê? Ji ber ku meriv ji alîkî ve ji jiyana dorbera ku meriv lê mezin bûye, qut dibe, ji vê yekê wîrdetir, meriv ji dost û hevalên xwe dûr dikeve, ji alîyê din ve jî berê meriv dikeve nava taraistaneke nenas ku bi hemu alîyên xwe bi merivî xerîb tê.

Ev yeka ha bi serê xwe bêzartîyê bi xwe re diafirîne. Mîna ku meriv jî nû ve ji dayika xwe re dibe. Lê ne di himbêza wê de, li warekî dûr ku bi hemû alîyê xwe ji yê berê cuda ye. Ji xwe ev cudabûn jî dibe hoyê sergêjekên tevlihev yên bi gelek alî di jiyana rojane de. Ji ber ku "Bi ser heqê min de, dinîti jî bi dû min biketa, min ê li bavê xwe zêda bikira. De tu bala xwe bidê, bê ji kî derê heta kî derê.... Kê em li vê tahtê rast kirin? Kê em anîn li vê tahtê asê kirin?" 4 Çiroka "ku bê kê em li vê tahtê asê kirin" bi serê xwe pîrsgirêkeke herî aloz e. Lê disa jî, gava ku min hevoka "ezê nexapim. Bila ev ji te re ahd be!"5 xwend, nivîsa Çernîşevskî ya bi navê "di rendewûyê de merivê Rus" hate bira min. Weke ku tê zanîn, di vê nivîsandina xwe de Çernîşevskî li ser romana Turgenev ya bi navê "Asîya" mijul dibe û bi awireke şoreşgerî lehengê wê Mirza N. analiz dike. Bela ku mirza N. li hemberî evîndariya Asîya ya bi hêz bêmecal dimîne, Çernîşevskî ev bêmecalîya wî encama lewazbûna çîna ku wî nunertîya wê dikir, dinirxand. Ji ber ku hinganê aristokratiya Rus ber bi dawîya xwe ve diçû.

Her çiqas Mirza Nyên "me" ne hindik bin jî, astengên di warê hemû jiyanê de li pêşberî me bêsînor bin jî, lehengê me zora lewazbûn û bêmecaltîyê dibe. Nêzikî serkevtinê dibe. Lewra ew ne ber bi dawîya xwe ve diçe, ji beravajî ew roj bi roj bi hêztir dibe. Vêca mirov kare bihesanî bibêje ku vegotina niviskariya bi awayê realist bi ser dikeve. Ji ber ku ji alîkî ve karakterên ku wî afirandine bi rewşa iro ya ku li sergomê zal e, diguncin, ji alîyê din ve ji bi awireke konkret ya dîrokî li pîrsgirêkê dinere.

Lê belê divê bê gotin, gava ku mirov bi awireke bi rêk û pêk romanê ji destpêkê heta dawîya wê dixwine, meriv dibîne ku roman di warê struktûrî de bi awayekî lewaz hatîye hunandin. Lewra di serpêhatina afirandina romanê de pevgirêdana bûyeran bi awayekî bi lez û bez hatîye pêk anîn. Hevşopandina bûyeran bi merevî normal nayê. Ji ber ku nivîskarî hingî di vegotina temayên ji hev cuda de lez kiriye, hevşopandina bûyeran bi merevî mîna qavaztinê tê. Ji xwe ev qavaztin dibe asteng ji bo rêgihiştina xwendina berhemê bi xwe.

ZIMANÊ KURDÎ JÎ WEK ZIMANÊN DIN YÊN INDO - EWRÛPÎ BI ÇANDINÎ VE HATÎYE !

A. WAHAB

Reha zimanê indo-ewrûpî ji Anatoliyê tê, û ev ziman berî 9000 salan li Anatoliyê hatiye peyivîn. Zimanên wek hettîtî, palatî û lûvî jî, ji şaxên vê zimanê kevn in ku nuha mirîne. Ev teorîya nuh ji aliyê professor Colin Renfrew ve di pirtûka wî ya bi navê Archaeology and Language de tê îdia kirin.

Mirovên ku vê zimanê qise dikirin cotkarên herî pêşî yê dunyayê bûne. Van hem pez û hem jî genim çandine. Hinek ji van berîya Îsa 6500 salî koçî Yewnanîstanê kirine, kultura xwe yê çandinî û pezên xwe jî bi xwe ra birine.

Teneyên herî ewelî jî, li Yewnanîstan angora arkeologan , ji van deman maye. Teorîyên berê dibêjin ku zimanê yewnanî ji bakur hatiye. Angora Colin Renfrew ziman bi çandinî ve ji Anatoliyê berbi Yewnanîstanê, ji wir jî berbi Ewrûpayê belav bûye.

Kultur bi rêya aşitî ve belav dibe

Dikare weha bibe ku malbat fireh dibin, êdî êdî erdên nuh diacon û bi vî awayî ziman û kultur jî bi wan re belav dibe. Gor teorîya Renfrew kultura çandinî di 25 salan de 18 km belav bûye. Inge Damm (pirtûka Renfrew xwendîye û makaleyek li kovara FAKTA'yê nivîsiye) ev belav bûn, bi hatina çandinî û heywan xwedîkirinê li başûrê Îskandînavîyayê (4000 sal berî Îsa) ve lihev dike û teorîya Renfrew rast derdixîne.

Angora vê teorîyê, rehê zimanê hîndîyê kevn sanskrit jî ji zimanê anatolîyê kevn tê. Ev tê vê manê ku zimanê kurdî hem ji farisî û hem jî ji sanskrît kevnîr e. Ji ber ku kurd hem ji farisan hem jî ji hîndîyan nêzîktirê anatolîyê ne û zimanê indoewrûpî ji ser erdê kurdan belayê Iran û Hîndîstanê bûye.

Civata çandinî ji nêçirvanîyê zûtir belav dibe

Sebebê ku civatên cotkar zutir belav dibin eve; di van civatan de serê 10 km 2 pîncî kes dikevin. Di civatên nêçirvanîyê de ev hejmara yek kes e. Ev jî sebebeke mezin e ku civatên gundî her erd divên ku bîacon û bi vê awayî belav dibin. Zimanê ku berîya Îsa 6500 salan hate Yewnanîstanê ji destpêkê ne indoewrûpî bû lê bere bi bere pêşta çû û bû zimanên ku nuha li ewrûpayê tê kise kirin.

Angora teorîya Renfrew zimanên ku li ewrûpayê hene û ne di famîlyaya zimanê indoewrûpî de ne (etrûî, baskî), dikare zimanên civatên masîvanan bin û wê demê tu peywendîyekî wan bi civatên cotkarî ve nebe.

Renfrew bi vê torîya xwe ve dîtînen berê ku dibêjin zimanên indoewrûpî ji stepên Rûsyayê belav bûye, serûbinê hev dike. Angora wî ji bo belavbûna ziman civatekî runîştî û eşîrî lazîm e. Nemaze ev forma civatê gundî û runîştî dikare di diroka însanetîyê de guherînen şoreşgerane pêk bîne.

Teorîyê nazîsta pûç dibe!


Ev teorîyê ku bi taybetî ji alîyê pisporên almanî ve dihat parastin û dura jî nazîstan bikar dianî digot ku " Zimanê indoewrûpî bi darê zorê ve ji alîyê arîyên por zer û çav şîn ve belav bûye" bi tîkçûna nazîstan ve ev teorîya jî kete qebra tarîxê. Lê ez bawer dikim hîn di nav kurdan de jî kesin hene ku vê teorîyê bi zanatî an jî bê zanatî diparêzin. Ku rehê zimanê kurdî jî wek rehên zimanên din yê ondoewrûpî zimanê anatolî yê kevn be divê hîn pirtûkên dîrokî yê kurdî jî carek din werin nivîsîn.

Pisporên kurd divê lêkolînen kûr çêkin

Dirokvanên û pisporên zimamnê kurdî divê lêkolînen kûr li ser vê teorîyê çêbikin. Heta nuha bi awakî profesyonel li ser van tiştina nehatîye rawestan. Ku teorîya Renfrew rast be, zimanê kurdî yek ji zimanên herî pêşî yê dunyayê ye. Idiakî wer divê bala her kurdek bi taybetî jî bala pisporên ziman û tarîxa kurdî bixşîne.

MÎTOLOJIYA KURDAN - 1

Zana FARQÎNÎ



Der barê koka Kurdan de em ji du tezan dikarin behs bikin. Tezek dibêje ku Kurd ji deverên din hatine li vê cografayê bi cih bûne û gelên xwecihî tevî hev bûne, di nav hev de heliyane. Teza din jî kurdan gelekî xwecihî dibîne, dibêje ku pêşiyên Kurdan Gûtî, Hûrî, Urartû, Mîtanî, Kasî, Subarî û Med in. Jixwe ku ev raman bê pejirandin, cih ji nîqaşan re namîne ku Kurd xwediyê şaristaniya Mezopotamyayê ne.

Gotin û tezên li ser kok û binyata Kurdan têvel in. Ne Kurd bi tenê, biyan bi xwe jî der barê koka Kurdan de xwedî gotin û ramanên ji hev cihê ne.

Li gorî hîn kesan Kurd ji deverên din hatine li welatê ku îro lê dijîn, bi cih bûne. Ew û gelên xwecihî tevî hev bûne, di nav hev de heliyane û di encamê de îro gelekî têkel û durehî (melez) çêbûye.

Nêrîn û ramana din jî ev e: Kurd ji tu deverî nehatine, dinya ava bûye nebûye ew li cihê xwe bûne. Yanê Kurd ji destpêkê ve nîştcehî û xwecihê Kurdistanê ne.

Ev raman û nêrîn bi hev re pev diçin, de ka êdî kî kê bi bin bixe.

Li beşê Bakûr bi taybetî Cemşîd Bender serkêşiya teza ku Kurd ji tu deverî nehatine, dike. Her wiha di vî warî de jî bi wêrekî ramanên xwe derdibe. Bi vê yekê jî dibe armanca tîrên rexneyan.

Bender, berhemeke din jî li ser Kurdan nivîsand û di dawiya 1996'an de da weşandin, îcar bi navê "Kürt Mîtolojisi - 1" (Mîtolojiya Kurdan - 1)

Cemşîd Bender, di pêşeka vê pirtûkê de dadixuyîne ku wê ev xebat ji sê cildan pêk were. Di vê cildê de Bender cih daye mîtosên serdema antîk ku bandora xwe li olên asîmanî (semawî) kirine. Bi taybetî jî mîtolojiya Hûriyan ku hîkarî û bandoreke gelekî mezin li ya Hîtîtiyan kiriye, her wiha efsane û mîtolojiyên peyrewên Hîriyan, Mîtanî, Kasît (Kaşî) û Ûrartûyan jî li gelên cîran gelek bandor kirine.

Nivîskar bi belge û çavkaniyan, li ser mîtolojiyên Hûriyan radiweste. Li gel vê yekê, ji encamên kolanên arkeolojîk ên van salên dawî jî sûdê werdigire. Wekî kolanên li navbera salên 1983 û 1991'ê.

Nemaze, bi kolanên arkeolojîk ên li Newala Çoriyê (li navbera Ruha û Semsatê), êşkere bû ku jêderka mirovahiye ya herî kevn Mezopotamyaya Jorîn e. (Li gorî agahî, belge û jêmayiyên heyî)

Zanyar dipêjirînin ku zayîna mîtolojiyê bi çandiniyê (zireetê) dest pê kiriye. Çandinî jî pêşî li Mezopotamyaya Jorîn pêk hatiye. Lewma dibêjin ku Hîtîtiyan ji Hûriyan evsane girtine û ji wan jî derbasî gelên Anatoliyayê û ji wan jî gihyaye Yewnana kevn.

Ji aliyê din, efsaneyên ku dikine malê Sumeriyan jî, jêderka wan devera Zagrosan tê pejirandin. Wekî efsaneyên Afirijî, Tofanê, Destana Gilgamêş. Ev gelê hanê (Sumer) ku wekî afirînerên

nivîsê tê zanîn, li gorî Bender ji Zagrosan daketiye beriyê.

Sedemê ku dibêjin, efsane bi çandiniyê re derketine holê jî ev e: Ziman û bawerî bi vê qonaxê re çêbûne. Alîgirê vê ramanê di cîhana zanistê de pir in.

Me di serî de, ji du tezan behs kir, her yek ji wan li gorî xwe Kurdan di dirokê de bi cih dike. Teza ku Kurdan gelê xwecihî dibîne, Gûtî, Hûrî, Ûrartû, Mîtanî, Kasît, Sûbarî û Medan jî wekî pêşiyên Kurdan nîşan dide. Her wiha van gelan jî, wekî peyrewê hev bi nav dike. Dide xuyan ku tev ji eynî gelî ne. Bes navê wan ji hev guhartî ye.

Ji xwe ku ev raman bibe serwer û bê pejirandin, cih ji nîqaş, guman û endîşeyan re namîne.

Em vê jî bibêjin ku, lêgerîner, arkeolog, dîrokzan û zanyar (bi piranî) têkiliyekê di navbera wan "gelan" de dibînin yên ku me li jorê navên wan dan. Gelş, li vir ev e: Ew pêşiyên Kurdan in an na?

Wekî encam em vê bibêjin, çawa ku berhemên Cemşîd Bender ên li ser dîrok, bawerî û şaristaniya Kurdan bûn mijar û dabaşên gengeşî û nîqaşan û gelek reaksiyon dîtin, ev berhem jî wisa xuya ye wê rastî helwesteke wisa bê.

Di vê qonaxa bi êş û jan de, di van waran de tiştên ji me re pêwîst in: Bêhnfirehî, hesasî, helwest û şewazeke (uslûbeke) zanyarane, pîvan û metodeke zanistî...

Azad ŞATEHÎ nûha di Stenbolê de rojnamevanî dike. Ew berê di rojnameya **Medya Guneşî** de xebitîbû. Paşê bû yek ji berpirsiyarên rojnameya **ROJê**. Nûha di rojnameya **NÛROJê** de rojnamevanî dike. Gelek nivîsên wî yên xwerû bi zimanê Kurdî di van rojnameyên ku li jor me bi nav kir de derketin.

Wî nûha giraniya xwe daye werger û nivîsandina xwerû bi zimanê Kurdî.

Ev nivîsa wî ya bi navê “**Rexne û Xwerexnekirin**” di rojnameya **ROJê** hejmara 19an de derket, lê ji ber ku ew hejmara rojnameyê hate qedexekirin û civandinê û ji bo ku ew nivîs li gor naveroka kovara **Helwestê** bû, loma jî me vê nivîsê ji nûve di kovara **Helwestê** de weşand. Em li benda nivîsên wî yên din in. ❧

REXNE Û XWEREXNEKIRIN

Azad ŞATEHÎ

Bi gotikeke klasîk rexne û xwerexnekirin “çeka herî mezin a şoreşgeran e”. Ev gotin di destpêka geşbûna tevgera rizgarîxwaz a li Bakurê Kurdistanê de, ji heft salî heta heftê saliyan bûbû benîştê devê herkesî. Lê ez bawerim ji wê rojê heta îro jî, wek gelek tiştên din kêmkirî di wateya vê biwêjê jî gihîştîye.

Ji ber vê yekê divê mirov li ser wateya wê baş bisekine û bi hûrbilî bifikire. Helbet ev çek girîng e, lê ne tenê ji bo şoreşgeran. Ev çek, ji bo her kesekî demokrat û pêşverû jî dibê girîng be. Tehemula rexne û xwerexnekirinê jî dibê pîvana demokratbûnê be û wek bingeha demokrasiyê bê dîtîn. Ango, rexne mercek ji mercên demokrasiyê yê bingeşê e ku, nebe nabe.

Lê çawa; divê em livir maneya vê biwêjê hinekî din vekin. Rexne, nîrxandina mijarekê, bûyerêkê an jî kesekî, grûbekê û hwd. e. Hêrsandina ango nîrxandina bûyer û tiştan divê ne yek alî be. Divê bûyer, tişt an kes; bi xêr û gunehên xwe, bi qencî û xerabiyên xwe, bi çewtî û rastiyên xwe ve bê hêrsandina. ❧

Bi qendî girîngî ya rexne û xwerexnekirinê zimanê wê jî pir girîng e. Ji ber ku divê mebesta rexnê ne qelskirin, rûreşkirin an jî pîskirina bûyer, kes û babetê be. wek pêşiyên me gotine: “Bi peyva xweş mar ji qulê derdikeve. Îcar ji bo ku rexne avakerbe û ciyê xwe bigre divê zimanê wê jî hêmin û nerm be, ango ne tûj, tahl û êrişker be.

Dema meriv rexne li tişteki an kesekî bigre, li gel kêmasiyan divê meriv qencî û başiyên tişt an kesî jî derxe holê. Belê divê meriv bêtir balê bikişîne ser kêmasiyan û wan derxe pêş da ku meriv li wan haydar bibe û wan ji holê rake.

Pîştî vê şîrovekirina bi giştî dema meriv bê ser rewşa civata Kurd, zela û rohnîyê ku civata me ji ber rewşa welatê me ya taybetî û ya coxrafya me ji hev belavbûye. Têkiliyên bazar û şaristaniyetê ango bajarvaniyê ji bo civata me nû ne.

Ji ber wê jî tehemula me ji hevdû re tûne ye. Dema yek rexnekî li yê din digre, tu dibêjî qey qiyamet radibe, dibin neyarê hev. Lê, divê em jibîr nekin di jiyana bi komel de azadî di her warî de bi sînor e. Îja divê em jî fêrbibin ku, ji ciyê azadiya bi dawî tê ya hevalê me destpêdike. Ev pêvajoyek nû ye, em jî dê têbighin ku azadî ne beredayîtî ye. Bi qenda maf û azadiya xwe divê em ya hevalê xwe jî biparêzin.

NÛRQJ

Rojnameya Nûçeyî û Şîroveyî

Bixwînin! - Bibin Abone!

RÊWÎTIYEK Û RASTIYEK

Lokman POLAT

Senar ji bo karekî xwe çû welatekî Ewropa rojhilat. Di paytextê wî welatî de gelek hemwelatîyê xwe û gelek kesên ji navçeya xwe dît. Wî ji wan henîkan nas kir, hinekên din bi ser navê malbata wan nas kir. Ji wan mirovan hinek jê di wê bajarî de ji xwe re qehwexane û dikan vekiribûn, dixebitîyan. Gelekên din jî hatibûn ku ji wê biçin welatekî Ewropayê ya rojava, lê nikaribûn biçin, perên wan qedîyabûn, an jî hatibûn dizîkirin û di vê bajarê de perîşan bûbûn, şerpeze bûbûn.

Senar di navbera du-sê rojan de derxist ku di vî welatî de çiqas dizîtî û bêaxlaqî heye. Goya ev welat berê welatêkî sosyalîst bû, lê qîmet û rûmeta jinan qet tûnebû. Qîmeta jinan ketibû pênc pereyî. Bi pirranî, gelek jinên wan xwe ji bo dirafên bîyanî (Mark û Dolar) difrotin. Mirovên kalepîr Mark û Dolar didan û bi keçên ciwan re radizan. Di nav civakê de bêaxlaqîyek gelek zêde hebû. Dîn û îmana wan, bîr û bawerîyên wan bûbûn Mark û Dolar. Dizîtî pirr hebû, şelihandin gelek bû. Di nav civakê de zept û rept tûnebû. Rîşwetê serê xwe helanibû. Bi rîşwetê hemû tişt dihatin çekirin. Karekî piçûk hetanî karên mezin bi rîşwetê hel dibûn. Li gor bîr û ramanên sosyalîstî civak perwerde nebûbûn. Li ser navê sosyalîzmê hezar tewir tiştên xirab hatibûn kirin. Sazûmanekî rasteqîn ya sosyalîst nehatibûn avakirin. Yên ku bi navê sosyalîstîyê li ser hikûm bûn û bi salan hikûmranîya xwe ajotibûn li gor xwe sazûmanekî çewto - mewto saz kiribûn. Têkilîyê vê sazûmanê û ya sosyalîzma zanîstî bi hev û du re tunebûn.

Senar di qehwê de runiştibû û li ser vê cîvaka ucube ku bi ser navê cîvaka sosyalîst hatibû holê, difikirîya. Ew di vê bîr û ramana kûr de bû, nasekî wî hat, bi tesadufî wî di hundirê qehwê de dît. Ew hat cem, çûn rûyê hev. Pîrsa hev kirin. Ew nasê wî ji navçeya wî bû. Wan bi hev re virde, wêde xeber dan, paşê nasê wî got:

—«Li vir welatekî berbat e. Hemû dizin. Pere û eşyayê min dizî kirin.»

Senar hetanî êvarê di wê qehwê de runişt, yên ku dihatin qala dizîyê, xapandinê û hesûdîyê dikirin. Di vê welatî de gelek mirovên xerîb — pîrranîya wan jî Kurd û Tirk bûn — perîşan bûbûn, gelek bûyerên nexweş hatibû serê wan.

Senar her bûyera ku pê dihesîyan, ji xwe re şaş û ecêp diman. Gelek Kurd û Tirk jî vê xwî û exlaqê wan yên pîs ji xwe re girtibûn û wan jî dest bi dizîyê û enwayê tewir pîsîtiyê kiribû. Van Kurd û Tirkên bêaxlaq dest pê kiribûn dizîya hev û du dikirin. Hemû jî fêrê direwan bûbûn, hevûdu dixapandin. Kesêk bi kesêkî din bawer nedikirin. Kî lingê kî tehesand. Du Kurd di malêk de li cem hevdu radiketin, yekê pere û eşyayê yên din didizîya. Rezîlatî û dizîti her diçû zêde dibû. Li cem wan şexsiyet nemabû.

Senar li ser van tiştan gelek difikirîya. Ev bûbû sê(3) welatê Ewropa ya rojhilat dîtibû, yek ji yên din xirabtirbû. Teorîya sosyalîzmê û pratîka ku bi ser navê sosyalîzmê di van welatan de hatibû bi karanîna qet hev û du nedigirtin û zidê hev bûn. Senar bixwe bûbû bîst sal ku mirovekî sosyalîst bû. Wî hêj jî sosyalîzma zanîstî, Marksîzmê diparastin. Gelek nas, dost û hevalên wî yên rêxistinî dev ji sosyalîzmê berdabûn, wan hendî bawerîya xwe bi sosyalîzmê nedanîyan, lê Senar hertim bîr û bawerî bi sosyalîzmê danîyan. Lê ev bîr û bawerîya wî ya bi sosyalîzmê ne wek ya berê bû. Berê, di demên çûyî de wî jî bi sosyalîzma reel a ku di Sovyetê û di welatên Ewropa rojhilat de hatibû bi karanîna, bîr û bawerî hanîbû, û ew rêxistina Kurd a ku Senar endamê wê bû, bi salan şablonçîtiya sosyalîzma reel a bi mejîyên Stalînîst dikirin. Lê piştê guherandinê di van welatan de, Senar jî wek gelek sosyalîstên din bi çavekî rexnegirî şîrovekirina sosyalîzma reel a çûyî kir, û wî dev ji bîr û ramanên Stalînîstiyê berda. Ew, li dijî Marksîstiya dogmatîk derket, li ser dogmatîkîyê lêkolîn çekir û bi navê “Marksîzm û Dogmatîzm” pirtûkê nivîsand. Wî di pirtûka xwe de li ser pîrs û pîrsgirikên sosyalîzmê gelek şîrove çekir, dijîtiya dogmatîzmê a bi Marksîzmê re, bi zimanekî hêsan û bi metodekî zanîstî raxist holê.

Senar ji sosyalîzma reel a çûyî ku têk çûbû û li welatê Ewropa rojhilat û li Sovyetê helweşiyabû, gelek dersên giranbiha derxistibû. Li gor wî sedemê têkçûn û hilweşandina sosyalîzma reel gelek pîr bûn.

Bi ser navê sosyalîzmê, dîktatorîya burokratîk a partîyê li ser cîvakê zilm û tehdâ dikir in. Bi zordariyê, bi çova zorê cîvakê dabûn tirsandin. Tîrs û xofa asker û polîsan ketibû zikê gelên wan welatan. Di nav cîvakê de, dayîn û

sendinên germ, têkilîyên dostanî û hevkarî tunebû. Heval bi hevalê xwe, cîran bi cîranê xwe bawer nedikir. Sîxûrên dewletê, ajanên bêwijdan giliya gelek mirovên bê guneh dikirin, wan didan girtinê û ew bi salan di zindanê de diman. Gelek ji wan jî di bin şkenan de dikûştin. Mirovên zana digirtin davêtin tîmarxana dînan. Gelek jiwan derzî liwan dixistin û ew dikuştin. Kesek newêrabû mixalefetî bike. Demokrasî tunebû. Di nav cîvakê de metodên demokratîk bi kar nedanîyan. Pîrr partî û pîrr dengî tunebû. Yek dengî hebû. Di helbijartinan de, xelkê bi tirsan rayên xwe ji namzetên partîya burokratîk a dîktatorî re davêtin. Di kongrên partîyan de helbijartin bi yek lîstêk û bi yek dengî dibûn. Yên ku ji wê lîstê re bigotana na tunebû. Bi ser navê dewletbûnîyê—dîtîna hemû tişt malê dewletê ye—gundîyan, esnafan, zenetkaran şelihandin, hetanî pez, ker, dewar û mirîşkên wan jî ji wan sendin û kîrin malê dewletê. Di nav cîvakê de dubendîyên mezin çekirin. Burokrat û teknokratên partîyê yên hendikayî li ser pîrranîyê, li ser hemû cîvakê hikûm kîrin. Ev burokratên partîyê her diçû dewlemend dibûn, cîvak, gelên reben, feqîr û perîşan dibûn. Di nav gelên van welatan de mejîyekî azad, şexsîyetîya bi rûmetî tunebû. Dîktatorîya partîyê li ser esasên tîrs û xofê gel perwerde dikirin. Li gor vê perwerdekîrîne; divê gel tim serê xwe ji partîya dîktatorî re xwar bikirana, dengê xwe nekirana û ji hemû kîrinên pîs û gemar re “erê” bigotana. Ev mejîyê dîktatorîya burokratî ya partîyê, cîvakê xistibûn vê halê xirab.

Burokratên partîyê, teknokrat û hemû karbidestên dewleta burokratîk bûbûn tebeqeyêk bilind û li ser cîvakê hikûm dikirin. Wan dikanên mezin ava kiribûn û di wan dikanan de hemû tişt hebûn, lê yên ku ji wan dikanan tişt, eşya bisendana divê bi Mark û Dolaran alvêr bikirana. Mark û Dolarên gel tunebû, lê yên burokratan hebû. Burokratan çî bixwestana dikaribûn ji wan dikanan bîkin, bistînin. Lê, gelê feqîr nikaribûn ji wê dikanên mezin—Super Market—tiştêk bistînin. Ji bo standina çay, qehwe û şekir, gel li pêş dikanan rêz dibûn bi saetan disekîniyan ku hetanî dora wan batana. Erebe û Texsî yên baş û rind bi Mark û Dolar dihatin firotin. Gel nikaribû wan jî bistîne. Xelkê, teksîyên tewşo-mewşo, yên xirab disendin.

Ji van û gelek sedemên din di nav gel de bêaxlaqî, û bêbawerî çêbûbû. Jin û keçên wan yên ciwan ji bo Mark û Dolaran laşê xwe difrotin, bi turîstan re radizan. Jin û mêrên wan tiştên xerîban-bîyanîyan- û yên hevdû dizî dikirin. Di nav cîvakê de li hember sosyalîzmê bêbawerîyeke mezin û gelek xurt çêbûbû. Cîvak ketibû wisan rewşêk ku ji navê sosyalîzmê jî nefret dikirin. Di çavê cîvakê de sazûmana sosyalîzmê, dîktatorîya Stalîn, Enwer Xoce, Çavuşesco û yd. bû û ev jî tiştêkî xirab bû. Wan Marksîzmê û sosyalîzma zanîstî fam nekiribû. Sazûmana burokratîk bi zanîstî Marksîzmê bi wan nedabûn famkîrîne. Bi

ser navê sosyalîzmê tiştên ku di pratîkê de bi kar anîbûn, tiştên ecêpmayî û dûrê eqil bûn. Lê wan li gel tiştên xirab gelek tiştên baş jî kiribûn.

Di jîyana cîvakan de çar tiştên esasî hene ku kapîtalîzmê hel nekirîye, van pirsan çareser nekirîye. Ev çar tiştên esasî ev in: 1- Pîrsa Xanîyan, 2-Pîrsa Kar, 3- Pîrsa Perwerdekirinê, 4- Pîrsa Sîhatê(Nexweşîyê)

Ev her çar pîrs jî di jîyana cîvakan de gelek muhîmin, girîngin. Welatên rojava Ewropayê û Amerîkayê hêj jî van her çar pirsan çareser nekirine. Di Amerîkayê de bi milyonan kes, mirov di kuçan de, di binê piran de radize. Yên bêxanî gelekin. Welatên Rojhilata Ewropayê di wexta xwe de van pirsan li gor xwe çareser kirine. Lê çawan?

Helbet hemû tiştên ku di welatên rojhilatê Ewropayê de hatine kirin, ne xirabin. Henîk destxistinên gelek baş jî hene. Gelek tiştên wan jî welatên rojava baştirbû. Lê pîrrê tiştên wan jî, jî wan xirabtir bû.

Welatên sosyalîst yê ber -Sovyet jî di nav de - aletên teknolojîk nexistin nav jîyana cîvakê a rojane. Di hêla teknolojîyê de Sovyet pêşte çûbû, cara yekem wan çûn ser hîvê danî. Lê, di dikan û aşxanên wan de, hesabên xwarin û vexwarinê bi destan dihat hesabkirin. Makînen wan yê hesabê jî alî cîvakê ve, jî alî esnafan ve bi kar nedanîyan. Gel kar dikirin perê wan jî hebû lê tiştên ku bikirê tûnebû. Mal tûnebû. Li devê dikanan rêzên dirêj çêdibû. Pêkenînêk yê Romanîyan heye, dibêjin: Romanek li devê derîyê kîjan dikanê rêzgirtinê gava bibînê, ew jî diçe dikeve wê rêzê. Ew nizanibe di wê dikanê de çi tê firotin jî, dîsa dikeve rêzê, lewra ew difikirê û dibêjê di dikan de çi jî bê firotin ji bo malê pêwîst e.

Di Romanyayê de ji bo rewşa aborî, serkirdayetiya partîya komunîst - ku wê bi xwe hikûmatê saz kiribû - qayîşê cîvakê jidandibû, hişk kiribû. Pişevan saet dibû deh(10) elektrîk dihatin birandin, hemû der tarî dibû. Radyo û TV. tenêk çend saetan weşan dikirin. Eylence, kêyfxweşî tûnebû. Keç û Xort nikaribûn bi dilê xwe keyf û zewq bikin. Di nav cîvakê de kultura dizîtiyê belav bûbû. Karkerên fabrîkan ji fabrîkê tiştan dizî dikirin û paşê bi hevdû re digehûrandin.

Keda karkeran do jî û îro jî erzan bû. Hêj jî li Romanyayê meha-Hîva- meaşê karkerek sed hezar Lêî ye, ku ew jî dike sed Mark, an çar sed Kronê Swêdî. Meaşê Jinan jî yê mîran kêmtir e, hendiktir e. Di nav endamên partîya komunîst û yê ne endam de ferqîyek mezin hebûwe. Hemû endamên partîya komunîst -ku li gor hejmara cîvakê hendikayî bûne - xwedanê peran û xaniyên Vîla bûne. Jiyana endaman û yê hemwelatîyên wan yê ne endam ne wek hev bûne. Di nav cîvakê de li dij endamên partîyên burokratîk yê li ser hikûm kîn û nefret çêbûwe.

Wextra ku xelkê fêkî, zebze û meywe dixwestin - ku li dikanan tunebûn - bistînin, hikûmata burokrat ji gel re van tiştên xwarin û vexwarinê temîn nedikirin. Wan koşk û sarayan çêdikirin. Peran liwê mesref dikirin. Li Bukareşê Sarayêk Çavuşesço heye, ne karê aqilane. Wisan xweşe tarîfa wê nayê kirin. Di her çar alîyan de, mirov li kîjan alî jî mîzeka wek xwe ye, hemû alîyê wê wek hev in. Asker, karker, gundî, xwendevan, jin, mîr, yên ciwan, yên kalepîr hemû cîvak wek kolan di avakirina wê qesrê-Sarayê-Koşkê- de xebitîne, kar kirine û ew koşk di şeş(6) mehan de hatîye çêkirin. Gava min koşk dît, min ji hevalê cem xwe re got: Vana hetanî ewqas mesref li vê koşkê kirinê, bila bi vê pereyî ji gelê xwe re tiştên xwarin û vexwarinê bisendana. Bila Mûz û pantorên qot bisendana. Bila ewil zikê gelê xwe têr bikirana hêj du re, paşê koşk û saray çêbikirana.

Hemû dîktatorên dinê dirûbê wan bi hevdû dikeve. Ew ji rismên(Wêne) xwe gelek hez dîkin ku lomajî rismên xwe hêj di ganîtiya xwe de li her derê dieliqînin. Li Romanyayê rismê Çavuşesço li her derî hebû we, hetanî li ser şûşa araqê ya Votka yê jî risma(wêneya) Çavuşesço heye. Van diktatoran şexsiyeta xwe kirine wek tabû. Hetanî nemirine kesek li dijî wan neaxîfîyaye, kesêk liwan rexne negirtîye. Wan her tim li cîvakê rexne girtine. Tenê ew bê xeta, pîr û pak bûne. Xeynê wan hemûyan xeta û şaşî kirine, tenê wan xeta nekirîye.

Senar dût û kûr li ser van tiştan difikirîyan û ji xwe re şîrove dikirin. Ew dawî gihîşt vê encamê ku Marksîzm baş nehatibûn fêm kirin, Sosyalîzm gelek bi xeletî hatibû bi karanînê. Ji bo vê jî divê mirov bîr û bawerîya xwe ya bi Marksîzmê û Sosyalîzma zanîstîyê -Bilimsel Sosyalizm, Sosyalîzma îlmî- berde-wam bike, bawerîya xwe neşkinê. Xwe nûh bike. Mejiyê xwe bigehûrinê, dev ji dîtînen berê yên çewt -ku bi ser navê sosyalîzmê dihatin parastin- berda. Li gor rewşa welat û mercên cîvakî, li ser hîm û esasên Marksîzmê, sosyalîzmeke nûjen û zanyarî, bi dîtîna û ramanên modern biparêze.

Senar roj li wê welatê Ewropa rojhilat de ma. Wî gelek tişt bihîst û dît. Gelek mirovan bi baş û xirabîyên wan ve nas kir. Psîkolojiya însanan(mirovan) hîn pirr tir fam kir.

Lokman POLAT
Bukareş - Romaniya
îlon / 1994

Têbînî - Min vê nivîsê di sala 1994an de li Romaniya'yê nivîsîbû. Ji ber sedemên teknîkî min hetanî niha nivîsê li tu cihekî neweşandibû. Ev cara yekem e ku nivîs di vê hejmara Helwestê de tê weşandin.

DI HUNERA KURDAN DE CIHÊ XÊZIKAN

Adil DURAN

Ma, Xêzik çi ye ? Çava tê afirandinê û ji bo çi...?

Xêzik di hemû Dinê de wek bi navê (karikatür-cartoon-caricatures) tê bi navkirin. Bi xêzîkin asanî û safî estetîze kirina bûyerek ango tiştêk bi ramanîyek Xurt û bi teşe tê afirandinê. Ev, sereta bi berketin, rexne girî û bi pêkenin û bi mêldan a rastiyê dilinibûneke.. Carina jî bi pêkenîn rexne digirî û Vêne ye ke nepixandîye.

By kurtî afirandinên xêzîkan di jîyana civakî de di gel danustandina hunerî bi têkiliyên dema hilberînê ve têne tesbît kirin. Xêzikvanên civakê wêk kevneperest û pêşverû bi du baskan jî hev cuda dibin û dikevin nava geşbûnîyek dubare. Ew di dîrokê de wek qanûna gesbûnî yê ne wek hevî têbinavkirin.

Mesela; di qirnê navînde zanistî xwedê bû ! Hûnerê jî berê xwe da bu xwedê. Dema me ,vê dema civakên çînî de hûner û ramanî di hundurî hevde ne. Û hûner jî bo çînekî bû ye haceteke axaftinê. Ji ber ku xêzik wêk gulîyên hunerê yên din ew jî pergalên berkêşanê ye. Û ev bikeve destê kîjan çînî jî bo meslehatê vî çînî bi kar bê anîn. Rewşekî awerte jî heye, ew jî bo teybetî tû seretan nasnake, nabe malê yek çînî û bi tenê jî bo berjevendîya çînekî jî nîn e.. Mesela kubîzîzm (Rêgeheke jî bo vênêçêkirinê ye, afirandin-karê xwe Pîcasso ye.) Bi vênê ya " Kevoka Aşîtî " yê di hemû dinê de bi nav

û denge. Û di dema ronesans de pitnasek wek Leonarda de Vincî bi vêne ya " Mona Lîsa " û pê nûsa şoreşa Russî yê herî mezin M. Gorkî bi berhemên xwe yî nemir û Kevirvekolanvanê Fransî Rodîn bi heykel ê " Mîrovêke Ramankar " dinê de bi nav û dengîn. Lê ew berhamên nemir ne bi tenê ji bo civakekî ne û ne ji ya çînekîne. Ew bûne malê hemî mirovatî yê...

Lêwra em dikarin wek mînakek li ser berhemên M. Gorkî rawestînin. Bellê M. Gorkî şoreşgerek e. Bi Çîna karkeran giran buha yî ya wî derketîye holê. Ji ber vî qasî jî meseleyên mîrovan dikarî bike nav berhemên xwe. Ji bo wî hemû malzeme, Ji bo gihîştina mîrovan dibe hacetek. Îro bi tenê berhemên M. Gorkî karker naxwînin hema hema herkes dixwînin û iro ew di textê mêjû yê xwendevanên dinê de runiştîye.

Ew di nav xeyal û zanyarî yê de bi bandurek beranberî hev û bi têkîlîya dîalektîka hunerê û daxwaza mîrovan ya hezkirinê derdîkeve holê şiklê axaftin û têgihîştîneke tevliheve . Formîlê wî ew e, mêjû. Têgihîştîna û zanyarî, bi van hersisê xalan bûyeran ferisîne û ji kefgîrê ve derbazdike û digihe rastî yê. Ew rastî zanyarî ye. Ji ber bu huner zanyarî ye. Zanyarî hûnerê hilberîn î... û hûner zanyarî yê kuta dike û nûve dibe. Bi kuta kirina hemu heyîyên zanyarî, hûner pêvajoya Tekamul î derbaz dibe û dest bi pêvajoya şoreşgerî dike rê ya ramankirinê heye, ew rê ya afirandinê û zayî nê bi sereta ya xwerû ye. Ew,evin:

- a) Çerxbuna guran, Ji bo wesif (Nicelin nitele dîroka)
- b) Caw û caw kirin (Reddîna reddî)
- c) Yekîtiya ziddan ew bîgehên dîalektîkê ne.

Xêzikvan jî ronakbîreke. Divê xêzikvan ne tenê bi raman, bi çalakî yê hûnerî bê hêja kirin. Ber ku mîrovêke bê çalakî bê ehleqe.. û wek kevire... Karê xêzikan di tevgera netewî de wek xwê û îsotê xwedî cîhekî xwerû ye. Û hacetek ji hecet ê têkoşîna netewî û civakî ye. Bi du maneyan kar tê, yek xebata axaftin û nivîsandîna ve girêdeyî ye, yê din jî huner a xêzikan e. Û bi giranî xêzikan ve girêdeyî ye.

- a) Xêzikên bi ramanî ya Sîyasî
- b) Xêzikên bê ramanîya Sîyasî
- c) negs
- d) Xêzyên bantê (film)
- e) Xêzyên portre

Di nav kovar û rojnameyên Kurdî de karê xêzikvanî kareke hêsanî ye. Bê qedr û qimete û sivik tê girtinê. Ji ber ku rexne girtin û rexne li xwe girtin bi riyek demokratîk hê venebûye û tahamûl jî, jê nayê kirinê. Tenê ji bo pesndanê hinek rêxistin di kovarên xwe de xêzikên bi ramanîya sîyasî û bi Jêrenotên nivîsandî diweşînin, ew jî xetereke mezine. Ji ber ku karê xêzikvanî, bi xêzikan e. Dema kû xêzikvanek xêzikek çêbike û di binde jî ramanîya xwe binivîsîne ew tê vê man ê ta ku ew bi vekîrî dibêje min ne karîya hunera xwe bi xêzikan karbînim û bidim fahmkirinê, ji ber kêmasiya xwe bi nivîsandinê dide fahmkirinê, ango min bi xêzikan nekarîya û bi nivîsandinê dîdim fahmkirinê... û ew ne karê xêzikvanî yê ye.

Îro, Sedemê şundemayîna xêzikan ne tenê ew e. Ew kêmasî ji mêjve heya îro bela yeke mezin e xwe li me pêça ye. Û em nikarin pêşîra xwe Ji wê xilas-kin. Ji ber ku welatên, dagirker, ku kurdîstan di nav xwe de parve kirine, ew hemû mislimanin. Li gor hikmê mislimanîyê jî çêkirina vîne û xêzikan qedexe ye!

Her xebatek li serzêde kirineke û her serzêde bûyîn fêde ye ke mezin e. mix-abin netewe yê Kurd bi zorî hatiye nefîkirin. Li ser axa xwe koçer bûn îro rewaçêde ye. Jîyana wan a civakî hê wek berê eşîrî ye. Ma, huner û çand a mileteke eşîr û koçer çi ye? He ye an tune ye? Lê xêzikvanî ya Kurdan çi ye? Behskirina xêzikvanî jî rast e an ne raste? Ew hemu pirsgrêk in.

Bersîvên wan bi zanyarî heye lê, warî çalakî de ne mumkûne. Ji ber kû karê xêzikan girîng ne hatiye girtin. Çend xêzikvan hene ew jî bi tilîyan tîne hejmartin û berhemên wan hêja nayên dîtîn.

Xebata xêzikvanên Kurd îro bê pere (dirav) ye. Bê qîmet e. Û yên ku wî karî dîkin mafê wan nayê dayîn û ew wek sinc li ber çavên sîyaset vananin. Demê ku bi xêzikên xwe dilê hinekan xweş bikin dê ev karê xwe bê pere dombikin dema kû karê xwe li gor adet û sereta yên dinê rast e rast êrîşî put û latan, derewan, durûtîyan û xirabîyan bikin. Dinya li wan teng dibe. Dîsa jî ez li ser Xalê dawî yê rawestim. Li gor dîtîna û bawerîya min ew hebun bi zayinek e xemxware û va êş û xemxwarî bila derkeve ronahiye...

Her wisan nebe pêşketin nabe. Divê îro pê ve zarokên Kurd dest bi çêkirina xêzikan bikin. Ji ber ku çirokên me Kurdan gelek in. Û di nav çanda meda tîrî xwe hacet hene ji bo xêzikan.

RAMANÊN BELÎNSKÎ YÊN DI DERBARÊ EDEBIYATÊ DE(*)

— 2 —

George PLEKHANOV
Wergêr : N. ZAXÛRANÎ

Li gorî Belînskî, Puşkîn mensubê ekoleke huner e ku temenê wê li Ewropa hatiye dagirtin û li Rusyayê jî karîna (îmkana) ku berhemeke mezin bide, nîn e. Dîrokê Puşkîn li pey xwe hiştiye, berhemên wî li himberî pîrsgirêkên serdema me yên bi jar / elem û endîşe ji rojeva îroyîn derxistine. Hukmekî weha bi vî rengî ji bo alîgirên huner ji bo huner, heta bi mîrza Volînskî jî (ew jî di nav de) bi hêrs kir û aniha jî hê hêrs dike. Ew, naveroka di şîrên Puşkîn de ku hê jî bala xwendevanên Rus dikişînin bê westan dubare dikin. Lê, alîgirên huner ji bo huner delaleteke ji vê mezintir ya Belînskî nedîtîn, weha delaleteke mezin bû ku ramanên jorîn li ba wê bi temamî bê guneh dimînin. Belînskî Puşkîn mîna şaîrekî xanedaniyê didît. Belînskî dibê "Puşkîn civata Rus di Onyegîn, Lenskî û di Faryan de ku di konaxa bûyîn û geşbûnê de bû teswîr kiriye, him jî bi rastiyeke çawa, bi hîsa hunerane! Em behsa menzumên wî yên di berhemên wîde û tablo, portre û siluetên wî yên mensubê sosyeta Rus ya bilind û navîn, em behsa taployên seyrangehan yên pesendkirinên fermî nakin! Bi giştî evana ji aliyê kîtleya -girseya- xwendevanên me ve baş tên zanîn û ji mêj ve ye ku bi awayekî maqûl tên nirxan-

din. .. Emê vê yekê bibêjin: Şexsiyeta şaîr di berhema wî ya manzûm de wilqasî bi temamî, wilqasî bi awayekî şewq dide nîşandan, li her cihê gelekî sipehî, gelekî bi beşer, lê di eynê demê de arîstokratê herî bilind e. Şaîr li her cihî bi beden, bi giyan (rih), wî nê wî mensubê prensîba çîna ku ew taswîr dike, bibînin, bi yek peyvê, li her cihê ku em dîbinin avayê Rus e... Şaîr, di vê çînê de her tiştê ku dijberî mirovantiyê ye, êriş dibe ser, lê prensîba çîneyî di çavên wî de heqîqetêke ku nayê guhertin... Di hîcwa Puşkîn de wilqasî ku hizjêkirin heye û pirrê caran ku rexne bi awayê pesendkirinê, bi awayê heyrantiyê tê xuyakirin, ji ber vê yekê ye... Di bîrra 2-em de taswîra malbata Larîn û bi taybet portreya Larîn bêne bîra xwe... Ji ber vê yekê, di Onyegînê de gelek tişt kevn bûne.

Belînskî hukmê ku di derbarê wateya (maneya) dîrokî ya Evgenîy Onyegînê de daye, dide xuyakirin ku wî di salên dawî yên di jiyana xwe de li vê romanê ne di çerçeva romana mutlaq de, lê rola çînan ya dîrokî û nerîna ku çînek şûna çînekî din digre li ber çavan girtiye, di nava geşbûna civata Rus de cihek dayiyê. Ev guhertineke gelekî girîng e. Û vêca, şîreta ku materyalîstên hevçax li rexnevanan dikin û li ser bingehê ekonomîk polîtîkê tê avakirin, ev e. Li hemberî helwesta Belînskî ya layiqê pesenddariyê ku mîrza Volînskî dixwe hawar û qêrîn ji erdê heta ezman mafdar bû. Belînskî rexnên xwe ku li ser bingehê geşbûna civakî ava dike, nêzî rexna Fransî ya ku di destpêka karûxebata xwe de piçûk didît, dibe. Ji bo ku em mistewa vê nêzîkbûnê nîşan bidin, emê Alfred Michiels bi bîr bînin. Alfred Michiels ku li Fransa kêmtê girtin, li ba me, li Rusyayê qet nayê naskirin, lê nivîserekî bi rûmet e ku divê mirov bi agahî li ser rawest e. Lewra, Taîne nerînê xwe yê di dorbera geşbûna huner ya dîrokî de hemû jê girtine. Michiels, di berhema xwe ya bi navê dîroka resma Flaman ya ku çapa wê ya yekemîn di sala 1844-an de derket, amanca xwe wisa dide nasandin:

—«....Expliquer les variations de la peinture alaide de l'état social politique et industrrel. — Guhertinên di hunera resmê de bi rewşa civakî, siyasî û industrî şîrovekirin—

Aksiyona bi navûdeng: Edebiyat îfada civatê ye, xwedyê rûmetek e din e. Li rastiyê vê îtiraz nayê kirin. Lê, mixabin ji vê prensîbê, him jî ji bilî

prensîbeke ne zelal pê ve ne tişteki dine. Edebiyat bi çi awayî civatê îfade dike? Ev civat bi xwe çawa geş dibe? Awayên (şiklên) huner yên ku her yek bi geşbûna konaxên civakî re diguncin, beşên huner yên ku her yek bi unsurên civakî re diguncin, kîjanin? Va ji te re pirsgerêkên hûr û kûr yên ku mirov nikare dev ji wan berde! Ramana pêşî, ancax di wan bilindiyên bi rewrew yên ku di wan de melewanî(soberî) dikir, bi daketina ji wan bi sîstemeke bi taybet ya vekirî re dê portre vê heta mirov karê bibêje ku wê wateya xwe ya heqîqî bistîne.(Michiels : Ji destpêkê pê ve dîroka hunera resmê Plaman.R.21)

Belînskî şîtra Puşkîn bi rewşa Rusya ya civakî, bi rola dîrokî ya çîna ku şairê mezin mensubê wê bû, şîrove dikir, Michiels eynê metodê li ser dîroka hunera resmê ya Flaman bi cîh dikir. Gelekî mumkun e, ku Belînskî rexne-huner ku Michiels ji bo dîroka huner pirsgerêkên ku îşaretî hemûyan kiribû, dibe ku bi awayê ku hemûyan bi carêkê re tê bighê, nêzîk ne bûbû. Michiels di vî warî de Belînskî li pey xwe hiştibû, lê bi awayekî girîng yê din jê li paşiya wî dima. Michiels ji alîkî ve awayên (şiklên) huner û ji aliyê din ve geşbûna di navbera konaxên civakî de dema ku girêdanên wan yên mevcut analîz dikir ku her civata sivil/medenî ji tebeqeyên civakî û çînan hatiye meydanê û geşbûna wan û pevçûnên wan yên dîrokî li ser dîroka hemû îdeolojiyan bi awayekî qetî ronî dike, nedît. Heçî Belînskî bû, weke ku me dît, girîngiya vê diyarde (fenomenê) ya mezin her çiqasî bi temamî fehm nekiribû jî- hê ji hingane ve tedihişt. Û bi qasî ku ev fehm dikir jî, ramanên wî nêzî ramanên materyalistên herî hevdem dibûn. Em naxwazin ku mîrza Vîlonskî bi hezînen, lê ku Puşkînê humen (mirovane) mensûbê xanedaniya Rus e û mîna şairekî kultîve -xwedî kultur- bê rengdêr kirin di eslê xwe de ji bilî ku rast e piştî jîbo ku nerîna perwerdevanên me bê têgihiştin, bingehekî rast teşkîl dike.

Di dawiya salên 1980'î de, Belînskî bawer dikir ku di demeke nêzîk de koletiya xakê dê rabe, bi vî awayî jî mîna çînekî dijberî çînen din dê xanedanî bihêrive. Li ber çavên wî prensîba "xanedandiyê" prensîba ku temenê xwe temam kiribû. Lê wî dizanibû ku wateya vê prensîbê ya dîrokî teqdîr bike.

Belînskî behsa heyameke dike ku xanedanî tède “bi hemû awayî baştir” bû. Ji ber vê yekê jî Belînskî şîîra -helbesta- ku di jiyana vê çînê de bû, baş têdigihîşt, sempatiya xwe ji vê çînê re diyar dikir. Di dawiya salên 1850’î û destpêka salên 1860’î de, perwerdevanan êdî ne mumkûn bû ku helwesteke weha bê taraf li pêşberî xanedaniyê bigrin. Prensîba xanedaniyê ji aliyên wan ve bi carekê re hatibû mahkûm kirin. Ew şaîrê ku ev prensîba mîna heqîqeteke edebî dîtîn, dihatin mahkûm kirin, tiştêkî ku mirov şaş bike, nîne. Şîîra Puşkîn di eslê xwe de ne di qarekterê xeyalî de bû, şîîreke maqul û bi tenê rastî taswîr dikir. Ji ber ku wisa bû jî têra sempatiya Belînskî ya germ dikir. Lê, Pisaref li pêşberî ku kevneşopiyên me yên kevnar bi rengên sêhrdar yên şîîran dihatin rems kirin, bi awayekî mafdar hêrs dibû. Perwerdevanên me yên salê 1860’î helwesta wan li hemberî Puşkîn bi qasî mezintiya qabîliyetên wî ne erênî bû. Ji vê yekê emê di demeke din de behsa wê bikin.

Bi kurtî: Belînskî dema ku rastiya cîvakî pesend (qabûl) dikir, hewl dida ku bingehe objektîf yên rexna estetîk bibîne û dixwest ku wan bi geşbûna ramana mutlaq ya mantiqî ve girêda. Belînskî ku li van şertên objektîf yên bingehe digeriye, ji aliyê wî (û hostayê wî) bi xwe ve -bêyî ku meyla geşbûna huner bi agahdarî nîşan bide- di hinek qanûnên sipehîtiyê de yên ku mîna a priori hatine tespît kirin, dîtibû. Lê, di salên dawî yên di jiyana Belînskî de ku divê rexne di dawiya dawî de ne li ramana mutlaq, li geşbûna dîrokî ya çînan û peywendiyên civakî bê kirin, gelekî girîng e. Geşbûna nerîna felsefî, di navbera birrê pêşketî yê Germanîstana Belînskî de dihatê şopkirin, bi temamî bivê baskê re diqunciyê, ancax di rewşên ku Belînskî dev ji nerîna diyalektîkî berdida û xwe bi nerîna perwerdevanan digirt, ji nerîna diyalektîkî dûr dikir. Di van şertên civakî yên hingane de tu îmkana rê lê girtinê nebû û ji bo geşbûna civata me ev çewtiyên ku bi awayê xwe bi sud bûn, Belînskî kiribû perwerdevanê Rus yê yekemîn.

(*) - Ev nivîsîn di kovara Novoî Slovo (Peyvê Nû) de, di hejmarên 1-em û 2-em (cotmih û kanûna 1897), bi navê N. Kamenskî di lêkolîna bi navê “Çarenusa Rexnegirîya Rusî” di beşa sêyem de hatiye belavkirin.

Di sala 1905-an de meqalên ku bi navê “di bîst salan de” ev lêkolîna jî rêda cih girtiye. Lêkolîn di sala 1922-1923-an de ji nû ve hatiye çapkirin. Cihê wê di nav berhemên komkirî yên Plekhanov de (C.X.R. 285 -304) ye.

(*1) Plekhanov “qanûna estetîk” ya Belînskî dixê mistewa van pênc qanûnan:

1—Şiîr, heqîqeta bi awayê mijara temaşê ye. Şaîr bi îmajan difikire, heqîqetê îspat nake, nîşan dide.

2— Şaîr afirandinên xwe yên bi naveroka îdealan digûhêzê rastiye, ango tiştên ku ew bi xwe dibîne, dihêlê ku ji aliyê herkesî ve bêne dîtin.

3— Şiîra nûjen şiîra jiyana û rastiye ye. Şiîr nerîna di halên îmajan de ye! Ji bo vê yekê ji dema ku fikir bi îmajan hate îfadekirin, heke ne konkret be, bi xapînok û kem bê, ji vê yekê îmaj jî tîndar kirin û ji hunertiyê derdikevin.

4— Yek ji şertên herî sereke yên berhema hunerî ahengiya fikir bi awa (şîkl) re û awa (şîkl) bi fikir re bigunce.

5— Divê ku hemû birrên berhema hunerî yekîtiyeke bi aheng teşkil bikin. Yekîtiya nerînê, yekîtiya awa (şîkl) û yekîtiya vê yekîtiyê ku nebe, huner nabe.

Plekhanov vê qanûna estetîk ya Belînskî her çiqas rûmetê wê yê dîrokî taqdir dîkir jî, ji bo karektêra wê ya abstrak ji rexne lê girtinê ji lêkolîna Jean Frévillê “Plakhanov û Pirsgerêkên Hunerê” hatiye nekil kirin.

(*2)— Derjavîn (1743 - 1816), Şaîrê herî mezin yê sedsala XVI-em e. Gelek od, di vê navberê de ji bo şerefa Katerîna II-em oda Felîta nivîsiye.

(*3)— Komediya Grîboyedov ya bi navê deng. Ev komedî di sala 1823-an de hate nivîsandin û ji aliyê sansurê ve hate qedexekirin, piştî mirina nivîser, di sala 1831-an de hate temsîl kirin û bi temamî ancax di sala 1862-an de hate weşandin.

“PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ”

Senar ŞAHÎN

Û gava ku romanek bi Kurdî ya nûh dibînîm gelek keyfa min tê. Di serî de, ez jî xwendina romanên gelek hez dikim. Ku ev roman bi Kurdî be hezkirina min hîn zêdetir dibe. Hetanî niha romanên ku bi Kurdî derketine (yên bi tîpên Kurdî-Latînî) min hemû xwendine.

Di nav edebiyata Kurdî de şaxa herî bi qels romana Kurdî ye. Di vê hêlê de Mehmed Uzun gavên berbipêş davêje. Di van demên dawîn de romannivîserên Kurd her diçe zêde dibin. Romannivîseriya Kurdî hêj di destpêkê de ye. Hinek nivîskarên Kurd dest pê kirine romanên bi Kurdî diafirînin. Ji bo pêşketina edebiyata Kurdî ev kar û xebatek gelek baş e, xebatek bi qîmet û rûmet e. Ji alî xwe ve, ez yên ku bi Kurdî roman dinivîsînin bi dil û can pîroz dikim.

Li romannivîserên Kurdî yek zêde bû. Ew jî

Mustafa Aydogan e. Mustafa romana xwe ya yekem weşand. Navê romana wî "Pêlên Bêrîkirinê" ye. Mîzampaj û bergên romanê gelek xweşik hatiye amadekirin. Tîrîzîya Mustafa xwe di vir de jî nîşan daye. Mustafa mirovekî tîrîz e, mukemelliyetvan e. Ew dixwaze her tiştên xwe mukemel çêbike. Divê tiştên wî perfekt bin. Di nivîsa berhema xwe de, di bikaranîna zimên de li gor pefektbûnê hareket kiriye. Lê, lêgerîna wî ya li perfektbûnê di hinek ciyan de bûye bela serê wî. Mejiyê wî yê perfektbûnê hinek alozî derxistiye pêşîya wî û di hinek waran de rê li ber wî girtiye. Perfektbûna şeweya nivîsînê û bi karanîna zimanek perfekt, li hevûdu honandina bûyerên di romanê de qels hêştiye. Qelsiya wê bingeha xwe ji, di her warî de perfektbûnê girtiye. Wî xwestiye hinek tiştan perfekt qal bike, lê bi ser neketiye û loma jî di ser wan de çil daye, wan tiştan, bûyeran kurt qal kiriye û gav avêtiye çûye cîhekî din, dest bi qalkirina tişteki din kiriye.

Mustafa di berhema xwe de zimanekî entelektuelî bi kar aniye. Wî ji bo ku ziman perfekt be gelek zor daye xwe. Ji bo ku zimanê wî ji zimanê gel cuda be, ji zimanê Kurdî yê axaftinê cuda be çî ji destê wî hatiye kiriye. Ji xwe xuya dike ku wî bi mejiyê xwe yê mukemelbûnê û perfektbûnê ev berhema xwe ji bo gel na, ji bo hinek entelektuelên elît afirandiye. Wî bi şeweya nivîsîna xwe, bi perfektbûna xwe xwestiye mesafeyekî bixe nav xwe û gel. Û ji gel dûr ketiye. Mustafa bi zimanekî sivik, zelal û hêsan, ji bo ku gel jê fêm bike berhema xwe nenivîsiye. Ruhê entelektuelîzma elît jê re bûye asteng ku ji bo gel binivîse.

Di destpêka pirtûkê de, di çend rûpelên pêşîn de nivîskar ji bo ku entelektueliya xwe, di warê hinek tiştan de zanîna xwe ji xwendevan re bide îspatkirin gelek zor daye xwe û di derheqê edebiyat û zimên de ramanên xwe yê perfekt û întelektuelî pêşkêş kiriye.

Nivîskar (Ez nivîskar dibêjim, lewra li vir qehremanê romanê navê wî çî ye diyar nîne. Tenê ji gotina "Wî" mirov dizane ku "Ew" mê nîne nêr e. Mirovek heye ji xwe re qala tiştan dike, bîr û rayên xwe, di derheqê hinek tiştan de dîtîna û ramanên xwe dibêje. Nivîskar ew mirovê ku difikire û bi xwe re diaxife bi xwendevanan nade danasîn. Taswîra wî mirovî nake) kurt, kurt qala tiştan dike û wek ku bêhna wî teng bibe, di ser de çil dide, anku wê tiştî li cîhek dihêle û çil dide cîhekî din.

Di rûpela 20'an de ew(anku nivîskar) wexta ku helbesta Ahmed Arif bi bîr

tîne, dibêje: “Ev helbest hem di pêvajoya hefsê de û hem jî di ya surgûnê de dev jê bernedabû.” Li vir mirov fêr dibe ku “Ew” ketiye hefsê, di hefsê de razaye. Û ewqas. Yanî di derbarê razana “Wî” ya hefsê de qet teferuat tune. Teferuat yek ji taybetiya romanana e. Di qalkirina tiştan, bûyeran de teferuat di romanana de cihekî girîng digire. Çexov dibêje wexta ku mirov di çîrokek de qal bike ku li dîwar tîfing eliqandiye, divê mirov di cihekî de wê tîfingê bînê xwarê û biteqîne. Ev jî bo romanana jî derbas dibe. Divê nivîskar qala hefsê bikirana.

Nivîskar di qalkirinê de gelek îmge bi kar anîye. Lê îmgeyên bê teferuat in. Îmgeyên hişk, tazî û zilût in. Îmge bi teferuatê nehatine dewlemendkirin. “Ew”, anku lehengê entelektuel yê bînav, taswîra derûdorê, ya hewayê û yên tiştên din dike, lê di nav van taswîran de balkêşî tune, bûyer jî tune ne.

Keçên Swêdî sembola rindiyê, bedewîyê, xweşikbûnê ne. Nivîskar xweşikbûna keçika Swêdî gelek baş û xweşik taswîr kiriye. Lê kin biriye. Xweziya hinek jî dirêj bikirana û bi taswîrekî erotîk, xeyala xwe bidomandana. “Ew” -anku nivîskar- pirr xeyalperest e. Ji xwe re dikeve nav derya xeyalan, mitale dike. Tim derbasbûyîna xwe bi bîr tîne. Hîsên wî yên nostaljîk xwe didin der. Ew wexta ku qala derbasbûna xwe dike, an jî wexta ku jiyana xwe ya derbasbûnê bi bîr tîne, bi kurtî qala demên çûyî dike. Di nav wê qalkirinê de herikandin û li hevûdu girêdan tune. Wek ku dîmenek ji kurtejiyana xwe ya demên curbecur bide.

Jiyana nivîskar a li Swêdê jiyaneke monoton e, aktîf nîne. Tiştên ku ew qal dike jiyana wî ya çûyî ye. Min di nivîseke xwe de gotibû: “Jiyana her Kurdekî dibe romanek.” Wî jî jiyana xwe ya derbasbûyî bi bîr anîye û kiriye wek roman. Lê, bûyerên derbasbûyî yên jiyana xwe li hevdu nehonandiye. Nivîskar di nav nivîsê de jiyana xwe ya derbasbûyî fikiriye û ji ber wê hîsên nostaljîk ev berhem avakiriye. Ew li pêşberê tahtek disekine û bi xwe re dipeyive, paşê diçe li trêna bin erdê siwar dibe, hetanî digihîşe Hotorgetê ji xwe re mitale dike, difikire, dihezire, çûyîna xwe-derbasbûyîna xwe- bi bîr tîne. Di trêna de rastê Azad tê, diçe dema çûyî difikire. Ev berhem “Pêlên Bêrîkirinê” jî ber vê çûyîna berê, jî ber jiyana derbasbûyî têt afirandin.

Nivîskar nav li qehremanê-lehengê- romanê, anku li xwe nekiriye. Ew bê nav e. Mirov romanê dixwîne, diqedîne jî navê qehremanê romanê fêr nabe. Nav li keçikê-evîndara xwe- jî nekiriye. Ew wexta axaftina keçikê dide,

dibêje “keçikê gotibû” li vir keçik bênav e. Nivîskar li jin û keçikan -li cîsnên mê- nav layiq nabîne?! Wek ku nivîskara Tirk Duygu Asena dibêje “Navê jinan tune ye.”

Di beşa qalkirina dema derbasbûyîna binxetê de, nivîskar gelek bi ser ketiye. Wî bi şeweyekî xweşik, felsefîk û bi hîzn qala vê derbasbûnê kiriye. Di qalkirina hevalê xwe Azad û problemên wî yê malbatîyê, hevûdu berdana Azad û jina wî Zînê, bi metodek edebî û bi zanyariyek psîkolojîk hatiye qalkirin.

Di pirtûkê de di nav kesan de gelek diyalogên axaftinê hene. Nivîskar van diyalogên axaftinê gelek dirêj kiriye. Di beşa qalkirina Azad û malbata wî de, nivîskar diyalogên axaftinê wisan dirêj kiriye ku, hemû axaftin bûne wek ragihandinekî înfomatîk û agahîyên teorîk. Nivîskar bi devên çend lehengên romanê yê Swêdî, înformasyonên-agahdariyên- dirêj daye û xwestiye ku bi xwendevanan bide zanîn ku ew -nivîskar- di van mijaran de çiqas xwediyê zanînê ye, ekspert e, di vê hêlê de pîspor e.

Nivîskar di qalkirina beşa leyistika pînîkêrê de rewşa xwe datîne holê. Hewesa wî ya ji bo pînîkeriyê wî dixê nav jîyanek rawestayî, jîyanek monotîk, jîyanek bê hêreket, jîyanek tiralî. Leyistina pînîkêriyê wextê wî yê xwendin û nivîsandinê jî dixwe. Wext jê re nahêle, loma jî ku hevalên wî rexne lê digrin û jê re dibêjin: “Tu hemû wextê xwe, bi pînîkêrê derbas dikî û tu tiştekî din nakî, ev ne tu sen’et e.” Heger wiha nebana, hetanî niha nivîskar nuwa gelek pirtûk nivîsibû û weşandibû. Nivîskarekî weha xwediyê zanyariyekî kûr, entelektuel, xwediyê zîmanekî baş û yek pirtûkek wî hebe, nabe. Divê ew wexta xwe di leyistika pînîkêriyê de nekuje û hîn pîrtir binivîse. Berhemên nûh biafrîne. Yanî divê ew nebe Oblomovê Kurd. Divê di hêla nivîsê de jîr be, berhemkar be.

“Pêlên Bêrîkirinê” li ser mijarek na, li ser gelek mijaran hatiye afirandin. Her mijarek ku ew qal dike, bi serê xwe dikare bibe romanek. Nivîskar mijarên çend romanên bi kurtebirî di nav romanek de daye. Azad û malbata wî, rewşa keçika wî dikare bi serê xwe bibe romanek. Lêgerîna -mehkumbûna- “Wî” derbasbûyîna “Wî” ya binxetê, jiyana “Wî” ya li wî welatî bi serê xwe dibe romanek. Jiyana nivîskar a li Swêdê û hewesa wî ya ji bo leyistika pînîkêriyê jî dibe romanek. Û hwd, mirov dikare mijaran hîn zêdetir bide nîşandan.

“*Pêlên Bêrîkirinê*” romanek fikrî, ramiyarî ye, romanek entelektuelî ye, romanek felsefîk e. Navê romanê “*Pêlên Bêrîkirinê*” ye, lê bi a min “*Pêlên Entelektuelîyê*” ye. Yanî bi gotinekê tirkî “*Entelektuel Kabarma*” ye. Nivîskar gelek nostalgîk difikire, lê bi rastî hîs nade kîrin -an jî min wê hîsê têde ferq nekîr- ku wî bêriya Kurdistanê kiriye. Li gor têgihiştina min, wî bêriya Kurdistanê nekiriye, hesreta vegera Kurdistanê di dilê wî de tune ye.

Ji bo dawî lêhanîna romanê bi dîtina min ku di rûpela 162'an de biqedandana hîn baştir bû. Ji xwe di esasê xwe de roman wexta ku “*Ew*” dikeve nav ciyan û xwe dirêj dike, radize diqede. Beşa ji 163'an heta rûpela dawîn-170'ê- zêde ye.

Ji bo nivîskar û berhema wî bi kurtahî van çend gotinên dawîn dixwazim bibêjim; ev hêj destpêk e. Li gor ku berhema wî ya yekemîn e jî dîsa berhemek baş e. Di kar û xebatên destpêkê de, di afirandinên pêşîn de bibe nebe kêmanî çêdibin. Nivîskar bi afirandina vê berhema xwe ya edebî karekî hêja, karekî pîroz kiriye. Edebiyata Kurdî dewlemend kiriye. Li romanên bi Kurdî yek zêde kiriye.

ANALÎZA
BERHEMÊN EDEBÎ
Nirxandina
Li ser Romanên Kurdî
Di Nav
Weşanên Çanda Nûjen De
Derdikeve!

“KURÊ ZINARÊ SERBILIND” ROMANE YAN NA?


Cîhan DILŞAD

Destpêk

Di Kurdistana başûr de edebiyata Kurdî gelek pêşketiye. Gelek kovar û berhemên edebî hatine weşandin û niha jî tene weşandinê. Di hêla çîroknivîs û helbestvanîyê de pêşveçûnek berbiçav heye. Lê di hêla şaxekî edebiyatê de, yanî di hêla romana Kurdî de qet pêşveçûn tune ye. Ji alî nivîskarên Kurd yên başûr ve pirr hendik -bi tiliyan tê jimartin- roman hatine weşandinê. Di hêla romanê de, di nav edebiyata Kurdî de bi gelemperî qelsiyek heye. Lê başe ku di van demên dawî de hinek nivîskarên Kurd giraniya xwe dane ser romannivîsê û romanên nûh diweşînin.

Nivîskarên Kurd yên başûr ji bo ku berhemên xwe bi tîpên Muhamedî - bi alfabeya Erebî- diweşînin, Kurdên bakûr ji wan berheman feydeyek nabînin. Lê gelek dilşadiyek mezine ku hinek nivîskarên wek Xelîl Dihokî û Sidkî Hirurî berhemên xwe bi alfabeya Kurdî-Latînî dinivîsînin. Ez Xelîl Dihokî, Sidkî Hirurî û yên ku berhemên xwe bi alfabeya Kurdî-Latînî

dinivîsin pîroz dikim. Ez berhemên nivîskarên Kurd yê Kurdîstana başûr - yê ku bi tîpên kurdî-Latînî dinivîsin- bi dlxweşî û bi meraq dixwînim. Min pirtûka Sidkî Hirurî a bi navê “Kurê Zinarê Serbilind” xwend. Di derheqê vê pirtûkê de ez dixwazim dîtînen xwe pêşkêşî xwendevanan û bi taybetî jî pêşkêşî xwendevanên kovara Helwestê bikim. Helbet ev dîtînen min in û ez bi hişkî îdîa nakim ku ev dîtînen min sedî sed rast in. Dîtîn û rexneyên min dibe ku ji bo hinekan rast bin, ji bo hinekan jî şaş bin. Şaşî yan jî rastiya dîtîn û rexneyên xwe, ez ji teqdîra xwendevanan re dihêlim. Armanca min ev e ku, li ser berhemên edebî munaqêşe bêne vekir in. Divê edebiyatzan di



derbarê van berhemên edebî de dîtînen xwe bînin zimên. Munaqêşe û rexne ji bo nivîskaran û berhemên wan yê edebî pêwîst e. Dîtîn û rexneyên balkêş ji nivîskar re dibe alîkar. Ji bo pêşveçûna nivîskar rolekî girîng dilîze.

Niha em bînin ser berhema Sidkî Hirurî. Pirtûka Sidkî Hirurî romane yan na? Li gor min, li gor zanîna min ya di derbarê romanê de, ev roman nîn e. Helbet her mirov li gor xwe pîvanên wî heye. Yanî her mirov pîvanên wî cuda ne. Li gor pîvanên hinekan, yan jî li gor berhemên hinek nivîskaran ku wek roman hatine bi nav

kirin, dibe ku pirtûka Sidkî Hirurî roman be, lê li gor min ne roman e.

Başê! Pirtûka bi navê “Kurê Zinarê Serbilind” roman nîne çiye? Pirtûk serpêhatiye. Sepêhatiya Kurdekî serbilind e. Bîranîn e. Bîranîna jiyaneke bi têkoşerî derbasbûyî e. Bi peyvekî modern wek berhemek otobiyografîk e.

Di pirtûkê de di derbarê civata Kurd ya li Kurdîstana başûr de agahdariyên gelek girîng yê informatîk jî hene. Mirovê ku Kurdîstana başûr nedîtibe û Kurdên başûr jî nêzde nas neke, wexta ku vê pirtûkê dixwîne jê gelek tişt fêr dibe. Zilm û tehdâ Be'sîyan, şovenîzma Ereban bi hawayekî gelek vekirî di pirtûkê de têt qalkirin.

Di pirtûkê de qehreman -leheng- nivîskar bi xwe ye. Tiştên ku hatiye serê nivîskar û bûyerên ku wî dîtiye yan jî bihîstiye, di pirtûkê de hatine qalkirin. Nivîskar di qalkirina jiyana xwe û bûyeran de, qalkirina xeyalên xwe de -wek ku lehengê pirtûkê dixwaze bibe nivîskar û xeyala wê dike- ji metoda nivîsîna romanê dûr ketiye. Di qalkirina bûyeran de teferuat tune ye.

Tasnîfa cîh û waran gelek qels e. Di hinek beşên pirtûkê de nivîskar wusan giranî daye ser diyalogan ku mirov dibêje qey ev pirtûk bes pirtûka diyalogan e. Diyalogên di nav sexsan -mirovên- de dirêjin û hinek ciyan de pirtûkê fetisandiye. Di gotinên ku di diyalogan de hatine zimên de analîz, tahlîl û teferuata tiştan tune ye. Sedemên xwekuştina -întîxara- Besnayê baş nedaye fêmkirin. Gelo Besnayê ji bo çi xwe kuştiye, sedemên întîxara wê çi bû?

Di girtina qehremanên -lehengên- pirtûkê de û di lêdanê -îşkenca ku pê dikin- de jî teferuat tune. Hema ji cîhê nişka ve leheng digirin, dibin hinek lê dixin û paşê qaxizek pê didin înzakirin û wî berdidin. Heger nivîskar Sidkî Hirurî teknîk û metoda romanê bi kar bianiyana, ev bi serê xwe dibû beşeke romanê. Lê nivîskar hema di ser de çûye, neketiye kûrahîya qalkirina wan bûyerên ku me li jor behs kir e.

Pirtûka Sidkî Hirurî, beşa yekem beşek bê serûber e. Keçik û dapîra wê kove diçin? Çima diçin? Armanca rêwîtiya wan diyar nîne. Ew ji leşkerên dagirker yên Be'siyan re dibêjin em diçin Dihokê. Di rê de ji erebê-texsiyê- tên xwarê û diçin gundek. Çima diçin wê gundî? Armanç diyar nîn e.

Kuştina pîrejinê jî baş nehatiye qalkirin. Nivîskar Sidkî Hirurî malbata xwe jî, -anku malbata leheng- ji xwendevanan re baş nedaye danasînê. Yanî di vir de jî teferuat tune ye. Di hêla tasfira psîkolojîk de jî qelsiyek berbiçav heye. Ew kesên ku di vê pirtûkê de ne, psîkolojiya wan çîye? Çawan e? Beylû nîne. Psîkolojî û qareqtera mirovên ku di pirtûkê de ne nehatiye qalkirin. Di pirtûkê de bûyerên ji hev cuda û honandina wan bûyeran bi hevûdu re tune ye. Di hêla xulqandina bûyeran de qelsî heye. Herikandin tune ye. Ji bo ku bûyerên ji hevûdu cuda û honandina bûyeran bi hevûdu re tune ye, meraq jî tune. Yanî xwendevan nakeve nav meraqê, an jî xwendevan meraq nake ku filan tişt yan filan bûyer dê gelo çawan bi dawî bê. Nebûna meraqê xwendina pirtûkê jî dijwar dike. Di pirtûkê de mecera tune, heyecan tune. Monotonî heye. Her tişt hêdî diçe. Loma jî, ji alî herikandinê ve qelsiyek heye, yanî herikbar nîn e.

Di gel qelsiyan, gelek aliyên wê yên serkeftî jî heye. Dîmenek ji pêvajoya civata Kurdên başûr tîne ber çavê mirov. Xwendevanan bi ragihandinên civakî, bi pirs û pirsgerêkan, bi problemên netewayî agahdar dike. Di xwendina pirtûkek de, ji bo min tiştê herî girîng jî ev e ku; mirov gava pirtûkek bixwîne, tiştên nûh jê fêr bibe, tiştên ku berê nizanibûye bi saya vê xwen-

dinê bizanibe. Bi xwendina vê pirtûkê ez gelek tiştên ku berê nizanibûm, fêr bûm. Ji xwe hêjabûna xwendina pirtûkan ji fêrbûna tiştan tê.

Di pirtûka Sidkî Hîrorî de, şovenîzma Ereban, wehşeta dagirkeriya Be'sîyan, nakokîya nav herdu netewan, dijberiya di nav Kurdan de, problemên cîvakî, netewayî bi kurtî be jî hatiye zimên.

Di pirtûkê de du tiştên balkêş jî -bi taybetî ji bo Kurdên bakûr û ji bo min jî, ku ez pê nizanibûm- ev in: Yek, min digot qey di dibîstanên Irak'ê de zimanê Kurdî bi serbestî têt xwendin, yanê min digot qey di dibîstanan de dersên zimanê Kurdî hene. Ji pirtûka Hîrorî mirov fêr dibe ku; her çiqas li ser kaqiz, li gor qanûnên -zagonên- dewleta Irak'ê divê dersên zimanê Kurdî bi serbestî bête dayîn jî, di dibîstanên Musul'ê de, di dibîstananê de dersên zimanê Kurdî nadin. Di dibîstanê de gelek xwendevanên Kurd hene, mamosteyê dersên zimanê Kurdî heye, lê bi Kurdî ders nadin. Ji bo ku lehemgê pirtûkê daxwaza destpêkirina dersên zimanê Kurdî dike, têt girtin, îşkence dibîne, lê dixin.


Ya duyem jî; lehengê pirtûkê -anku nivîskar bi xwe ye- ji dibîstanê davêjin û wî bi ajantiya -spîon- Yahudîyan -Îsraîlê- suçdar dikin. Ev jî dide xuyakirin ku metodên suçdariyê -tawanbariyê- yên hemû dagirkeran -dewleta tirk, ereb, faris- wekhevin. Gava ku Kurd doza heqê xwe yên neteweyî dikin, dagirker wan bi derva ve girêdidin, wan dikin hevalbendên dijminên xwe yên derve. Be'sî Îsraîlê ji xwe re dijmin dibînin, Kurdan dikin hevkarên Îsraîlê. Faris -dewleta Îranê- Kurdan dikin hevalên Amerîka û hevalê şeytan. Tirk, Yunan-Grekî- û Ermenîyan ji xwe re dijmin dibînin, Kurdan dikin hevkarên Yunan û Ermenîyan.

Wek ku min di destpêkê de jî got; ez Xelîl Dihokî û Sidkî Hirurî pîroz dikim ku berhemên xwe bi alfabeya Kurdî-Latînî dinivîsînin. Ev pêngavek baş e ku wan avêtiye. Hêvî ew e ku nivîskarên başûr yên din jî wek Xelîl û Sidqî bikin, berhemên xwe bi alfabeya Kurdî-Latînî binivîsin.

“Kurê Zinarê Serbilind” ji bo Sidqî Hirurî ceribandinek e. Ez hêvî dikin ku ew dê xwe pêşve bibe û gelek berhemên hêja biafrîne. Romana şer û şoreşa Kurdistanê başûr hêj nehatiye nivîsîn. Divê bê nivîsîn. Ev wezîfe jî dikeve ser milên nivîskarên Kurd yên Kurdistanê başûr. Bi hêviya ku em rojek romana şer û şoreşa Kurdistanê başûr bixwînin.

OLGA JIYANEK BI BAWERÎ

Cîhanroj LICÎ



Olga hem navê romanê ye û hem jî navê lehenga romanê ye. Ev roman ji alî nivîskarê Brezîlî Fernando Morais ve hatiye nivîsîn. Nivîskar romana xwe li ser jiyaneke rasteqîn a jinekê Alman ava kiriye.

Olga keçikek şoreşger e. Endamê partiya komünîst a Alman e. Olga -paşnavê wê Benaïro ye- û Otto Braun destgirtiyê hev in. Otto Braun ji alî polîs ve tê girtin. Wî bi “xîyaneta watanî” suçdar dikin. Roja ku wî derdixin dibin dadgehê, Olga wî jî destê polîsan xilas dike û wî direvîne. Olga destgirtiyê xwe bi zor, bi çek direvîne û ev bûyer di rojnemeyên rojane de dibe manşet. Polîs anons dikin ku, kê cihê Olgayê bibêje, ew dê 5 hezar Mark pere bidin pê. Lê tu kesek cihê Olgayê nabêje, wê îxbar nake. Olga ji Berlînê direve diçe Moskovayê. Olga û destgirtiyê xwe Otto Braun demek di Moskovayê de dimînin. Paşê wezîfe didin herduyan. Herdu jî mecburin ku biçin welatên cuda û liwê xebata siyasî û rêxistinî bikin.

Wezîfeyên ku dane herduyan wezîfeyên navnetewî ne. Wek têt zanîn di wê demê de Komînter - Komunîst Enternasyonal - hebû û hemû partiyên komunîst yên cîhanê endamên wê bûn, di hemû welatan de wek şaxekî wê dixebitiyan.

Olga bi wezîfe diçe Parîsê. Di Yekîtiya Ciwanên Fransayê de wek mamos-teya perwerdekirinê dixebite. Ew beşdarê civînên siyasî û meşên protestokirinê dibe. Navê Olga Benario li Parîsê Eva Krugen e. Ev nav navek mutear e.

Pitî demekî Olga vedigere Moskovayê û beşdarê kongreya Enternasyonala Ciwanên Komunîst dibe. Komîteya navendî ya Komînterê bangê Olgayê dike û wezîfeyeke nûh dide Olgayê. Ev wezîfe ev e ku parastina Luîs Carlos Pentes'ê Brezîlî bike. Olga û L.Carlos Pentes ewil bi hev re diçin Parîsê, paşê jî diçin Latîn Amerîkayê, derbasê Brezîlyayê dibin.

Olga hendî di Brezîlyayê de ye. Destgirtiyê wê Otto Braun jî bi wezîfe diçe Çînê. Otto Braun di Çînê de bi navê "Oto Hua Fu" di rojnameya komunîst "Şer û Şoreş"ê de nivîs dinivîse.

Ew û partiya komunîst a Çînê gel bi rêxistin dikin û li dij Japonan serîhildan çêdikin. Olga û Carlos Pentes jî di Brezîlyayê de dest bi xebata amadekirina serîhildana şoreşê dikin. Di nav gelek partî û rêxistinên cuda de yekîti çêdibe û Carlos Pentes dibe serokê vê yekîtiyê. Yekîtiya Rizgarîya Netewî di demek kin de xurt dibe, bi girseyî dibe. Brezîlya dikeve pêvajoya şoreşê. Hinek eyalet bi temamî dikevin bin destê şoreşgeran. Li wir hukumeta gel a şoreşgerî têt damezrandin.

Di sala 1935'an de, di bin serokatiya Carlos Pentes de li temamê Brezîlyayê serîhildanek mezin çê dibe. Lê ev serîhildan bi ser nakeve, têk diçe. Gelek şoreşger têne kuştin û birîndarkirin. Bi sedan, bi hezaran şoreşger jî têne girtin. Olga û Carlos Pentes di serî de nayên girtin, demekî xwe berşê didin, paşê ew herdu jî têne girtin. Polîsên Brezîlî bi polîsên Alman re hevkarî dikin, polîsên Alman di derheqê Olgayê de gelek malumat didin polîsên Brezîlî.

Polîs bi Olga û Carlos şkence dikin, piştî şkenceyê wan herduyan dibin dikin zîndanê. Di hepisxaneyê de Olga têkilî bi endamên Yekîtiya Rizgarîya Netewî re datîne. Carlos Pentes di dadgehê de hemû berpirsiyariya serîhildanê digrê ser milê xwe. Armanca wî ew e ku hevalên xwe yên din û Olgayê xilas bike.

Hukumeta Brezîlyayê dixwaze Olgayê teslîmê hukumeta Alman bike. Li Almanyayê Hitlerê faşîst li ser hukum e. Di hepisxaneyê de ji bo ku Olgayê teslîmê Almanan nekin berxwedan çêdibe. Yên hepisxaneyê hemû bi hev re

beşdarê berxwedanê dibin. Yê hepsî dibêjin “Hûn hetanî me hemûyan ne-
kujin, hûn nikarin Olgayê ji hepisê derbixin û teslîmê Almanan bikin.” Piştî
çend rojan polis hepsîyan dixapînin, dibêjin em Olgayê dibin nexweşxanê.
Bi xapandinê Olgayê ji hepisê derdixin û dibin dikin gemîyek -keştîyek-
Alman, wê teslîmê Almanan dikin.

Olgayê di Almanyayê de davêjin zindanên Gestapoyê. Dê û bavê Olgayê ji
tirsan li Olgayê xwedî dernakevin, dibêjin “ew keça me nîn e.” Olga ewil di
zîndana Lichtenburgê de dimîne. Paşê wê dibin qampa mirinê a ku li Ra-
venbruckê ye. Di vê kampa girtiyan de komînîst, sosyalîst, sosyal demokrat,
yahudî, çîngene û şahîdên yehova hene.

Rojekî generalê Nazîst Hîmmler di nav qampê de digere, diçe alî beşa
jinan. Di nav bereqayek de jinek diqîre, dibêje: “Heînrich Hîmler tu
qundeyî, tu qatîlî.” Li ser vê gotinê leşker li yê mehkûm şence dikin. Ge-
neral dibêje 80 jin helbijêrin û wan bavêjin hucran, sê roj nan û av nedin
wan. Olga jî di nav wan 80’ê jinan de ye.

Di wê demê de Nazî “odeyên gazê jehrî” çêdikin û girtiyan di wan odeyan
de dikujin. Gelek Alman û Yahudî -Cuhî- di van odeyên jehrî de dikujin.
Li gor îstatîskan 35 hezar mirov di odeyên jehrî de hatine kuştin. Olgayê ji
bi 200 jinan ve di van odeyên jehrî de dikujin.

Olga şoreşgereke profesyonel bû. Wê di qada navnetewî de ji bo şoreşê kar û
xebat kir e. Jiyana wê jiyaneke romantîk, bi bawerî û şoreşgerî bû. Wê ji bo
bîr û bawerîya xwe gelek êş, eziyet û zehmetî kişand. Lê bîr û bawerîya wê di
tu demî de nehat şikandin. Wê ji bo xebata şoreşê jiyana xwe amadeyê her
tiştî kir e.

Romana bi navê “Olga”yê romanek bi heyecan e, romanek romantîk e.
Bûyerên di romanê de bi şeweya realîzmê hatiye honandin. Romanek gelek
baş e. Divê kesên şoreşger vê romanê bixwînin. Di vê romanê de fedekariya
ku ji bo bîr û baweriyê, ji bo şoreşê têt kirin, bi hawayekî zelal têt qalkirin.



Li Ser Xebata Mahmut Baksî ya ”Ji Awira Kurdan ve Yilmaz Guney”



Gabar Çiyan

*J*eta nuha li ser Yilmaz Gunêy hejmarek pirtûk hatine nivîsîn. Di gelek rûniştinan de, qala wî hatiye kirin. Lê ev, wê têr nekin ku em wî, ji aliyê hunerî, Kurdhezî û welathezî ve, têr alî û berfireh fêr bikin, binirxînin. Ji bo analîzen hundirî, divê berhemên wî bên wergerandin. Da ku sîyasetvan û sînemekarên Kurdan, wan bi Kurdî bixwînin, cîhana Gunêy fêr bikin û wî bidin nasîn...

Mahmut Baksî ne xerîbê karên polîtîk e. Di derheqa karê sînemayî de jî, xwedî dîtin e û demekê bi projeyên kişandina filman jî, mijûl bûye. Ew, yek ji wan kesan e ku di saxiya Gunêy de, wî dîtibû. Û bi bawerîya min, li ser gelek pirsan bi hevûdu re qise kiribûn. Ev aliyên Baksî, şensek û hêviyek e mezin dida mirovî ku em bi berhem û berçavkên wî, xwe nêzî Yilmaz Gunêy bikin. Wî baştir nas bikin...

Pirtûka ”Kürt gözüyle Yılmaz Güney”, di nav weşanên ”Zêl” de li Istanbulê, di nîsana 1994an de derketibû. Par kete destê min. Min di wê kêliyê de xwend. Paşê jî çend careke din ez lê vegeriyam. Pirtûk bi pêşgotina Kendal Nezan dest pê dike. Wî, di pêşgotina xwe a dirêj de, bêhtir balê dikişîne ser

cîh û qîmeta pirçandîbûnê, jîyana Gunêy li Parîsê, çîroka filma "Yol"ê, hewildanên rejîma Tirkîyê li dijî Kurdan û Yilmaz Guney. Pirtûk, ji 15 beşan pêk tê. Nivîskar, bi dorê, qala hewildan û planên serkarên Tirkîyê û nijadperestên tirkan li derveyî welat, bi taybetî li Swêdê dike. Dîtina Necmettin Büyükkaya li ser Gunêy, hevpeyvîn û qiseyên bi Yilmêz re hatine kirin, beşên herî balkêş in. Hevpeyvîna bi Nezan re û dîtina Şivan Perwer jî, di dawîya pirtûkê de cîh digre.

Bi tevayî, dîtîna şexsan û yê nivîskar, hevpeyvîn û qiseyên bi Gunêy re, ji hêla zaniyariyê ve têr û tije ne. Pirtûk, ji awira berhemên 'mijûlkêrên politîk û sinemekarên' Kurdan yê li ser "Sînema Kurdî û Yilmaz Guney" ve, di nav xebatên sereke de cîh digre.

Naveroka pirtûkê weşan nîşan dide ku danûstandîna nivîskarî, bi Gunêy û malbata Gunêy, heval û nasên wî, derûdora Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û sinemekarên Kurdan re, baş bû. Ev peyvendi û çavkaniyên dewlemed, hêvîya berhemeke pir xurtir dida mirovî. Piştî hevdudîtina min û Baksî, ez tê gihîştim ku xebatên wî li ser Gunêy didome. Ev jî mirov kêfxweş dike.

Weke ku li jorê jî hatiye qalkirin, zimanê pirtûkê weşan gava bi Kurdî be, roleke mezin dikarin bilîzin. Pirtûk bi tirkî hatiye nivîsîn û ev jî dikare bibe sedem ku, siyasetvan û sinemekarên Kurdan zêde jê sîdan wernegirin. Bi bawerîya min: Pîrsa, çima bi Kurdî nehatiye nivîsîn jî, dikare rêya rexneyan lê veke.

Piştî derketina pirtûkê, min xwest ku ez çend pîrsan ji nivîskarî bikim. Mahmut Baksî nexweş bû, lê dîsa jî em qebûl kirin û bersivên pîrsên min, da.

— *Qala hejmarek filmên Kurdî tê kirin. Gava beşek ji filmên Yilmaz Gunêy jî mîna filmên Kurdî bîn pejirandin, mirov dikare bêje: Sînema Kurdî heye?*

— *M. Baksî:* Ev, pir caran hatiye pîrsîn. Mixabin e ku zanabûna min li ser berhemên ku li Başûrê Kurdistanê çêbûne, ne zêde ye. Dema zanabûna di vî alî de hebûna, min dê komentarek baştir bikira. Di esasê xwe de, Sînema Kurdî jî zû ve heye. Yanî, ji "Seyîdxan" û vir ve heye. Yilmaz Guney, bi xwe jî gotiye: Fîlmê min ê yekem ku Kurdî bû, Seyîdxan e.

Îca em werine ser pîrsa zimên. Di şertê wê demê de, ne mimkûn bû ku wî filmên xwe bi Kurdî bikêşîne. Bi tirkî ne, lê naveroka wan li ser Kurdan in.

Divê ji vê awirê mirov lê binêre. Yanî, Sînema Kurdî heye, lê ne bi zimanê Kurdî bûn. Nakokiyên wesana li welatên din hene, an jî tune ne, ez nizanim. Lê li Tirkîyê hebûn û çêbûn.

Di van demên dawî de jî Sînema Kurdî, bi xebatên nûh, pêştir dikeve, gulan vedike. Ji bo vê yekê jî mirov dikare bêje: Belê, Sînema Kurdî heye. Îca îro dikare xurttir bibe û baştir bibe. Bi taybetî hebûna kanala tv. a Kurdî şensek mezin dide mirovî ku wan nîşan bide. Berê ev mecal tunebûn. Weke mîsal, min di 1984an de filmek kişand. Piştî wê, mecalên me tunebûn ku me wê di tv. de, bi Kurdî bida nîşandan. Di tv. swedî de, bi bi swêdî hate weşandin. Lê wan di têksta binî de nivîsand ku ew filmek Kurdî ye. Yanî film bi çi zimanî dibe bila bibe, mesaja têde û berê wê mesajê li kê ye û kîjan derhenê ew film çêkirîye, giring e. Divê di vê çerçevêde pirs bê formulekirin.

— *Piştî bersivên te, pîrsa pêşeroja Sînema Kurdî, pîrsgirêkên wê û rêya çareserkirina wan tên bîra mirovî. Dîtina te li ser van pîrsan çi ye?*

— *M. Baksî:* Ji ber ku karê sînemayî karek e kolektîv e, pêwîst e derhêner, lîstikvan û senarîstên me, yanî sînemekarên Kurd xwe organîze bikin. Pêwîst e pîrsa aborî bête çareserkirin. Ji ber ku, kişandina filman bi mecalên ekonomîk ve girêdayî ye. Ne mîna çapa pirtûkekî ye. Dewleta me tune ye. Divê organîzasyonek me, bêtî ku dîtina xwe derxîne pêş û li yên wan binêre, ji bo pêşxistina karê hunerî, alîkarîya wan bike. Heta ev pîrs neyên çareserkirin, filmên baş nayên kişandin.

— *Bi bawerîya we, filmên Yılmaz Güney malê sînema Kurdî ne, an na?*

— *M. Baksî:* Fîlmên destpêkê na. Lê yên civakî, li ser Kurdan e. Yanî fîlmên bi Seyidxan re dest pê dikin û yên mîna Yol, Arkadaş, Sürü, tev, malê Sînema Kurdî ne. Zimanê fîlmên wî, ji ber zagonan ne bi Kurdî ne. Gava wî biryar bida, bêguman e ku wî, wê biryar ji bo Kurdî bida.

— *Dîtina Yılmaz Güney çi bû? Wî bi çawî li vê pîrsê dinêrî?*

— *M. Baksî:* Li gorî dîtina wî, ew malên Sînema Kurdî ne. Konferansa me jî heye li ser vê yekê. Me li Parîsê "Hefteya Sînema Kurdî" çêkiribû. Wî li wir vekirî dîyar kir: Ew tev malê Sînema Kurdî ne û pêşerojê, em dê tevan vergerînin Kurdî. Mixabine ku sansur hebû û mecal nebûn ku em wan bi Kurdî bikşînin. Lê gava em pîrsa xwe a aborî çareser bikin, ew film yek bi yek ji nûh ve dê bên dublajkirin.

— *Dîtina wî ji bo pêşxistina Sînema Kurdî çibû?*

M. Baksî: Wî digot: Ev bi helwesta hevalan ve girêdayî ye. Divê em hêza xwe bikin yek. Ji ber ku filmkişandin ne karê kesekî ye. Karek e kolektîv e. Gava ev bibe, mirov dikare filmên Kurdî yê baş bikşîne. Piştî Dîwar, biryara min, kişandina filmên Kurdî ye.

Belê, me ji bo kişandina filmê yekem ku serîhildana Kurdan wê bihata nîşandan, xwe amade kir. Pere jî hate peydakirin. Qasimlo û hin dewlemendên Kurdan, xwe dabûn ber. Senaryo jî amade bûn. Navê filmê jî hatibû dîrakin: "Çîya". Lê Gunêy ji nava xwe nexweş bû. Xwest ku berî em herin Kurdistanê Iraq û Îranê, xwe nîşanî doktorên nexweşiyên hundirîn, bike. Paşê jî xebera reş ji me re hat. Nexweşîya wî kanser bû.

"Qatlîma Qamişlokê" jî tede, bi revayî şex çîrokên wî ji bo kişandinê amade bûn. Piştî mirina wî, bi taybetî Fatoş pir hewil da ku hinek ji wan projeyan bixin jîyanê. Lê ji ber pîrsa aborî ew kar neçûne serî. Niha jî têkiliyên min û "Weqfa Yılmaz Güney" li Stenbolê hene. Hîna jî hêviya me heye ku em beşek ji wan projeyan têxin jîyanê.

Bi Pêşgotina Gabar Çiyan

M. Yılmaz

NASNAMEYA

YILMAZ GÜNEY

Weşanên JÎNDAN

Derket!

Bikirin ! Bixwînin!

JI EDEBIYATA KLASÎK HELBESTÊN KURDÎ

AY DÎLÊ MIN....

FEQÎYÊ TEYRAN

Dil ji min nakit xeyalan
Bûme perwana şemalan
Bêrî ya husn û cemalan
Ay dilê min ay dilo

*

Can firîbim te nebînim
Deftera eşqê bixwînim
Serxweş û sekran û dînîm
Ay dilê min ay dilo

*

Serxweş û sekran û mestim
Efiyê eswed digestim
Sebr û aram çon ji destim
Ay dilê min ay dilo

*

Sebr û aram û sikûne
Bazî yê nav lê uyune
Dil ji pancan kirbû xûne
Ay dilê min ay dilo

*

Baziyê mekrê şikence
Girtibûm ez bi herdû pence

Min mudam dil jê bi rence
Ay dilê min ay dilo

*

Hêstirim barîn ji xwînê
Sotim ez derdê evînê
Kes ji min nakit yeqînê
Ay dilê min ay dilo

*

Dax û kovan bê hisabin
Mihnet û êş û ezabin
Xem ji qelbê min venabin
Ay dilê min ay dilo

*

Van xeman yekcarî xarim
Dîn kirim dînê bi hewarim
Agirê eşqê bijarim
Ay dilê min ay dilo

*

Agirê eşqê û pêtê
Herkesê dî kes nevêtê
Demekî nakit tebêtê
Ay dilê min ay dilo

Ay Dilê Min...

Demekî nakit qirare
Şev û roj ahî û zare
Ez xilas bûm bûme dare
Ay dilê min ay dilo

*

Sîneya hubbê herrişte
Bî agirê eşqê birrişte
Qet li min nayên nivîşte
Ay dilê min ay dilo

*

Sîneya hûb lê sidûre
Dax bi dil kovanê kûre
Wan hemiyan dil jê bi nûre
Ay dilê min ay dilo

*

Hemiyan agir di nav bît
Min ji daxa dil zirav bît
Bê hesab şîşe di nav bît
Ay dilê min ay dilo

*

Bê hesab şîş lê kişande
Hûr kir û misk lê reşande
Nezera zer şevîşande
Ay dil min ay dilo

Nezera sahib nezîra
Teşbîhî berqê di şîra
Dame ser gezmê di tîra
Ay dilê min ay dilo

*

Gezme ya cerg û hinavan
Hûrtira ejno û gavan
Tarr û marr kir bûm ji ravan
Ay dilê min ay dilo

*

Tarr û marr kir can û cismê
Pisyarî cîran û xizme
Ev illet babet tilisme
Ay dilê min ay dilo

*

Min û hê wesfê xwe hilda
Xweş misalî çûn di cilda
Cerh û kovan çûn di dilda
Ay dilê min ay dilo

Feqiyê TEYRAN

HELBESTÊN ALÎ BÎÇER JIN, ZEWAÇ Û JÎYAN

Wergêr : Lokman POLAT

JIN Û ZEWAÇ

îro
pênç sal bû ku min wê nedîtibû
di kuçê de rastê hevaleke xwe
hatim
li ser lingan em axîfî
zewiciye
berdaye
zarokê wê bûye
çîroka pênç salan
bi wê nemaye
porê wê spî bûye
qelew bûye
siyekî reş ketiye ser rûyê wê
ax çiqas guheriye
çiqas kalepîr bûye
jîneke zirav wek qeranfilê bû
helbestên azadîyê dinivîsand
folklorê gelêrî dizanibû
çeleng
sivik
wek çuçikê
şîn a kûr a azmên
hem mendîl hem welat bû
û stranên evînê digotin
niha laşgiran, reht, jîneke
kalepîr
ruhê jinekê
rûyê wê

jîyana wê
lênêrîna wê
hewqas tê guhertin
û herhal ev
ancax bi qudreta “zewacê” dibe
pirr li ber ketim
pirr

JÎYAN

bi aliyek kêr dibin
bi aliyek zêde dibin
bi aliyek kevn dibin
bi aliyek nûh dikin
xewnan

bi aliyekî hehecikê
mezin dikin û difrînin
bi aliyê din
hemû çuçikan re
dibe dar
sivînga gwêşî

li ser singên me şabûna bajarek
di çepilên me de dengdayina ru-
barek
stranên jîyana me dê bêt gotin
divê miheqeq hebe çîrokek
evînê

DERD

Eskerê BOYIK

Hêsîrim, hêsîrê vê dewra bêbextim
Bêcîme, bêwarim, bêpiştîm, bêtextim
Serê van rê-dirbê bêreme, bêîsaf
Xapandî, zerandî, bênav û risqetîm.

Lêyime bendkirî, pilingim qeydkirî
Ezmanda hepskirî teyrê kubarî bazim
Dora min telka çargoşe, çarkilît
Nêçîra kundê kor û roviyê fêlbaz im.

Bilbilim, dengê min bi zorê birîne
Rastî û guhdarya dinyaê kirîne
Axîn û kesera inka min nabêhen
Rem, îsaf, mêranî dinyaê firîne.

Ez xwayê birîn û kul û derdê giran im
Sînema Amûdê, Helepça wêran im
Çar alî lêdayî, mîna çiya sekinî
Welatê buhuştî, qeydkirî dêran im.

Dîrokê nehîştîye minra ax, emrê xweş
Welatê serbestî, asayî bi text, tac
Bextekî giranî pir dijwar daye min
Nav qilê evd - gurê serreşe ziyae.

Hêsîrim, hêsîrê vê dewra bêbextim
Bêwerim, bêcîme, bêpiştîm, bêbextim
Şerê van rê - dirbê bêreme, bêîsaf
Xapandî, zêrandî, bênav û risqet im.

HALABÇE

Sebrî Şermixî

Dagirkeran Halapçe şewitandin
wan bi çek ên kîmyawî bombe kirin
Jin, mêr û zarok ên Kurdîstan kuştin
Ev ne yek care ku xwîna me di rijînin

Roja şanzdeh ê avdarê em ji bîra nakin
Di vê rojêde Kurdîstan şewitandin
Ev rojekî reşe nayê ji bîrkirin
Ejdehaq ên nû Kurdîstan şewitandin

Ew dagirker ên tirk, ereb û ecem
Dest didin hevdû dijî gelê Kurdîstan
Her ew in qesasê Halapçe, her ew in
Her ew in qesasê gelê kurd, her ew in

Ey gelê cîhanê ma hûn jî dibînin
Tişt ên ku dagirker bi serê me tînin
Kanê ew dengê we? gelî demoqratan
Çima hûn îroj wisa bê deng dimînin

Ey şoreşger ên cîhanê hûn jî dibînin
Ku bi çek ên kîmyawî kurd hatin kuştin
Heçî kes ên demoqrata û şoreşger bin
Divê dijî vê tofana giran bin

Dagirkeran keç, jin, mêr û zarok kuştin
Wan bajarê Halapçe yê wêran kirin
Na mirin şehîd ên kurd û Kurdîstan, na mirin
Ew ê di xebata me de herdem bijîn

HILQERASÊ KURD

Laleş QASO

Bi rastî em miletê Kurd di demeke wilo de dijîn ku ser bûye "Allah" û bin jî bûye "Neûzûbillah!" Yanî em ketine demeke wilo, hin normên ku miletê me ew wek şeref û namûsê dizanîbû, gelek ji wan îro tam berevajî xwe bûne. Buhayê parastina van norman ya bûye qeşmerî û henekpêkirin û ya jî bûye kuştina mirov. Çi ne ev norm? Mixabin emê di vir de nikaribin wek ku em dixwazin bi nav bikin û li ser binivîsînin. Çimkî gava me li ser nivîsand, xwedêgiravî wî çaxî jî mijare wê ji edebiyatê dûr bikeve, bibe siyasî(!) Îcar ji bêgavî ezê van norman bi çîrokeke Kurd ve girêdim û di vê çîroka Kurd a herêmî de li xwe bigerim; daku edebiyata Kurd li pêşkeve(!)

Di dema ku serbazê artêşa îslamê Xelîfe Emer Îbnul Xetab bi artêşa xwe dikeve Kurdistanê, Kurdan di deryaya xwînê de difetisîne û Kurdistan tam bi awayê erebên çola Sahrayê talan dike, li Marînê (Gundekî Nisêbînê tarîxî ye) bi navê Daqeras Padîshahek û bi navê Hilqeras dêwekî Padîşah î pîrecêb heyê! Padîşah li himber Emer şer dike. Belê mixabin ji ber ku dêwê wî beşdarî şer nabe, Padîşah bi Emer re serî dernaxe têk diçe.

Daqeras bi hêviya ku rojekê dîsa li meqamê xwe vegere, digel dêwê xwe û çil fêrsên xwe ên bijarte bi çol û çîyan dikeve. Belê felek dîsa çep lê dizivire: Li çiyê keleş li wan didin der û hemiyan hêsîr digirin. Dêwê Padîşah Hilqeras di vê hengamê de jî desthilnayîne. Keleş hemiyan şilfîtaî dîkin û li wan

siwar tên, Hilqeras dîsa desthilnayîne. Keleş eşkencê bi wan dîkin, Hilqeras dîsa desthilnayîne. Keleş vê carê jî hemîyan bi potik û kindiran girêdidin û dest davêjin wan, yanî tecawizî wan dîkin. Bi dû ku herkes hatiye tecawizkirin, ji nû ve Hilqeras li xwe diqewimîne û xwe hildiqerêse: Potik û kindiran diqetîne, êrîştî ser keleşan dike û serê hemîyan bi carekê ve hildiqetîne!

Padîşah bi kelûgirî berê xwe dide Hilqeras û dibêje:

"Hey agir bi malê keto, madem ku tu ew zir dêw bû, îcar çima te ji serî de li xwe ne qewimand!"

Hilqeras pêştî di bin simbêlan re dibeşîşe, dûra dikene û dûra jî bi hoqeboq Padîşahê xwe dibersivîne:

"Wî çaxî hîn bêhna min teng ne bûbû, ez ne qeherî bûm ji ber hindê min deng ne dikir! Ez ne mirovekî ku hema wilo zû hêrz bibim û xwe bavêjim nav çavên zigurd û pêxwasan. Padîşahê min li qusûrê nenere, hebana min hinekî fireh e ez zû tije nabim."

Padîşah:

"Bi rastî mirov nizane çi ji te re bibêje Hilqerasê ne qerast! Ma wê mirov her tim çawa bikaribe Padîshahekî û bi çil fêrisên xwe ve ji te re peyde bike; Padîşah û van çil fêrisan li xewlecihekî têxe nav lepên keleşan; bila keleş wan şilfitazî bikin, li wan siwarên, eşkencê bi wan bikin û dûra jî destbavêjin hemîyan heta ku bêhna te teng bibe û tu li xwe biqewimînî ha!"

"Padîşahê min bibexişîne, pêwîst nake tu ewqasî barê min giran bikî. Kesî em ne dîtî tişt nabe. Carek bû me hemîyan bi hev re da û çû bi dû nekeve. Belê îcar Padîşahê min di esasê xwe de ê neheq tu yî. Ma te nizanîbû ku ez ji malbata dêwên Zir Ehmeq bûm? Ez zû b' zû b' xwe şyar nabîm. Ma tu fêm dikî bê ev ehmeq lawê ehmeqan ç' dibêjî? Gava te piştî xwe bi min qewîn kir, gerek te ez nas jî kiribama. De ka ji min re bibêje bê evên ku destavêtî me ji kîjan miletî bûn? Bibêje daku ez tenterûs ji wan bernedim; hemîyan bikujim û malên wan bi te bihêlim!"

Padîşah bi dû ku ji Hilqeras re;”Evên ku destavêtin me ereb bûn,”dibêje, digel dêw û fêrisên xwe ve rast berê xwe didin çiyayê Marînê û bi rê dikevin. Daqeras bi dêwê xwe emin e. Dizane gava ku dêwê wî serî hilde, wê tu hêz nikaribe li himber wî raweste!

Padîşah di wextekî kurt de digel dêw û fêrisan xwe digihînin mentîqê. Es-habeyên Emer bi selewat û tekbîran êrîşt ser wan dikin. Belê dêwê ku hîn kelgerm bû yanî Hilqeras, darên kevnare ji qurm de radike wek rîman dixebitîne û xwe çeng dike ser wan. Ji pîkol û hengama wî xîram di bin lingan de diherifin, newal ji zixur û kevîran mîşt dibin! Hilqeras radêhe latên mîna ferên aşan, taht û rizdên zînanan û bi ser wan de werdike. Ji vizîniya derbên wî çiya dihejin! Diranan bi ser hevûdin de disû, mîna volkanan agir ji devê wî dipijiqe! Qîran dide, bahoz radibe! Pîf dike, cendek li hewa dilîzin! Teba ji tîrsa xwe berdidin binê heft tebaqên erdê! Teyrûtilûr hildikişin ser ewran! Ji ber xezeba wî temamê cin û pîrebok ji Kurdistanê bi bazdan direvin Meke û Medînê; dev ji dînenên xwe berdidin û hemû li wir dibin misilman!..

Di dûmahîkê de Emer fîlîfîlî ji mentîqê direve û Daqeras dîsa dibe Padîşahê Marînê.

Ji aliyekî de Kurdotirkên destbiçek û ji aliyekî de jî tirk û ereb û farisan, Kurdistan xistine hesara xwe û bêwestan hem Kurdan talan û hem jî ji şexsiyet dikin..! Belê mixabin bêhna rêvebirên ku bi hemû awayên xwe Kurd bûn hîç jî teng nabe; yekitiyê çênakin û êrîşt ser dijmin nakin! Bi rastî meraq dikim, eger di vê dema ku çarhawêr agir bi ser serê Kurd de dibare, bêhna rêvebiran teng nebe û li xwe neqewimînin, gelo wê kengî bêhna wan teng bibe û li xwe biqewimînin!!

Serpêhatiya Sozdarê

A. Ç. Canpola

Rojekê ez di kolanek ji yên bajarê Berlînê de dimeşiyam, hima ji nedî ve min dît kalemêrek û jineke navsere bi ser min de hatin, li himber min rawestiyan û bi min re axivîn. Ez wê gavê ji kar dihatim û diçûme malê; Kalo dest bi axavtinê kir û ez jî pê re şitexilîm lê me tiştek bi serê hev nexist. Piştî mayîneke duvedirêj li ber kalo ez tê gihîştim ku ew li navnîşana kurê xwe digere. Dema axavtina bi kalo re, ez tê derdixim ku şitexaliya wî gelekî li xweşa min tê û dilê min timî xwe bi ser Kalo ve dide. Ji ber ku ew ji nav evqas kesan hate cem min û ji min alîkarî xwest ha ha ye dilê min ji hêlîna xwe derkeve û here sipasiya Kalo bike. Dema ku min Kalo û jina wî bi wan cilên ku li vî bajarî tinebûn, dîtî ramanên min ez bîst salan bi şûnde vege randim. Ew ramanên ku bûne şîrikê jiyanê min, yek kêlîkekê jî ji min dûr nakevin û min rehet nahêlin. Ez pê dihisim ku min tiştekî pir girîng ji jiyanê xwe wenda kiriye, lê ew çiye ez nizanim? Erê vî kalemêrê xerîb dîsa ramanên min şîyar kirin û min xistin nav kul û xemên wendabûnê.

Di wê navê de Kalo pelîkekî kaxiz ji berîka xwe derxist û da destê min; ew numreya telefûna mirovekî gundiyê Kalo bû. Her ku diçû alîkariya Kalo hê bêhtir bi min xweş dibû, lê min nedizaniyê bê çima ez weha aşîqî alîkariya van herdu kalan dibûm. Bes tiştê min dizaniyê ew bû ku çendî diçû alîkariya van

herdu kalan hino hino bi min şêrîntir dibû, încar ka sedemê vê yekê çi bû min tê dernexist, belkî ji ber ku bihna dê û bavê min ji wan dihat loma, ew dê û bavê ku felekê ew ji destê min birin û li vî welatê xerîb ez bê xwedî û xwedan hiştim. Gelo çima feleka bêbext û xayîn weha bi serê min kir.

Pîştî ku min telefûn da mala gundiye Kalo û navnîşana wan sitand min hedu pîr bi xwe re hilanîn û berê xwe da mala Hesretê kurê Biroyê gundiye Kalo; mala Hesret qedirekî pir ji me re girtin. Dema min herdu kalan gihand qonaxa wan êdî ez vegeyîyam malê, lê ya zor ew bû ku wê çewa sebr û hedana min êdî bê wan bihatina, çiku xeyalên min her min dizivirandin cem wan û ji wir jî dibir zarokiya min. Gelo çima xeyalên min ji min nedigeriyan? Ma dibe ku felekê tiştêkî giring ji jiyana min biribe? Min kir û nekir sebr û hedana min bê wan nehat, ez roja din neçûme kar û min berê xwe da mala Hesret lê mixab in herdu ixtiyar ne li wir bûn, Hesret bi xwe jî ne li mal bû û ji ber ku jina Hesret, Zozanê, jî bi Almanî nizanibû ez li benda zarokên wan mam heyanî ku êvarê ji dibistanê hatin. Bi alîkariya zarokan ez tê gihîştim ku Kalo çûye mala kurê xwe, Çeto. Gava min cihê kalo bihîst min tê derxist ku dilê min dixwaze ji tirimbêlê derkeve û here ba Kalo. Min pêl gazê kir lêbelê mîrata tirimbêlê jî qet bi lez nedîçû. Ez tê nedigiham bê gelo ez çima wusa bi lez bûm? Min nedizaniya ku ez çewa tirimbêlê diajom û xeyalên min jî hîç ranediwestiyan, her min ber bi zarokiya min ve dikşandin û ez jî li dûv wan diçûm. Dema ez hatim ser hişê xwe, ez pê hisiyam ku ev sê rojin ez di nexweşxanê de me. Çewa ez ji nexweşxanê derketim min rast berê xwe da mala Çetoyê kurê Kalo. Min nizanibû ku çima dîtina herdu kalan weha ji min re bûye kul û meraq? Ez sed pîrsên weha ji xwe dipirsim: Ma Kalo ji bo min çi ye? Çima ez weha aşîqê dîtina Kalo me? Û yên weha. Gava ez derbasî mala Çeto bûm û min herdu pîr dîtî weke ku min dê û bavên xwe dîtîbin. Bi rastî min dê û bav jibîr kiribûn lê wextê ev herdu kal hatin cem min dîsa dê û bavên min anîn bîra min û min xistin nav kul û xemên wendabûnê.

Heyamê diya min mir hê ez çar salî bûm, rengê wê baş nedihat ber çavên min, lê dema bavê min mir hingê ez dozdeh sêzdeh salî bûm û loma jî hê rengê wî ji ber çavên min neçûbû. Piştî mirina bavê xwe heyanî emrê min bû bîst û heft sal, ez li ba jinbava xwe Mariya (jineke Almanî) mam. Dûvre ez bi mêrekî Almanî re zewicîm lê hê jî ez navê bav û diya xwe û yê malbata wan baş dizanibû.

Dema Kalo jî ez dîtîm pir kêfxweş bû û min li cem xwe rûniştand. Ez tê nedigiham bê vê feleka malxirab çi ji min dizibû û çima ew herdu kal weha diçûne dilê min? Ma çima mala Çeto wusa li xweşa min dihat? Belkî ji ber

ku xwediya malê timî bi min re devliken bû loma, ger na nexwe wê ji ber çibûna? Min ev yek hertim ji xwe pirsdikir lê dîtina bersîvê ne hêsayî bû. Li herçar dîwarên odeya mêvanan ya mala Çeto fotoxraf daleqandî bûn. Min li wan temaşe kir û rismê bavê xwe jî di nav wan de dît, ez rabûm û demeke dirêj li bin fotoxrafê bavê xwe rawestiyam lê min yê diya xwe ku ew jî pê re bû, nasnekir. Ez dîsa ketim nav xem û xeyalên xwe, di nav wan de wenda bûm û ji wir bi dûr ketim, lê vê carê hêstir wek baranê ji çavên min xulxulîn û hatin xwarê. Min xwest ku ez li ser vî fotoxrafî hinek pirsan ji Çeto bikim lê wî bi zimanê Almanî nizanibû û ji ber vê yekê jî, bi hêviya ku zarok mexseda min pêk bînin ez li benda wan sekinîm. Çaxê zarok hatin malê min bi alîkariya wan pirs kir:

-Navê xwediye vî rismî çi ye? Jina Kalo bersîva min da û got:

-Ev Mehmûd e, kurapê Kalo ye, ya bi wî re jî xwuşka min, Nazê ye û jina Mehmûd e.

Bi gotinê re hêstir ji çavên wê hatin xwar û xwe berdan ser ruyê qermiçî. Wê car din li min mêzekir û dîsa axift:

-Çavê min birije herdu jî li vî welatî mirin; bi tenê qîzeke wan hebû lê hîn tîfal bû û wenda bû, em nizanin bê gelo sax e an mirî ye?

Min zû bi zû bersîva wê da û pirsî:

-Ma navê qîza Mehmûd çi bû?

-Sozdarê ji vê lempê Xweşiktir bû! Min rabû paseporta xwe derxist û da destê kurê Çeto, wî ew ji wan re xwend û got:

-Yabo, navê vê jinika Almanî weke navê xwuşka min e, Sozdarê ye. Navê wê Sozdar! Tev bihitî man. Herdu pîr ji cihê xwe rabûn min himbêz kirin û em tev bi vê dîtina Sozdar kêfxweş û şa bûn. Piştî min xwe dît û eslê xwe naskir karê min yê pêşî ew bû ku min xwe fêrî zimanê xwe, Kurdî kir. Ez hêvî ji dê û bavên Kurd yên li welatê biyanî giş dikim ku li zarokên xwe miqate bin, da ku kesekî din weke min wenda nebe û ew agirê ku ev çend sal in di dilê min de ye nekeve dilê kesekî din.

A. Ç. Canpola
Almanya

HEVPEYVÎN

H
e
v
P
e
y
v
î
n

bi
Aydîn OZTURK
re

H
e
v
P
e
y
v
î
n

HEVPEYVÎN

Helwestvan Aydın OZTURK

*niha berpirsiyariya Radyoya "Ekîn" dike û alîkariya kovara
"Berfîn BIHAR"ê dike. Ew li Stenbolê dijî.*

- Ji kerema xwe re hinekî qala xwe ji me re bike?

-Ez, 1955 de li Dersîmê hatim dinê. Min, xwendina seretayî û navîn li wir û li Elezîzê kir. Û di sala 1973-74 de li Fakulteya Erziromê (Îşletme fakultesi), dest bi xwendinê kir. Tekoşîna li hember mêjîyê paşverûtîyê bû sedem ku ez, ji awira polîtîk ve bêm nasîn û derkevim pêş. Vê, perwerdekirina min xist tengasiyê. Wê demê hikumeta Ecevit kesên çep dişand unîversîta Izmirê. Nasnameya min a polîtîk û radîkal bû sedem ku dewlet li min bigere. Vê rê li xwendina min girt. Di sala 1980 de, heqê min ê xwendinê nema.

Piştî 12 îlonê hat. 1983 de ez hatim girtim û dadgehkirin. 6 salê min di hepsa leşkerî de derbas bû.

Dawîyê, ez li kehnîya xwe a kevn ku berê xwe dida karê edebî, vegeyîyam. Niha jî di nav ava wê de ez sobeberîyê dikim.

- Kengî û çawa we dest bi nivîsandinê kir? Hinekî qala berhemên xwe ji me re bike?

- Ez bawerim, bi edebîyatê re li gund, di dema bavê min di ber kemançê, bi dimilî çîroka Kerem û Aslîyê ji me re distirand, em pêrgî hevûdu bûn. Paşê jî

stiranên dengbêjan ku bi saetan didomîya û agir berdida nava mirovî, tê. Min jî beşek ji wan jiber kiribû û distirand. Min, carna jî beşek ji stranê jibîr dikir û ser dadigirt. Ez bawer im ku min û helbestan bi vî şiklî hevûdu nasî.

Di dema xwendina xwe a lîseyê de, di nava klasîkên edebî de ez çûm û hatim. Efsûnkarîya nivîsandinê jîyana min xiste bin tesîra xwe. Helbestên min yên destpêkê li ser rûpelê rengîn hatibûn nivîsîn û ew pel, di nava rûpelên pirtûka min de, di gel pelên gulan yên hişk de man. Gava polêsan girt ser mala me û dest danîn ser romana min û dosyek ji helbestên min, wê gavê agir bi nava min ket.

Di salên zîndanê de, her ku min fersend dît, pênuş û kaxez bi dest dixist, min xwe bêhtir kûr kir û nivîsand. Her ku wan talan dikir, min bêhtir dînivisand. Gelek caran dest danîn ser karên min û ji holê rakirin. Lê min rê li vê girt. Min helbestên xwe di mêjîyê xwe de kola, têde bicîh kir. Gava ez ji hepsê derketim, di kîsikê min de romanek, di bîra min de tomarek ji helbestan hebû.

Pirtûkên min yên derketine ev in:

- Yanardağ Sığağında (Di Ber Germbûna Çîyayê Agir de, bi tirkî, helbest), Ekin Yayınları
- Bilirim Dayanır Yürek (Ez Zanim Wê Dil Samax Bike, bi tirkî, roman), Berfin yayınları
- Derin Nehirler Gibi (Mîna Çemên Kûr, caribandin, bi tirkî), Barfin yayınları
- Bir Sevgi Kırılmasaydı (Hezkirinek Nehatiba Şikandin, bi tirkî, helbest), Berfin yayınları
- Ağıtlara Yazıldı Zaman (Dem Li Lorandinan Hatî Nivîsîn, bi tirkî helbest), Berfin yayınları
- Yıkık Duvarlar Gibi Kaldı Gözlerim (Mîna Dîwarên Ketî Ma Çavên Min, bi tirkî, helbest), Berfin Yayınları

Ji bilî van di destê min 5 dosyayên kar hene. Bi ihtîmalek mezin, ji niha û nêz ew jî wê derkevin.

- Hûn rewşa ziman û edebîyata kurdî ya îro çawa dibînin?

- Ji mecbûrîyetê jî bê , gava mirov rastîyê binê zimên hinek zehmetî têne pêşîya mirov. Ev bi peyvên "yên li hemberî te jî zanin. Ma çima tê bêjê?" tê rawestandin. Lê dîsa jî ez dixwazim bêjim: Mirov di çerçova ziman de difikire. Li hember sîstemekê derketin, anjî hevkarîya pêre, pêşî di zimên de form û şikil distîne. Di vê hengavê de, karê wêjekaran diwartir dibe. Ji ber ku ew ji zimanê rojane bêhtir, çekirê zimanê muxalîf in.

Ez, di nav cureyên edebîyatê de bêhtir di helbestê de ez xwe kûr dikim. Duv re jî ceribandin. Ev beş, di elaqatên nav hunermed û zimên de, cîhê herî gring digre. Gelek tabîî ye ku, di kîjan zimanî de ez xurtbim, difikirim û xwe kûr bim, bi wî zimanî ez ê berhemên xwe bafirênim. Îro ez bi tirkî difikirim û ez pê dinîvisînim. Ez bi kurdî nikarim binîvisînim û pê, xwe baş îfade bikim. Ji xwe, ji awira rêziman û hwd. de ez xwe pir qels dibînim. Gelo wê emrê min têr bike ku ez bi kurdî bifikirim û bi kurdîyek muxalîf binîvisînim? Ez nizanîm! "Bi kedê her zehmetî dikarin bên çareserkirin!" çiqasî rast be jî, ma gelo ez ê karîbim pê nûsa bisekinînim.

Piştî ku min cîhê xwe di nava kurdî de dîyar kir, ez dixwazim werime ser pîrsa we. Ziman û edebîyata kurdî, di pêvejoya dîrokê de, ne bi nivîs, lê bêhtir bi dev hatiye roja me û bi xwîn û goşt bûye. Qirkirin, talankarin û dagîrkirin dora wê pêçaye û nahêle bi azadî xwe bi pêş bixwe. Dîyar e ku edebîyata zimanê qedexekirîkirî, di rewşek wesan de, wê bikûle û bimeşe û bi awayekî ku dil dixwaze wê xwe dernexîne pêş. Berhemên nivîsandî yê bihêz û edebkarên mezin, bi rîya ku mêjîya bişon û ji holê rakin, xwestin ji welatê ku têde şîn hatiye, ji kokê rakin. Zimanê ku ajotibûn ber bi çîyan, li wir ji alîyê dengbêjan ve hate jîyandin. Wan, gelek awaz di bin mêjîyan de bicîh kirin. Guhdarên wan, ew berhem jiber kirin. Paşê jî bi lorî, stiran û çîrokan ev dar şîn bûye û şax avêtîye. Lê şaxên vê darê, di dîrokê de gelek caran hate birrîn. Ew ê jî berxwe da û careke din şîn bû, kokê xwe berda kûrîya erdê û şaxên xwe stûrtir kir.

Belê, îro ew şax stûrtir bûne. Bi vê ziman û edebîyata kurdî pêştir dikeve. Di şerê azadkirina nasnamayeya xwe de, edebîyat û ziman jî birînên xwe derman dikin û pêş dikevin. Berhemên edebî tîn çapkirin û belavkirin. Xwendevanên wan berhemên her ku diçe zêdetir dibin. Edebîyata ku ji dev bo dev hatiye heta îro, di demeke kin de dikeve ser rûwê pelan. Niha zimên, xwedîyê xwe û enstîtuyê ye û wêneyek zimanê rûniştî heye.

Di roja me de, munaqêşeyên li ser zimên çêdibe. Ev, ji gelek awiran ve sudên xwe hene. Û îşareta wê ye ku ziman xwe li ser nigan digre û li şiklê xwe yê bihêz, yê ku xwe pê bîne zimên, distîne. Ev tevlihevîya dîtinan ku li derheqa zimên de xuyanî dike, di eslê xwe de îşareta pêşerojek ronî û dewlemend e.

Ji bilî vê jî, munaqêşeyek li ser nivîskarên kurd ku bi kurdî nafikirin û berhemên xwe yên edebî bi tirkî dinîvisînin tê kirin, heye. Pêwîste ne bi çavê politîkarên pragmatîk li pîrsê bê temaşekirin. Divê berhemên wan hunermendan, di çarçeveya nasnameya wan de bînin nîrxandin. Ji ber rastîya me ya netewî û ji ber ku em bi zimanekî din difikirin û dinîvisînin, pêwîst e em li derve neyên dîtin. Peyv, gava berpisîyartî û rastîyê bîne zimên, bi wate ye.

- Ji bo pêşerojê çi planên we hene?

- Bersiva min a klasîk ew e ku, bieşq ez nêzî nivîsandinê dibim. Ez, di pêşerojek ku bi vê ve girêdayî be dikarim dilxweş bibim. Ez vê hinekî jî bi wateya erk û wezîfeyên ku dikeve ser milên edebkaran ve girê didim. Hinek dikarin bêjin ku ez şaş difikirim. Lê baweriya min ev e: Tiştê ku etîka wê tune be, xweşikbûna wê jî nabe. Gava ez bi evînî nêzî nivîsînê dibim, ez etîkê jî di nav de difikirim. Pêşerojek e ku têde hîsên ji bo edaletê winda nekim, dixwazim. Û hewl didim ku utopya xwe, bi îqtîdarekî qirêj winda nekim. Ku ji alîyê nerastîyê ez hawîrdor bêm pêçan jî, ji bo rastîyê divê bi israr bim. Divê hewil bidim ku di nav şewqên medyayê de, xwe winda nekim. Gava pênusa min bikeve pey popîlîzmê, şikandina wê pênûsê bibe karek ji min re. Ji bo bûna muxalîfbûnê, çi were serê min, ez poşman nebin. Ev tev, di jîyana min de bendên biwate ne. Tiştên ku ez binivîsîninim, di vê çarçevê de, wê demê li nik min, wê karên min bi wate be.

Têbinî : Ev hevpeyvîn bi tirkî ji bo “Antolojiya Edebiyata Kurdî - Cîld - 3 ” hate çekirin. Gabar Çiyan vê hevpeyvînê ji tirkî wergerand Kurdî.

Em li jêr helbestek Aydin Ozturk bi Kurdî diweşînin.

Neynikek şikest

eynikek şikest
li hemberî wê ez sekinîbûm
rûwê min belav bû
di wan perçeyên hûr de
hemû deverên min

ku ez bighêjînim hev jî
wê şop têde bimînin
ji deverên bi birîn û xwîn

ku ez bighêjînim hev
wê çi kesek nizanîbe
ku ez ji bo te digrîm

Helbestvanê Kurd Mazhar KARA

*M*azhar Kara, di sala 1964'an de li bajarê Muşê, qeza Kopê (Bulanik) gundê Melemistefayê hatiye dinê. Bavê min mela bûye. Gava ku êdî ew berfemî xwe bû mala wan hatibû Çawirma Xelîlaxa. Çawirme gundekî Tatosê (Tekmanê), Tatosê Erzerumê ye. Mazhar li wî gundî dest bi mekteb û medresê kir. Di du çend salên feqîtiyê re wî dest bi xwendina mektebê kir û mekteba ewil û ya navîn, li Tekman û Erzerumê û mekteba bilind jî li bajarê Diyarbekir xwend.

Mazhar Unîversîta Dîclê, fakulta Fenê, beşa muhendîsiya Fîzîkê qedand. Di salên xwendevaniyê de ew jî ber sedemên siyasî du caran hate girtin, di çerxên eşkenceya romê re derbas bû. Her carê çar meh jî hepis raza.

Niha, dîsa li Diyarbekir di govendê de ye. Jiyanê wî li wir berdewam e; ruhê wî bi rehên vî bajêrî dimije.

*K*alikê wî xwenda û bavê wî melayê medresê bû. Ji ber vê yekê ew zû hînê xwendin û nivîsandinê bû. Kalikê wî şêrên Melayê Cizîrî pir xweş dixwend û bavê wî şêrî dinivîsî. Wî jî piçûktiya xwe de wana guhdarî

dikir. Şêîrên Cizîrî û dengê kalikê wî, li ser wî tesîrek mezin çêkirin. Kalê wî dixwend û bavê wî jî bi krmancîya xwe ya zela, ew jî wan re şîrove dikir.

Paşê, şêîrên Cîgerxwîn gihîştin wan. Wî ew jî kovar û kitêban verdigirt, dikişand deftera xwe ya mektebê û wan jî ber dikir. Nivîsên wî ên ewil ew bûn. Paşê di salên mekteba navîn de wî hêdî, hêdî dest bi nivîsandina helbestan kir. Wî ew çax hin bi tirkî û him jî bi kurdî dinivîsî. Belê, wî jî wek geleka berhemên xwe yên wê wextî, yên demên zarotîyê qelişand û avêt. Ji sala 1987 an û virde helbest û maqaleyên wî, pirên wan bi navên din, di hinek kovar û rojnameyan de têne weşandin.

Heta îro du heb kitêbê wî yên şêîrê hatine weşandin. A yekemîn a bi navê “Rojeva Evînê” , di sala 1993 yan de di nava weşanê Govendê de derket. Ev kitêb beşek jê bi tirkî, ya din jî bi kurdî ye. Kitêba wî a duduyan ya bi navê “Arîya Demsalê Ez im”, sala 1995 an, di nava weşanê Govendê de û bi pêşgotina Mehmed UZUN derket. Ji xêncî van kitêban qasî 80 - 90 hebî jî maqaleyên wî, di hinek kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Û jî bo hinek berhemên nû jî xebata wî berdewam e.

Di rojnama Hêvî, rûpela çand û hunerê de dinivîse. Li alî din, amadekirina kovara Govend heye. Di vê xebatê da jî xwê û xwîdana wî heye. Hetanî niha 13 hejmarên Govendê hatine weşandin.

Mazhar KARA

ROJEVA EVÎNÊ

Helbest

Weşanên Govend

“ZIMAN Û ROMAN”



Têkiliya ziman û romanê bi hevûdu re gelek girîng e. Romanek baş li ser zimanek edebî têt honandin. Qelsî û bedewiya romanê di hêlek de bi ziman ve girêdayî ye. Edebiyat bi zimanê edebî pêk tê.

Dîtinên romannivîseran yên li ser ziman û romanê balkêş in. Gelek başe ku mirov di derbarê ziman û romanê de dîtin û nirxandinên romannivîserek bixwîne. Di pirtûka “Ziman û Roman” de romannivîser Mehmed Uzun dîtinên xwe tîne zimên.

Ev pirtûk di na weşanên “Çanda Nûjen” de hatiye weşandinê. Pirtûk 152 rûpel e û ji hevpeyvînan pêk tê. Rojnamevan Muhsîn Kizilkaya ji bo pirtûkê pêşgotinek nivîsiye. Ev pêşgotin ji alî Gabar Çiyan ve ji tirkî hatiye vergerandin.

Hevpeyvîna yekem bi sernivîsa “Nivîskarî û Romana Kurdî” dest pê dike. Vê hevpeyvînê Fener Rojbiyanî bi Mehmed Uzun re çekiriye. Ev hevpeyvîn gelek dirêj e. Hevpeyvîna herî dirêj a di pirtûkê de ye. Ev hevpeyvîn li ser navê kovara PIRS hatiye çekirin û di kovara REWŞEN’ê de hatiye weşandinê.

Hevpeyvîna duyem bi sernivîsa “Dema Nû, Ronesans, Edebiyat û Romana Kurdî” hatiye weşandin. Vê hevpeyvînê Firat Cewerî bi Mehmed Uzun re çekiriye. Ev hevpeyvîn di kovara Nûdem hejmara dehan de derketiye.

Helbestvanê Kurd Mazhar Kara li ser

navê kovara GOVEND'ê bi Mehmed Uzun re li ser pirsar "Çima Romana Kurdî?" hevpeyvîn çêkiriye. Ev hevpeyvîna sêyem e a di pirtûkê de. Nivîskarê rojnameya ROJ'ê Yakup Karademîr jî li ser "Çima Babetên Menzûm Pêşketine û Yên Nesîr Pêşneketine?" bi Mehmed Uzun re sohbetek baş çêkiriye. Ev hevpeyvîn di rojnameya ROJ'ê de hate weşandin. Seyidxan Kurij jî hevpeyvînek bi Mehmed Uzun re çêkiriye û vê hevpeyvînê di kovara HEVDEM'ê de weşandiye. S. Kurij li ser berhemên Mehmed Uzun pirsîyaran jê kiriye.

Nivîskar û gerînendeyê kovara Nûbihar'ê Sabah Kara "Di Zimanê Nivîskîda Girîngiya Medreseyên Kurd Çiye?" jî Mehmed Uzun pirs dike. Ev hevpeyvîn di kovara Nûbihar hejmara 15'an de hatiye weşandinê.

Serdar Roşan li ser romana Mehmed Uzun a bi navê "Bîra Qederê" û di derheqê rewşa ziman û edebiyata Kurdî de bi Mehmed Uzun re hevpeyvîn çêkiriye. Ev hevpeyvîn jî bo radyoya Kurdî -Radyoya Aştî Li Stockholmê- hatibû amadekirin. Hevpeyvîna dawîn jî -di pirtûkê de

heşt hevpeyvîn hene- rojnamevana tirk Semra Somersan bi Mehmed Uzun re çêkiriye. Ev hevpeyvîn bi tirkî di rojnameya "EXPRESS"ê de hatiye weşandin. Wergervanê kovara Helwestê N. Zaxûranî vê hevpeyvînê jî tirkî vergerandiye Kurdî.

Weşanxaneya Çanda Nûjen van hevpeyvînên ku di kovarên cuda de hatine weşandin berhev kiriye jî wek pirtûk jî nûh ve weşandiye. Dibe ku gelek xwendevan van kovarên cuda nebînin, nexwînin. Di vê pirtûkê de hemû hevpeyvînan dikarin di carekî de bixwînin.

Me bi şeweya înfomatîk pirtûka "Ziman û Roman" da danasîn. Em li ser naveroka pirtûkê nesekînîn û me analîza dîtî û nirxandinên-şîroveyên- Mehmed Uzun nekir. (Lê, em dikarin viya bibêjin ku; ev pirtûk jî alî naveroka xwe ve pirtûkek başe, naveroka wê dewlemend e.) Ji bo ku em bala xwendevanan bikşîn ser pirtûkê, loma me agahdariyên înfomatîk derxist pêş. Em hevî dikin ku xwendevan naveroka pirtûkê meraq bikin û pirtûkê bikin û bixwînin.

Hûn dikarin pirtûkê jî navnîşana Weşanên Çanda Nûjen bixwazin.

LORÎ LORÎ CEMBELÎYÊ MIN LORÎ

Lokman POLAT

Ez hêj piçûk bum, apekî min hebû, ji me zarokan re çîroka Cembelî digot. Apê min navê kurê xwe jî Cembelî danîbû. Li gor qalkirina wî, evîna cembelî û Binevşa Narîn gelek xweş bû. Paşê dengbêj Mahmûd Kizil plak -selik- derxist û tê de kelama -strana- Cembelî digot. Me vê kelmê -stranê- bi dilxweşî guhdarî dikir. Di nabeynê de 30 sal derbas bû. Min xeynê strana Mahmûd Kizil a bi navê Cembelî û çîroka ku apê min ji min re qal kiribû, di derheqê çîroka Cembelî de tu nivîsek nexwend, ji tu kesî çîroka wî guhdarî nekir.

Gava ku ez pê hesiyam pirtûka Îhsan Çolamergî a bi navê "Cembelîyê

Kurê Mîrê Hekaryan" derketiye gelek keyfa min hat. Û carekî din piçûkatiya min kete bîra min. Dengê apê min û dengê strana Mahmûd Kizil kete gohê min.

Min van rêzên jorîn beriya ku ez dest bi xwendina pirtûka Îhsan Çûlemergî bikim, nivîsand. Beriya xwendinê ez dixwazim bînim bîra xwe, gelo çîroka Cembelî a ku apê min qal dikir çawan bû? Baş nahê bîra min, 30 sal berê bû, û ez wê gavê heft - deh salî bûm. Qasê ku tê bîra min; Dilê Cembelî û Binevşa Narîn dikeve hevûdu. Lê bavê Binevşê wê nade Cembelî, wê bi yekî din re dizewicîne. Ji Binevşê re

zarok dibe. Lawe. Binevş navê wî Cembelî datîne. Binevş bebikê dike dergûşê û jê re disitire, kelaman, stranan dibêje. Cembelî tê dixwaze ku Binevşê birevîne, bibe. Binevş di nav herdu Cembelîyan de dimîne. Ew tercîha xwe li alî kîjan Cembelî dike, ez nizamim, ji wê pêve nahê bîra min.

*N*iha em binêrin di pirtûka Îhsan Çûlemergî a bi navê “Cembelî - Kurê Mîrê Hekaryan” de çîroka Cembelî û Binevşa Narîn çawa ye û dawîya wê çawan diqede. Ez dê bi kurtahî behs bikim.

*B*inevş keça Faris Axa ye. Birarzê wî Ahmed xwazgîniyan dişeynê û Binevşê ji Faris Axa dixwaze ku pê re bizewice. Fariz Axa naxwaze Binevşê bide Ahmed. Şertekî zor davêje ber Ahmed. Fariz Axa dibêje: “Divê Ahmed biçe ji Baedra Şêxan hespê Şêx Xelefê Yezîdî Qule û zîn û lixavên wî yên zêrîn di sê mehan de bîne. Ez dê wê demê tiştêkî ji we re bibêjim.” Ev şertê ku Fariz Axa davêje ber Ahmed, şertekî gelek zor û zehmet e. Ev rê riya çûndina zîndan û mirinê ye. Dayika Ahmed ji Ahmed re dibêje vê şertî qebûl neke. Ez dê keçikek din ji te re bixwazim û bînim. Lê Kurd înadî Ahmed digire, Ahmed ji ber înadê dibêje ez dê biçim hespê bînim û bi Binevşê re bizewicim. Ahmed ew şev bi xew û xeyalan derbas kir û roja din rabû li hespê xwe suwar bû û berê xwe da Baedra Şêxan.

Cembelî kurê Mîrê Hekaryan, kurê Mîr Yezdanşêr e. Navê dayika Cembelî jî Rêzbar Xatûn e. Rêzbar Xatûn jî keça Mîrê Xoşabê ye. Ew jineke şêrejîn û aqilmend bû. Rêzbar Xatûnê jî wek her dayikan ji kurê xwe Cembelî gelek hez dikir. Tenê kurekî wê hebû, ew jî Cembelî bû. Ji bo wê jî Cembelî nazdarê wê bû.

Cembelî û Reşo hevalên hevdu ne. Navê hespên wan jî Xemrevîn û Leylê ye. Herdu bi hev re li hespên xwe suwar dibin û diçin di zozanên Hekariyê de digerin, nêçîra pezên kûvî dikin. Piştî nêçîrê Cembelî û hevalê xwe Reşo diçin zomên Koçeran. Cembelî ji Reşo re dibêje min nav û dengê rindî û bedewîya keça Fariz Axa, Binevşa Narîn bihîstiye. Em biçin zomê wan, em biçin bo dîtina wê.

Cembelî li ser kanîya ber zomê Binevşê dît. Binevş wek kewekê gozel, wek xezalê rind, xweşik û sîpêhî bû. Binevş gul bû, nêrgiz bû, rîhan bû. Herduyan gava hevûdu dîtî heşê wan ji serê wan çû. Ew wek ku di xewnekê de bin. Di cî de dilê herduyan dikeve hevûdu. Xeleka yekemîn a zîncîra evînîya wan dest pê dike.

Piştî vê hevdudîtina Cembelî û Binevşê, Cembelî û hevalê xwe Reşo vedigerin tîn malê. Cembelî ji diya xwe re dibêje ku dilê wî ketiye keça Fariz Axa, Binevşê. Diya wî li dij derdikeve “Tu kî yî, keça koçerê kê ye? Dema gelê deverê bibêje ‘Mîr

Yezdanşêr keça koçerekê ji kurê xwe re aniye' ji bo me mirin e."

Cembelî jî dibêje ew jî însan in, ew jî Kurd in. Û bi diya xwe re gelek dirêj diaxife û wê îqna dike ku ji bavê wî re vê tiştî qal-behs- bike. Diya Cembelî ji bavê wî re qal dike ku dilê Cembelî ketiye Binevşê keça Fariz Axayê koçer. Lê bavê wî qebûl nake ku Cembelî bi Binevşê re bize-wice.

Cembelî û diya wî hinek giregir û axalerên eşîran dişeyinin cem Mîr Yezdanşêr ku wî îqna bikin û bihêle Cembelî bi Binevşê re bizewice. Çend Axa diçin cem Mîr. Egîdê Bengîn bi Mîr Yezdanşêr re axafti-nek gelek baş dike û wî îqna dike. Mîr qebûl dike ku biçin Binevşê ji Cembelî re bixwazin.

Mîr Yezdanşêr, Egîdê Bengîn wek xazgînî dişeyine cem Faris Axa. Bengîn diçe û keça Faris Axa, Binevşê jê dixwaze. Faris Axa bi gire-girê eşîra xwe re dişêwire. Hinek dibêjin keçikê mede kurê Mîr, bide Ahmed, hinek dibêjin bide Cembe-liyê kurê Mîrê Hekaryan.

Faris Axa ji girêgirên eşîran re dibêje "Ahmed çû û nehat. Li ser qewlê xwe ket e. Ez dê keça xwe bidim kurê Mîr Yezdanşêr. Faris Axa çû cem Egîdê Bengîn û jê re got e ku ew keça xwe bi dilxweşî dide kurê Yezdanşêr, Cembelî. Egîdê Bengîn vegeriya hate û xeberê da mala

Cembelî ku Faris Axa keça xwe daye pê. Malbata Cembelî, Mîr Yezdanşêr bi xwe çûn keça Faris Axa, Binevşê bi fermî ji Cembelî re xwestin.

Vêca em bînin, ka çi bi serê Ahmed de hatiye. Ahmed diçe navça şêxan ku nêzîkê Beadlê ye. Li wir Hesp, Şûr, Mertal û kincên xwe difroşe. Hin kincên gavanîtiyê ji xwe re dikire û paşê diçe Beadlê. Di Beadlê de Ahmed dest bi gavanîtiyê dike. Rojek talankerên Areban tînin davêjin ser Beadlê. Ahmed li dijê wan talan-keran şer dike. Mêrxasî û şerkeriya Ahmed belav dibe, Ahmed dibe mi-rovek bi navûdeng. Şêxê Beadlê, Şêx Xelef, Ahmed dike seyisê hespên xwe. Piştê demekê Ahmed nexweş dikeve, mehek di nav ciyan de nexweş dimîne. Paşê baş dibe.

Roniştvanên Beadlê hemûjî Kurdên Yezîdî ne. Gundî dest bi amadekirina çûndina Laleşê - zîyaretgeha Şêx Adî- dikin. Ji gundê Êsîfnê tîmsala Melekê Tawis hanîne Beadlê. Gundî hemû çûne tewafa Melekê Tawis.

Ahmed tenê dimîne. Ew jî hespê qule ji qesra Şêx Xelef derdixe, zînê hespê lê dike û bi dizîka ji nav Beadlê derdikeve. Ahmed berê xwe dide zomên koçeran, zomê xwe. Ahmed gihîşt nav konên koçeran. Hemûyan dîtin ku waye Ahmed bi hespê qule ve hate. Faris Axa û mal-bata wî şaş mabûn.

Hevalên Ahmed ji Ahmed re gotin ku Binevşê dane Cembelîyê kurê Mîrê Hekaryan. Ahmed gelek aciz bûbû. Wî ji hevalên xwe re got : “ Ez dizanibûm şandina min ya hespê qule daf e, kemîn e. Ez ji bo ku navê tirsonekîyê, bêrûmetîyê û bênamûsîyê neynim ser xwe, min şertê wî qebûl kir.” Ahmed hefasrê hespê qule da destê hevalê xwe û gote hespêbibin ber derê konê wî girêdin. Ez qesem dikim an dê Binevşê bidin min, an jî heya sibê ez dê nava vê zonê bikim gerava xwînê.

Hespê birin ber derê konê Faris Axa. Hevalên Ahmed ji Faris Axa re dibêjin Ahmed zivirî û xelata te hanî, Binevş heqê wî ye. Faris Axa jî dibêje ez Binevşê nadim Ahmed. Min wê daye Cembelî. Wan nîşan pê ve kirine. Qelend anîne, fatîha jî xwendine. Mîrê Hekaryan mezin e, eşîrek bi tenê nîne da ku ez bûka wî jê bistînim û bidim Ahmed. Giregirên eşîra Faris Axa zor dan pê ku keça xwe nede kurê Mîr, bide Ahmed. Du rê li ber Faris Axa hebû. Yan dê keçikê bidana Cembelî û dê wê demê eşîra wî bi hev biketa, xwîn bihata rêtin, hevûdu bikujtana, yan jî dê bi eşîra xwe ve terka vî welatî bikirana. Ji xwîndarî û revînê, ji wan re revîn çêtir bû. Faris Axa qebûl kir e ku Binevşê nede Cembelî û ji wir koç bikin, biçin. Wexta ku Binevş pê hesîya ku bavê wê ew nade Cembelî, xweste xwe bi destê xwe bikuje, întîxar bike. Lê xulam gihîştin pê, nehêştin ku ew xwe

bikuje. Binevşê ji kurê apê xwe Ahmed hez nedikir, ji Cembelî hez dikir.

Eşîra Faris Axa koç kirin çûn. Piştî du heftan xeber ji Mîr Yezdanşêr re hate ku eşîra Faris Axa koç kirine, çûne. Mîr Yezdanşêr gava vê xeberê bihîst şaş bû, wek ku cerek ava cemidî li serê wî bikin. Mîr Yezdanşêr vê xebera reş ji Cembelî re got, rexne lê girt, aciziya xwe nîşan da û got: “Faris Axa û Binevşa te tîrê mezin avêtin me, avêtin gelê Hekaryan. Tîrêkî welê ye ku birîna wê sax nabe.”

Dinya Cembelî tarî bûbû. Dev û lêvên wî qerisîn, hêrs bûbû. Lê dizanibû, loma jî ji bavê xwe re got: “Tu guneha Binevşê nîn e.”

Cembelî biryara xwe dide ku li pey Binevşê bikeve û wê bîne. Cembelî xatir ji malbata xwe dixwaze û li hespê xwe suwar dibe û li pey Binevşê dikeve. Faris Axa bi eşîra xwe ve diçe aliyê Diyarbekirê - Amedê-, li ser çiyayê qerecdaxê cih û war dibe. Cembelî şopa wan digre, pê dihesse ku ew çûne aliyê Diyarbekirê. Cembelî diçe qerecdaxê. Di nav konên eşîra Faris Axa de dibe mêvanê pîrikek. Ji pîrikê pê dihesî ku sibê daweta -dîlana- keça Faris Axa û birazê wî Ahmed e. Pîrik dibêje bûk ne ji dil, bi zorê li Ahmed mar kirine. Îro jî bûkê xwestiye bi xençerê xwe bikuje, lê nehêstine. Pîrik jê re qala çîroka keça Faris Axa dike ku wê dane kurê Mîrê Hekaryan, lê paşê Faris Axa di

soz û peyman a xwe de nemaye û ji wir revîya ye. Cembelî wexta ku bihist daweta Binevşê dibe, tîrek kete dilê wî. Lê wî xistibû heşê xwe, hatibû ku Binevşê birevîne. Ew bêtî Binevşê venagere.

Sê şev û sê roj daweta Binevşê û Ahmed kirin. Wexta ku Binevşê birin, ew gelek giriya. Lê çi bike?! Binevş û Ahmed zewicîn. Cembelî jî bû şivanê Ahmed. Cembelî çû nav pez û garana dewaran, dest bi şivantiyê kir e. Cembelî û Binevşê hêj hevûdu nedîtibûn. Di ser şivantiya Cembelî de çend meh derbas bûbû, lê hêj jî wî û Binevşê hevûdu nedîtibûn. Cembelî li derve tim di nav pezan de bû, ew nediçû nav zomên koçeran. Qewraşên mala Ahmed her roj dihatin pez dotinê, şîr didoşandin. Qewraşa bi navê Şîlan ji Cembelî re qala Xanima xwe dikir. Paşê Binevş diwelide, bebik tîne. Jê re kurek -lawek- dibe. Binevş navê kurê xwe Cembelî datîne.

Rojek Binevş jî bi Şîlanê re diçe pez dotinê û ew û Cembelî hevûdu dibînin. Cembelî û Binevş biryar didin ku bi hev re birevin. Şevêk herdu bi hev re direvin, diçin. Piştê revê, di rêwitiyê de gelek bûyer tîn serê Cembelî û Binevşê. Lê dawî digihîjin Hekarîyê. Heft şev û heft roj dawet dîkin û digihîjin miradê xwe.

Çîroka Cembelî û Binevşa Narîn bi kurtahî wek ku min di rêzên jorîn de qal kir e ye. Nivîskar Îhsan

Çûlemêrgî vê çîrokê wek şeweya romanê nivîsiye. Pirtûka wî bi rastî jî romanek bedew e. Romanek bi serketiye. Nivîskar li hev honandina çîrokê bi awayê romanê gelek baş pêk aniye. Çîroka Cembelî û Binevşê di nav edebiyata Kurdî ya devkî de, di folklorê Kurdî de cihekî girîng digire. Îhsan çûlemêrgî gelek baş kiriye ku wê ji wendabûnê xilas kiriye û kiriye nav edebiyata Kurdî ya nivîskî. destê Îhsan Çûlemêrgî sax be. Min pirtûka wî bi dilxweşî xwend. Piştî 30 salî carekî din pêzanîbûna çîroka Cembelî û Binevşa Narîn, Min dilşad kir e. Divê her Kurd pirtûka Cembelî bixwîne.

Bi xwendina vê pirtûkê ez dilşad bûm.

✱  Cembelî (Kurê Mîrê Hekarîyan) Îhsan Çolamêrgî - Weşanên Apec - Stockholm

CEMBELÎ

(Kurê Mîrê Hekarîyan)



"ÇÎROKÊN XETER"

An Jî

"STRÎPTÎZ"

E. H. MIHEMED

Roman, têkiliyên evîn û dest li gerden bûnî, jiyana mirovê modern diyar dike; têrnebûna xweşiya cinsî dide pêş. Tenahî, evîn û evîndarî, bêrîkirin, bêbextewarî, hesûdiya evînê, tama rakirin, dest li gerdenbûyînê û têkiliyên cinsî, bihayê delaliya jina qehp, şarandina (sorkirina) rûhî û cinsî. Lê geriyana bi dest xistina evînê û şarkirina wê ye.

Romana Ahmed Altan ya bi navê "Tehlîkelî Masallar - Çîrokên Xeter-" bi wan gotinên li jor dest pê dike... Têkiliyên cinsî, nivîsandin û cînayet; Ahmed Altan, heyecana wan her sê bûyeran dişibîne hev:

"Wextê serê qelemê li kaxezê dikeve (...) çaxê qatil tiliyê dide ser tetikê (...) û dema orgazm ji pehniyê bilind dibe heta digîhê navranê (...) Di wê demê de kesayetiya mirov ya duyem, ya ku di bin kurayiya hişê mirov de veşartîye, derdikeve holê."

Roman, li ser evîndariya nivîskarekî 40 salî, keçek 20 salî (Berîn) û jinekê (Sevda) hatiye raçandin. Lehengê ku

nivîskar e, di navbera hezkirina Sevda û Berînê de dimîne asê û bê çare... Geh delalî, ciwanî û dilpakiya Berînê, hişê lehengê me ji serî wî dibe û dil û hinava lê dipertîne û geh jî tama gerden û laşê Sevdayê wek bayekî nerm û germ xwe li wî dipêçe...

Lê, dema lehengê me dimîne bi tenê; ne Sevda li nik wî ye û ne jî Berîn; wê demê دنیا lê teng dibe, hesûdî û êşa evînê dibe şûrekî ji cemedê û di nav hinavên wî de diçikile...

**Her Têkiliyek Cinsî Çar Kesan
Eleqedar Dike**

Lehengê me, li milekî evîndarê Berînê ye li milê din jî evîndarê Sevdayê ye. Berîn jî, ji aliyekî evîndara nivîskar e û di eynê wextê de dilgirtîyekî wê yê din jî heye; heta Berîn, di demeke ku ew û nivîskar bi hev re dest li gerden bûyî de, dibêje; "Min bêriya Burç kiriye, ez vêga xeyalê ku ê sibê bi wî re çawa rakevim, dikim." Rewşa Sevdayê jî weha ye; ew yara nivîskar ya kevin e û evîndariya vê jî ji wî re berdewam e; lê "yarekî" wê yê din jî heye. Hersê leheng jî tkiliyên hev yên evîne dizanin.

Yanî di romanê de evîndariyek "çar alî" û pir dijwar heye, lê "sedaqat" tune ye.

Ji alî hez kirin û tēkiliyên cinsî yên jiyana modern ve, mirov dibêje, qey Ahmed Altan xwestiye ku referansekê bide Lawrence Durrell. Usluba Altan jî di warê edebî de wek ya Durrell germ û tejtî û nefesek nû ye.

Lawrence Durrell jî ev babeta, ku her tēkiliyeke cinsî çar kesan eleqeder dike, di romana xwe ya "Îskenderiye Dortlîsî" de bi kar aniye.

"Evîna Bextewar tune"

Hîkayet e, di romanê de derbas dibe: Prens, dizewice û xanima xwe li

qesrê digerrîne; çil odên qesrê hene, lê prens deriyê 39 odan vedike û miftên wan dide xanima xwe; oda çilî weke sirekî li wê derê girtî û veşartî dimîne.

Weke wê oda bi "sir", di tēkiliyên evîne de jî her tim ciyek heye mirov nagihêye; çaxê mirov bigihîyê û bi tevayî bikeve destê mirov, wê çaxê "sêhra" evîne wê betal bibe. Evîn timî rih dişarine da ku xwe bigihîne noqta destneketinê.

Ji ber ku lehengê me, dike nake nikarê bi her hawayî ne Berînê bi destê xwe bixîne û ne jî sevdayê. Ji ber wê çendê jî, her çiqas agirê evîne, dilê wî dişewitîne, sermaye tenahiye jî, wî, ewqas direcîfine.

Mirov, Bêtir Bi Aliyê Xwe Yê Nebextewar Ji Hev Hez Dikin

Berîn, berî ku nivîskar bibîne û bibe evîndara wî, romanekê wî dixwîne û lehenga romanê Zubeyde gelek birhê li ser wê dike; û meraq dike, ka ev Zubeyde kiye û nivîskar çawa ewqas bi nêzîkayî ew naskirîye û jiyana wê nivîsiye.

Li ser wê meraqê Berîn piştî çend caran telefonî nivîskar dike û pê de tê wî dibîne û dilê wê dikeve wî.

Her çar çaxê tèn cem hev Berîn dibêje, ka ji min re qala Zubeydeyê bike; lewra ez gelek ji wê hez dikim.

Çaxê nivîskar dipirse; "Tu çima ewqas ji Zubeydeyê hez dikî?"

—Ji ber ku ew gelek dişibe min.

—Çiyê we dişibe hev?

—Bêbextewariya me, dibêje.

Dema ku lehengê me jî tenê dimîne û dikeve xendeqên bêbextewariyê, ew jî di nav rûpelên romanê de li Zubeydeyê digere û bêriya wê dike.

"Mar" Xwe Ji Çil Kalanî Tazî Dike Jin Jî Xwe Ji Çil Kirasî

Hikayet e, di romanê de derbas dibe; qet zarokên sultan û jina wî çênabin: Di encamê de, bi şîretên kalekî rîhsipî, jina sultan piştî 9 mehan diwelide; lê mixabin li şûna zarokekî marekî tîne dinê. Sultan jî bê çare dimîne û dibêje; weled weled e, çi mar û çi jî zarok.

Mar mezin dibe tê zewacê, lê kîjan keçê jê re tînin di eynê şevê de pêvedide dikuje. Keç di bajêr de namînin. Dor tê ser keçikek sêwî ya xwedî dêmarî, keçik diçe ser tîrba diya xwe ji bo ku çarekê ji halê xwe re bibîne. Li wê derê kalê rîhsipî, tê ba keçikê û dibêje:

—Ev mar esil prenekî pir delal e;

çaxê sultan dua kir, ne got bila xwedê weledêkî çawa bide min; lewra ew mar hat dinê. Îja çil kirasî li xwe bike û gava tu çûyî odê, wê mar ji te re bêje xwe tazî bike. Lê her te kirasek ji xwe kir, tu jî ji wî re bêje, xwe tazî bike; bi wî hawayî heta tu çil kirasî ji xwe bikî ew ê jî çil kalanî ji xwe bike, wê bibe xortekî delal, nema bi te vedide, mirinê ji halê rabe û jiyanê destpêbike.

Roja zewacê tê, êvarî keçik çil kirasî ji xwe dike û xwe tazî dike "mar" jî çil kalanî... Jiyan ji nû ve û bi xêr û xweş dest pê dike... Heger xwe tazî nekirana, ne jiyan dê mirin biserke-ta.

Beden xwe ji maske, kalan û cila tazî dike... Rih jî ji bedenê... jin bi taziya xwe delal e... Jiyan, lêgeriyan û tazî kirin e. Dibe ku nixamtin (nixwimandin) demekê ji bo parastinê bû. Êdî, di dema modern de nixamtin bûye mirin... Jiyan tazîkirin e...

Romana Ahmed Altan ji serî heta dawî şahîyeke tazîkirina rih û bedena mirovî ye.

Problem Hunduriye

Problem û astengên derweyî nikarin bibin asteng li pêşîya lehengên

romanê. Li gora civatê lehengên Ahmed Altan piçek bijartîne. Tu astengên aborî û toreyî jî li pêşiya wan tunene. Çi gava Berîn dixwaze, li teyarê siwar dibe tê Stenbolê ba evîndarê xwe. Nivîskar jî, mala wî, otomobîla wî heye, halê wî yê aborî baş e. Sevda jî, xwedî mal û halekî xweş e.

Roman, têkiliyên evîn û dest li gerdembûnî, jiyana mirovê modern diyar dike; têrnebûna xweşiya cinsî dide pêş; Tenahî evîn û evîndarî, bêrîkirin, bêbextewarî, hesûdiya evînê, tama raketin, dest li gerdembûyîne û têkiliyên cinsî, bihayê delaliya jîna qehp, şarandina (sorkirina) rûhî û cinsî. Lê geriyana bi dest xistina evînê û şarkirina wê ye.

Roman wan problemên hundurî yên rûhî dixê binê merceke.

Lê, her derek weşartî û di tariyê de mayî; evînê gur, xweş dike û lêgeriyane zêdetir dike: Evîn anarşîst e!..

Fona Romanê Ya Ku Rûyê Dewletê Re Diyarê: Bixwîn û Qirêj e.

Rojname, televîzyon bi nûçeyên felaketê teji ne... Herêma Rojhilatê (Kurdistan M.) bi kuştin, bi

şewitandin û bi xerakirinê diheje... Bajarê Diyarbekir, bûye bajarê cinayetên bikûj ne diyar... Li wî bajarî cinayetên bi kûjnediyar, di saetên di navbera wexta danîn û rabûna tayarê de çêdibin(?)

Her roj enflasyon bilind dibe... Însan dimrin, perîşan dibin... jop, polîs înfaz... dawîya skandalên dizî û ruşwetê nayê

Rihê mirovî geliyên kûr in; di wan geliyan de ciyê ku hêj "tîrêja rojê" nedîtî hene. Ahmed Altan bi tîrêjen ji hevokan mija li ser wan kurahiya dide alîkî; hêz û bedewîya hevokan li pêş çavên mirov wek rûbarekî dide raxistin.

Bila kes bi rîhsipîtî û derwêşiya Ahmed Altan nexape. Ew di eslê xwe de "terorîstekî" evînê ye. Bombe di destê wî de, pîm kişandîye... Ew li ku derê "nixamti-nekê" dibîne, bombeyekê davêjiyê; divê her tişt tazî be. Îxbara min ji bo DGMê Ahmed Altan "terorîstekî" bi tehlûke ye.

Ahmed Altan, wek kurê "ejderhayekî" qelem, yê Çetîn Altan, çavên xwe li dinê vekir; ev ji bo "terorîstîya" wî şanseki pir mezin bû.

BERBANGÊN NEWROZÊ

*B*i hezaran welatparêz, şoreşger û sosyalîstên Kurd ketin zîndana Amedê. Hinek ji wan di berxwedanên girtiyan de şehîd ketin, hinek birîndar bûn, seqet man. Gelekên wan bi salan di hepsê de razan û paşê hatin berdanê. Li gor hejmara yên ku hatin girtin û paşê hatin berdanê, gava mirov dinêre li ser zîndana Amedê gelek hindik pirtûk hatine nivîsîn û weşandinê. Gelek kesên ku di hefsa Amedê de razane û hatine berdanê û niha jî nivîskarî dikin hene. Lê van nivîskaran li ser hefsa Amedê qet pirtûk nenivîsandine. Yên ku pirtûk nivîsandine ji dehî nabûre. Ji wan nivîskaran yek jê jî Edîb Polat e. Wî bi navê "Berbangên Newrozê" pirtûkek li ser hepisxaneyê Amedê nivîsiye. Ev pirtûk pêşî bi zimanê Tirkî hate weşandin, paşê nivîskarê pirtûkê vê pirtûkê kire Kurdî û di nav weşanên APECê de hate weşandin. Mijara pirtûkê li ser girtîgeha Amedê ye. "Berbangên Newrozê îşkenceyên

ku di girtîgeha Amedê -Diyarbakirê- de çêbûne têt qalkirin." Nivîskar di pirtûka xwe de îşkencevanên girtîgeha Amedê mîna Dehaqê zalim dide nîşandan. welatparêz û şoreşgerên Kurdan jî wek Kawayê hesînger dibîne.

*N*ivîskar Edîb polat nivîskarekî çep e, sosyalîst e. Ji Amedê ye. Hetanî niha pênc-5- pirtûk û pirtûkek wergerê weşandiye. Ew niha her hefte di rojnameya RONAHIYê de meqalên siyasî dinivîse. Edîb Polat bi Kurdî-Kurmancî dizane. Wî romana nivîskarê Îranî Sadik Hîdayet - romana bi navê Kundê Kor- wergerandiye Kurdî û ev pirtûk di nav weşanên KORA de hatiye weşandinê. Lê pênc pirtûkên wî bi Tirkî hatine weşandinê. Edîb Polat çawan ku "Nevrozladîk Şafaklar" kire Kurdî û bi navê "Berbangên Newrozê" weşand, divê pirtûkên xwe yên din jî bike Kurdî û biweşîne.

DANASÎNA WEŞANÊN KURDÎ — 5

ARMANC

Rojnameya Kurdî Ya Mehane

Armanç çi ye? Kovar e, yan rojname ye? Armanç siyasî ye, edebî ye, hunerî ye, zimanî ye, çi ye? Beylû nîn e. Ez dikarim bêjim ku Armanç hemû tişt e, û tu tiştek nîn e. Di eslê xwe de rojnama mehanî nabe. Rojname yan rojane ye, yan jî hefteyî ye. Giraniya rojnameyek divê li ser weşandina nûçeyan be. Di rojnameya mehanî de, dê kîjan nûçe bê weşandinê. Nûçeyên teze di nav mehek de kevn dibe.

“Armanç di Gulana 1979’an de wek şiklê kovarê bi Kurdî û Tirkî dest bi weşana xwe kir û heta hejmara 61’ê bi wî hawî dom kir. Kurd bi çi zimanî diaxivin, rojname jî divê bi wî zimanî derketa. Bi vê mantiqê ji hejmara 62’an û vir de Armanç him bi şiklê xwe û him jî bi naveroka xwe hat guherandin û seranser bi Kurdî (11 rûpel Kurmançî, rûpelek jî bi Dimilkî) derket. Ji hejmara 159’an bi vir de hejmara rûpelên wê zêde bûn—bû 16 rûpel (du rûpel Dimilkî). Armanç demekî kurt li Stenbolê hate çapkirin. Heta nuha 174 hejmarên Armançê derketine.

Armanca “Armanç”ê ew bû ku ew bibe wasiteya xwendin, nivîsandin û pêşxistina Kurdî. Armançê xizmet kiriye ku xwenda û nivîserên bi zimanê Kurdî pirtir bibin.

Armanç di warê rojnamegeriyê de jî karekî baş kir. Di warê rojnamegeriyê de nivîsandina babetên nûçeyan (nûçe, hevpeyvîn, reportaj, nivîsên nûçegihanê, komentar û hwd) pêş xist.

Armanç di rûpelên xwe de cî da pirs û pirs-girekên siyasî, civakî, dîrokî, çandî, edebî, yanî wek rojnameya gelemperî ya siyasî, çandî û edebî derket. Ji aliyê din rûpelên Armançê bi rûdan û bûyarên nuh, nûçe û

bûyarên li welêt û li derveyî welêt li ser Kurdan qewimîn hatin xemilandin. Armanc 17 sale ku weşana xwe didomîne. Armanc Ji mehê carekê dertê.

Ew kesên ku Armancê diweşînin him ji alîkî ve ji bo debara xwe bikin kar dikin û ji aliyê din jî bi dilxwazî û berpirsiyariya ronakbiriya xwe ji bo Armancê kar dikin.”

Ev gotinên li jor ji alî birêvebirê Armancê ve ji bo danasîna Armancê hatiye nivîsîn.

ARMANC LI STENBOLÊ DERKET

Rojnama (!) Armanc li Stenbolê dest bi weşana xwe kir. Ev 16 sale ku Armanc li Swêdê derdiketin, paşê jî li Stenbolê derket. Armanc’a ku li Swêdê derdiket 12 rûpel bû, ya li Stenbolê derket 16 rûpel e.

Rojnama Armanc’ê bi sernivîsarek “Roj baş, Ey Welatê Şêrîn!” dest bi weşana xwe ya li Stenbolê kiriye. Ev nivîs bi zimanek lirîk yê helbestvanî hatiye nivîsandin. Îmza Armancê li binê nivîsê ye, lê xuya ye ku nivîsa helbestvanek (Şaîrek) nûjen e.

Ev hejmara Armancê a yekem ku li Stenbolê derketiye ji alî naveroka xwe ve gelek qels e. Nivîsek baş ku bi dilxweşî bê xwendin (sernivîs netêde) têde tûne ye. Naveroka vê hejmarê gelek qels e û bi her awayî dûrê rewşa Kurd û Kurdistanê ye. Ji xwe heger ne ji nivîsandina bi Kurdî be, eleqeq vê hejmarê bi rewşa Kur-

distanê tune ye. Tu dibêjî qey di hîvê de rojname derdixin. Rojnamek hewqas ji rastiya Kurdistanê ya îroyîn dûr nehatiye dîtin.

Ecêbêkê wê yê din jî; Li cîhanê qet nehatiye dîtin, li welatekî din rojname derdikeve û xwedî û redaksiyona wê jî di welatekî din de be. Ev jî orîjînalîta Kurdan e, an jî ya Armancê bi xwe ye.

Nûçeyên ku di vê hejmarê de ne, hemû jî nûçeyên kevn in, nûçeyên du meh berê ne. Ji alî teknîk, mîzampaj û rêzimanî ve jî gelek xeletî di vê hejmarê de heye. Gava ku gewde li cîhek be û serî li cîhekî din be, helbet dê weha be.

Piştê demek ku Armanc li Stenbolê derket paşê dîsa li Swêdê weşana xwe domand. Armanc niha dîsa li Swêdê derdikeve.

NAVÊ ARMANCÊ XELET E

Ji bo şaşîtiya navê Armanc’ê, nivîskarê navdar M. Emîn Bozarslan di civînek de (ku li ser danasîna berhemên wî bû) got ku: “Rastiya navê Armancê Amanc e. Ehmedê Xanî di berhema xwe ya nemir Mem û Zînê de kelîma Amanc bi kar tîne.”

Me navê Armancê ji zimanzanek pirs kir, wî jî got: “Navê wê şaş e. Divê Amanc be.”

ARMANCÊ ALÎKARÎ NEGIRT

Dewleta Swêdê her sal alîkarî didan Armancê ji bo ku derbikeve. Lê îsal

alîkarî neda pê. Têt gotin ku di Kul-turrâdetê de komîsyonekî Kurdan heye. Endamên vê komîsyonê -sê Kurdên hesûd in- nexwestine ku dewlet alîkarî bide Armancê. Ji xwe ji xeynê Armancê neh, deh kovarên Kurdî jî alîkarî negirtin. Kovara Roja Nû, Kovara Helwest û kovarên din alîkarî negirtin. Îsal kovara Nûdem, Çira, Gizing(Kurdên başûr derdixin) û Kurdistan Raport'ê alîkarî girtin. Lê Armanc jiyan xwe ya weşanî hêj jî didomîne.

XETA Û KÊMANIYÊN ARMANCÊ

Xeta û kêmaniyên Armancê gelek in. Tu nivîskar tune ye ku ji Armancê aciz nîn e, yan jî jê aciz nebûye. Di serî de Armanc li gor qaîde û usulên rojnamavaniyê hareket nake. Gelek kes jê re nivîs dişînin Armanc nivîsên wan naweşîne û bersîv jî nade wan ji wan re nabêje ku ew wê nivîsê naweşînin. Redaksiyona armancê qûre ye. Melankolîk in, xeynê xwe kesek begem nakin. Nivîsên xelqê naecibînin. (Di hejmarek Armancê de çar nivîsên Faris Can derdikevin lê nivîsek yên derê xwe dernaxin ji bo ku ew wan nivîsan begem nakin, naecibînin.) Bi zimanên nivîskî yên derê xwe henekan dikin. Di Armancê de rexneyek baş, rast û dirûst derneketiye. Wan rexneyê şaş fêm kirine. Li gor wan rexne xirabkirin e, sexsiyeta kesan rendîcekirin e. Rexeyên wan li fikran, dîtinan, ramanan nîn e, li sexsan e. Rexneyên bêînsaf in, bê

wijdan in, ji rastiye dûr in. Rexnegirên wan jî kesên hesûd in, çavnebar in. Mar in. Rexneyên ku bi înzeya Zinarê Xamo û Misto Masto hatine weşandin rexneyên tewş yên ne di cî de ne. Rexneyên sivik û vala ne.

Di hêla rêziman de jî gelek xeletiyên Armancê hene. Di paragrafek de kelîmeyek, hevokê hem nêr û hem jî mê bi kar tînin. Tewandinê jî xeletî bi kar tînin. Xetayên teshîsê gelek in. Bi rast û dirûst kontrol nakin. Di hejmara dawî de gotinên Murad Ciwan yên ku wek not, wek balkêş bi tirkî gotiye di nav nivîsek de derketiye.

Ji alî rexneyên siyasî ve jî Armanc xeletiyên dike. Nivîsên rexneyî yên siyasî ku di Armancê de derdikevin rexneyên xirakirinê ne, rê ji dijminahiyê re vedike. Xeta armancê xetek "Miliyetçi" ye û tede gelek caran bi gelek nivîsên cuda li hember sosyalîzmê û sosyalîstan nivîs hatine weşandin. Di hejmara dawî (hejmar 174) de Zinarê Xamo di serê xwe de senaryoyek çekiriye û êrişê sosyalîzmê kiriye.

Nivîsên bêsewiye û rexneyên xirab di Armancê de tene weşandin. Divê Armanc weha neke, hayî ji xwe hebe. Cihê rexne û nivîsên hesûdiyê divê Armanc nebe. Nivîsên ku ferqiyet naxe nav welatparêzan û dijminan, nivîsên ku wan wek hev dide nîşandan divê di Armancê de neyên weşandin.

Alî Yildiz

KOVARÊN NÛH

(Kulîlk, Rojbaş, Zend)



KULÎLK Kovara Zarokan

Kovara zarokan Kulîlk ji nûh ve dest bi weşanê kir. Kovara Kulîlk di sala 1980'yî de dest bi weşana xwe kiribû. Bi Alfabeya Latînî kovara zarokan a yekem kovara Kulîlk e. Piştê kovara Kulîlkê bi navên "Hêlîn" û "Hêvî" jî du kovarên zarokan derketibû. Lê di demekî kin de weşana wan hatibû rawestandî.

Kovara Kulîlkê jiyanî xwe ya weşanî hetanî sala 1993'an meşandibû. 47 hejmarên wê derketibû. Paşê wê jî weşana xwe dabû rawestandî. Hetanî sala 1997'an Kulîlk derneket. Di vê salê de Kulîlkê dîsa dest bi weşana xwe kir.

Xwediyê kovara Kulîlkê "Mala Kultura Kurdî" ye. Redaktorê wê Zinar Soran e. Birêvebirê kovara Helwestê Lokman Polat jî endamê redaksiyonê ye. Nivîsên ku di vê hejmara nûh de ne ev in:

Destpêkeke Nû - Redaksiyona Kulîlkê nivîsiye. EY REQÎB, Merşa Netewî ya Kurdistan. KURDISTAN, li ser Kurdistanê nivîsek danasînê. ALAYA KURDISTANÊ - Mahmûd Lewendî. Danasîna Ala Kurdistanê. AHMEDÊ XANÎ - Mahmûd Lewendî. Nivîsek kurt li ser jîyan û berhemên Ahmedê xanî. SÊ BERAN Û GUR - Vê nivîsê Bonîye Ce-

gerxwîn ji Swêdî wergerandiye Kurdî.
LEYLANA RASTIYÊ - Dr. Kamiran
Alî Bedir - Xan. Ev nivîs ji pirtûka
“Xwendina Kurdî” hatiye wergirtin.
BEQ Û MANGE - Mahmûd
Lewendî. HEYWANÊN NAV
MALÊ - Amadekar : Hemîd
Kiliçaslan. DENDIKA ERÛGÊ - Leo
Tolstoy - Ji bo zarokan kurteçîrok.
Haydar Diljen ji swêdî wergerandiye.
MELE Û TÎMÛRLENG - Amadekar
: Zinar Soran. Çîrvanok e. DUNYA
HEYWANAN - KUND - Amadekar
: Bavê Hêvî ye. ZAROK HÊVÎYA
PÊŞEROJÊ NE - Lokman Polat. Li
ser pîrsa zarokan nivîsek îlmê - zanîstî
ye. ZIMAN Û GRAMER - Amade-
kar : Zinar Soran.

Kovara KULÎLK kovara zarokên Kurd e. Xeynê vê kovarê kovarek din ya zarokan tune ye. Divê hemû zarokên Kurd li kovara xwe, li kovara Kulîlkê xwedî derkevin. Ji kovarê re nivîs û wêne bişînin. Kovar li benda nivîs û wêneyên zarokan e.

Navnîşana xwestinê ev e:

B_{ox} : 152 16 - 161 15 BROMMA

ZAROKNO
KULÎLKÊ
BIXWÎNIN, BIBIN ABONE !

Rojbaş

**RÊYA DEVJÊBERDANA
CIGAREKÊŞANÊ**

Şerafettin Elçi
Partiyekê saz dikê

**DÎNĖ ZERDEȘTI-
ZARAHUSTRĀ**

Di vê hejmarê de
Bu sayda .

Barış BATTE
Cemal BATUN
Dr. Canan BATU
Dara BİLEK
Heretik
İbrahim GÜÇLÜ
Loqman POLAT
Nuri ALDUR
Orhan KOTAN
Şefik KAYA
Yadigar
Yekuti GÖLBARAN



ROJBAŞ

Rojbaş kovara Kurdî - Tirkî, civakî, magazînî, nûçedarî û siyasî ye. Rojbaş weşanek nûh e, weşanek hêja ye. Ji alî naveroka xwe ve weşanek baş e, dewlemend e. Kovara Rojbaş ji sê mehan carek derdikeve. Bi Kurdî û Tirkî ye. Hetanî niha du hejmarên wê derketine. Em dixwazin hejmara wê ya duyem bidin danasînê.

Di kovara ROJBAŞ hejmara duyem de van nivîsên balkêş hene: Rastiya Tehl - Îbrahîm Guçlu, Platforma demokrata Kurd - D. Bîlek, Em nebin benikê pey hebana xelkê - Ş. Kaya, Pirsê Kurd - C. Batun, Zarahuştra - Dînê zerdeştî - B. Batê, "Dostaniya" dijmin - Dr. Cuwan

Barû, Ehmedê Xanî - Lokman Polat,
Bîranîna Mamoste Cegerxwîn. Li gel
van nivîsên Kurdî, gelek jî nivîsên
Tirkî di kovarê de cîh girtine.


Kovara ROJBAŞ îdîa dike ku;
“Rojbaş, “TÎME”a me kurda ye”.
Herdu hejmarên kovarê li gor vê
îdîayê nî in, lê dil dixwaze ku bi rastî
jî wek “TÎME” kovarên me Kurdan jî
hebin. Ji bo vê em bi dil û can ji xe-
batkarên kovara ROJBAŞ re serkeftin
dixwazin.

Rûpelên kovara ROJBAŞ’ê ji hemû
nivîskarên Kurd re vekirîne. Kovara
ROJBAŞ weha dibêje: “Rojbaş, kova-
reke bi Kurdî-Tirkiye. Ew pirralî û
herweha sîyasî - magazînî ye, lê ew
serbixwe ye û ji dijminatîya kes û
rêxistinên Kurdî dûr e. Bes, ew rê
dide hemû dîtinan da ku ew xwe di
riya rûpelên wê re bidin pêşanedan.
Fermo, bo wê binivîsênin!”

Hûn dikarin ji vê navnîşanê
kovara ROJBAŞ’ê bixwazin:

Box : 75, 971 03 LULEÅ -
SWEDEN

Bibin Aboneyê ROJBAŞ’ê



ZEND

Kovara Lêkolîn û Lêgerînên Zanîstî

Kovara ZEND ji alî “Enstîtuya
Kurdî” ya li Stenbolê tête weşandinê.
Her diçe kovarên Kurdî yên hêja der-
dikevin. Kovarên weha îlmî - zanîstî
pêwîst e. Her kovarek Kurdî ku nûh
dest bi weşana xwe dike ji bo
çapemeniya Kurdî dewlemendiyek e.
Kovara ZEND di sê mehan de carek
derdikeve. Di vê hejmara yekem de
gelek nivîsên lêkolîn û lêgerînên
zanîstî hene.

Di vê hejmarê de nivîsên balkêş ev in:
“Xelesa Dojehî” Medenî Ferho,
“Dîrok û Serpêhatiya Laşê Mirov”
Şareza Aver, “Nêrînek Li Salnamê”
Feqî Huseyn, “Bingeha Çîroka
Kurdî” Zeynelabîdîn Zinar, “Di
Hunerê de Teşe û Naverok” Suley-
man Danişman, “Dahûrîna Li ser
Partîkên di Kurmancî de” Zana
Farqînî, “Di derbarê Mezopotamyayê
de Bîbliyografya Gernamên
Ewrûpîyan” Mehmed Bayrak.

WEŞANÊN ÇANDA NÛJEN
(Moderna Kultur Förlaget - Çağdaş
Kültür Yayınları)

*Di kovara Helwest hejmara San de me weşanxaneya Xanî - Bateyî dabû
danasînê. Di vê hejmarê de bi weşanxaneya Çanda Nûjen em danasîna
weşanxaneyan berdewam dikin. Di her hejmara kovarê de, emê
weşanxaneyek Kurdî bidin danasînê.*

Weşanên Çanda Nûjen (bi tirkî “Çağdaş Kültür Yayınları”) di sala 1990’î de hatiye damezrandin. Ev weşanxane bi zimanê Kurdî û Tirkî pirtûk diweşînê. Hetanî nûha şanzdeh (16) pirtûk weşandîye. Pirtûkên Kurdî yên ku ji alî vê weşanxaneyê ve hatine weşandinê pirtûkên Kurte çîrokên Kurdî ne.

Weşanxaneya Çanda Nûjen 4 pirtûkên bi zimanê tirkî weşandîye. Ew hercar pirtûkên Tirkî ev in:

- 1 — Kurdistan’da Özgürlüğün Şafağı - Urfan Alpaslan
- 2 — Başegmeyen Bir Kürt Devrimcisi: Zeki Adsız
- 3 — Kurdistana Sor - Lokman Polat
- 4 — Barbar Kasırgası - Lokman Polat

Weşanxaneya Çanda Nûjen du pirtûkên nivîskarê Îranî, Samed Behrengî jî wergerandîye Kurdî û ji bo zarokan weşandîye. Navê van pirtûkên wergerê yên ji bo zarokan ev in:

- 1 - Çîvanoka Evînê
- 2 - Edik û Bedik

Pirtûkên zarokan yê bi navê Çîvanoka Lawikê Keçel, Hespê Boz û Şêxzade jî di nav weşanên Çanda Nûjen de derketine.

Pirtûkên ku weşanxaneyê bi Kurdî - Novel, kurteçîrok- weşandiye ev in:

- 1 - Torina Şêx Seîd
- 2 - Evîn û Jîyan
- 3 - Xwîn û Hêstirê Çavan
- 4 - Jin û Zîndan
- 5 - Evîndar
- 6 - Mêrxas (Serpêhatiyên Kurdî)
- 7 - Hawar û Qêrîn (Bese Şerê Birakujîyê)

Ev her haft pirtûk jî bi Kurdî ji alî Lokman Polat ve hatîye nivîsandinê.

Pirtûkên ku di nav weşanxaneya Çanda Nûjen de nûh derketine ev in:

- 1 - Hasan YILDIZ - Kurd û Modernîzm
- 2 - Mehmed UZUN - Ziman û Roman
- 3 - Lokman POLAT - Bayê azadiyê - Novelên Kurdî
- 4 - Lokman POLAT - Rewşa Edebiyata Kurdî - Cîld - 1
- 5 - Dilpêr JÊLÎ - Waylê Licê, Waylê Licê (Dîroka Bîranîna Şehîdan)

Pirtûkên ku derdikevin ev in:

- 1 - Lokman POLAT - Ey Şehîd, Hey Hebûn
- 2 - Ji Nav Edebiyata Swêdê - Bi Kurdî-
- 3 - Antolojiya Edebiyata Kurdî - Cîld - 3
- 4 - Analîza Romanên Kurdî û Yê Din

Weşanxana Çanda Nûjen pirtûka Adîl Duran a bi navê “Dersim - Destan” jî weşandiye. Weşanxaneya Çanda Nûjen dê hendî car caran bi Tirkî, lê bi pirranî jî pirtûkên xwerû bi zimanê Kurdî biweşîne. Weşanên Çanda Nûjen ji bo zarokên Kurd dê gelek pirtûkên zarokan yê wergêra bi Kurdî biweşîne.

Yên ku bixwazin wan pirtûkên ku navê wan li jor hatine nivîsîn ji vê navnîşana / adresa jêrîn dikarin bixwazin. Pirtûk ji sedî çil erzanî tên firotinê.

Navnîşana Xwestinê :

Tensta Alle 43 - 2 tr. 16364 SPANGA / SWEDEN

KULÎLK

Kovara Zarokan
Derket

* Mala Xwe û Zarokan Bê Kulîlk
Nehêlin!

* Ji Bîr Nekin, Kulîlkê Av Bidin!

Bibin Aboneyê *Kulîlkê!*

Lokman POLAT
BAYÊ AZADIYÊ

Derket
Bixwînin! Bidin Xwendin!

Navnîşana Xwestinê : Tensta Alle 43 - 2tr.
16364 SPÅNGA - SWEDEN

JI WEŞANÊN ÇANDA NÛJEN
PIRTÛKÊN KURDÎ

DILPÊT JÊLÎ
Weyla Licê, Weyla Licê
Dîroka Bîranîna Şehîdan

Derket
HESPE BOZ

Û
ŞÊXZADE

Ji Bo Zarokan

Derket

Lokman POLAT
JIN Û ZÎNDAN

Derket
Bixwînin! Bidin Xwendin!

Navnîşana Xwestinê : Tensta Alle 43 - 2tr.
16364 SPÅNGA - SWEDEN

HELWEST - Analîz # Kultur # Lîteratur

Lokman
POLAT



EVÎNDAR

Weşanên
Çanda Nûjen

Ji Xelatgirên
Nobelê
ÇÎROKÊN
ZAROKAN
Derdikeve

Weşanên
Çanda Nûjen

Hasan YILDIZ
MODERNÎZM



Weşanên
Çanda Nûjen

ZEND
Kovara Zanistî
Hejmar : 1

Derket

Bixwînin!
Bibin Abone!

ROJBAŞ
Kovara Agahiyê
Hejmar : 2

Derket

Bixwînin!
Bibin Abone!

JÎNDAN
Kovara Kulturî
Hejmar : 3

Derket

Bixwînin!
Bibin Abone!

KURDÎ
Kovara Zarokan

Hejmar : 48

Derket
Zarokno
Bixwînin!

Lokman Polat
Analîza
ROMANÊN
KURDÎ
Derdikeve!

Weşanên
Çanda Nûjen

Rewşa
Edebiyata Kurdî
Cîld - 2
Edebiyat
û
Zimanê Kurdî
Derdikeve!
Weşanên
Çanda Nûjen

Hûn weşanên jorîn dikarin ji navnîşana
kovara Helwestê bixwazin.

www.netewe.com

HELWEST

Kovara Kulturî û Lîteraturî

Hejmar / No: 7 — Sal / Year - Bihar - 1997



ZÎN

Danasîn û Analîza Berhemên Edebî

Derdikeve !

Bixwînin! Bidin Xwendin

Weşanên Çanda Nûjen

Helwest = ISSN - 1400 - 9404

Analîz # Kultur # Lîteratur - Helwest - Bihar - 1997